

REWŞEN

Hejmar 7 - Bihar 1991

"Herçî bire şûrî destê himmet
Zebtkir ji xwe re bi mêt dewlet
Bê ceng û cidal û bê tehwir
Qet vê şixulê mekin tesewwir"

-Ehmedê Xanî-

Kovara Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan

- Hevpeyvînek di gel Karlênê ÇAÇANÎ
- Çend stiran û dîlokên X. ABOVYAN ên berhevkirî
- 33 Gulle! Îsmail BEŞİKÇÎ
- YRWK - şaxê Swêdê damezirî
- Zewncey Zerenco

PIRTÛKA
ŞEVA
ÇAR
LEHENGAN

- Şairî be nawbangî Kurd,
Mamhoste Hejar koçî duwayî kird / Ehmed ŞERÎFÎ
- Parastina zimanê Kurdî,
bireke girîng ji parastina netewa Kurd e / Hogir EHMED
- Xelat û Sîpan / H. SEFOAN
- Destana Şîrîn û Ferhad / Beşîr BOTANÎ
- Hemreş û xewna mirî / Dilbixwîn
- Goran / Mehabad KURDÎ
- Goristan / Mano

REWŞEN

Max Str. 50-52
5300 Bonn 1 /BRD
Tel: (0228) 63 09 90

REWŞEN

KOVARA YEKÎTIYA REWŞENBÎRÊN
WELATPARÊZÊN KURDISTAN E.

KOVARA KURDÎ YA ÇANDÎ, HUNERÎ,
WÊJEYÎ, DÎROKÎ Û RAMYARÎ YE

SALÊ ÇAR CARAN DIHÊ WEŞANDIN

XWEDÎ Û
BIRÊVEBIRÊ KARÊN WEŞANÎ:
YRWK
(Yekîtiya Rewşenbîrên
Welatparêzên Kurdistan)

RÊZKIRINA NIVÎSAN:
Weşanên **REWŞEN**

HEKE DAXWAZEK
DIN NEHATIBE
DAXWEYANÎKIRIN,
MAFÊ RASTKIRIN,
KINKIRIN, WEŞANDIN AN
NEWÊŞANDINA NIVÎSAN
YA SERNIVÎSARIYA
KOVARA **REWŞEN** E

JI KOVARA **REWŞEN**
3.000 NIMÛNE ÇAP DIBIN

BUHA: 5,- DM / 20,- SEK
1,- £ / 5,- SFR / 15,- DKR
20,- NKR / 15,- FF



Gora rewşenbîrê Kurd ê nemir Dr. Nûrî Dêrsimî (1892-1973)

XWENDEVANÊN HÊJA BIBIN ABONEYÊN **REWŞENÊ**

REWŞENÊ BIXÎNIN

REWŞENÊ RE BINIVISÎNIN

REWŞENÊ BIXWAZIN

REWŞENÊ BELAV BIKIN

TEVLÎ XEBATÊN **REWŞENÊ** BIBIN

KARTA ABONETIYÊ

JI KEREMA XWE RE JI
HEJMARA PÊ VE,
MIN BIKIN ABONEYÊ
KOVARA **REWŞEN**

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

.....

.....

.....

Bank:

YRWK

Ekram Nassan

Postgiroamt Köln

Konto Nr: 21 21 14 - 504


Aboneyên hêja,

vi cihî dagirin û tevli kopyeka

pelê razandina 20.-DM an 35.-DM

bişînin navnîşana YRWK

Buhayê abonetiye di sale de: Almanya 20.- DM, Welatên din 35.- DM



Rûpel 8 - 11



Rûpel 18

NAVEROK

Rûpel

| | |
|---|---------|
| Name ji xwendewaran re | 4 |
| Nameyên xwendewaran | 5 - 6 |
| Pirtûka Şeva Çar Lehengan - Pêşgotina M. S. Çurukkaya | 7 - 11 |
| Navên Kurdî - A. Dîkilî | 12 - 13 |
| Zewncey Zerenco / Zazakî | 14 |
| Çîrokên Gelêrî / Bav û Kur | 16 - 17 |
| Şairî Be Nawbangî Kurd Mamoste Hejar / E. Şerîfî | 18 - 19 |
| Parastina Zimanê Kurdî - Hogir Ehmed | 20 - 21 |
| Xelat û Sîpan - H. Sefqan | 22 - 23 |
| Şengul û Mengul / Teater - Amadekar: K. Zengene | 24 - 29 |
| Destana Şîrîn û Ferhad | 30 - 32 |
| 33 Gulle - Îsmail BEŞİKÇÎ | 33 |
| Hevpeyvîn bi Karlênê ÇAÇANÎ | 34 - 39 |
| Şêx Elî Riza - Mûsa Enter | 40 |
| Niştimana Xwe Binase - M. Bozan | 41 - 43 |
| Çend Stiran û Dîlokên X. ABOVYAN ên berhevkirî | 44 - 50 |
| YRWK- Şaxê Swêdê Bi Komcivînekê Damezirî | 51 - 57 |
| Hevpeyvîn bi Seydayê Tîrêj re / Pismam | 58 |
| Hemreş û Xewna Mirî - Dilbixîn | 59- 60 |
| Goran - M. Kurdî | 61- 63 |
| Goristan - Mano | 64 |
| Ferhengoka Nivîsaran | 65 |
| BANG | 66 |



Rûpel 34 - 39



Rûpel 44 - 50

REWŞEN

Xwendewarên delal

Berî buhara welat cihê xwe ji havînê re berde, em rastê hev têne. Ji ber ku bawerîya me bi şoreşê têt, me rast nedît ku **Kovara We** şînê bigerîne û bi rengên reş û tarî bikeve destên we. Ev taybetiyeka me welatparêzên şoreşger e. Em nizanin weke gelek necamêran hêstir û rondikên krokodîlan bibarînin. Belê, di van mehên dawiyê de, *çar milyon* mirovên me ketin meşa mirinê de. Gunehê wan tunebû. Serok-Merokên wan weha digotin: *"Birevin, rev tenê we xelas dike! Eger em liberxwe bidin, emê ji kokê ve rabin. Her kes bila xwe û zarokên xwe xelaske! Guh nedin çek-mekan. Ew weke qirêja destan e. Tê nû diçin!"*

Bi rastî gerek e kurd, bi rewşa xwe tenê dijminên xwe gunehkar nekin. Qet derefet nîn e ku dijmin bi dilnêrmî werine ser me. Berpirsiyariya kurd, berê her kesê ji kurdan bi xwe têtê xwestin. Ka kurdan çendî karibûne yekîtiya xwe ava bikin? Çendî hîn bûne destên dijminên xwe berdin û çendî nizanin rûyê faşîstan maç bikin? Mirovê çeka wî di dest wî de biheje, ew ne mirov e. Mirovê bêje gelo ez liberxwe bidim an na, zû ji holê radibe. Dibe xwelî û li ber bayê dikeve diçe.

Pişti şerê li perava farsî bi fermî rawesta, êdî şerên mafdar destpêkirin. Gelên herê mê rabûn ser piyan û xwestin bersiva dijminên xwe bidin û di nava jiyaneke azad û serbixwe de, jiyana xwe bidomînin. Vê rabûna gelan tirseke mezin xiste dilê împeryalist û dagîrkeran. Dema ku, dîtî berr ji binê lingên wan têtê kişandin, dîsan hevûdu hembêz kirin û gotin: *"Bavo, em yên hevûdu ne û yên biyanî - ji ew in. Me serê xwe dixist teşqele û belayên giran de."*

Li ber rohiya keska împeryalizmê, rejîma Saddam a faşîst hêdî hêdî xwe komê ser hev kir û dest bi hêrişan kir. Belê, girîng e were ziman. Hêz û hîma Saddam ji hev ketibû. Saddam ne Saddamê 1988'ê bû. Mixabin "rêber" ên gelê ji, ne weke 1988'ê bûn. Hîn jar, lawaz û tirsonek-

tir bûn. Erê ma ne: **Tirs mergê rovi ye.** Rovi û çeçelan pêşiya gelê me girtin û nehiştin li ber xwe bide. Ev çawa dibe? Neh-deh partiyên (!) nekarîn bajarekî başûra Kurdistanê bikin weke Stalîngradê. Gelê me heta dawiyê xwe amade kiribû. Biryara xwe ya şoreşgerî xurt kiribû. Bi tenê ew kesên ku, girîng bû rêberiyê bikin, ava serê wan germ kirin û berê gel dane revê.

Meşa mirinê dirêj û dijwar bû. Ne rojek, ne dido, ne sisê... Bi rojan wê rêveçûnê dewam kir. Fature ji gelekî giran bû. Rojê bi tenê 1900 mirov jiyan a xwe winda dikirin. Dijminên din ji ku di kuştina gelê me de beşdar bûne, vê carê li dora cendekê wî kom dibûn û welê digotin: *"Erê, ji we re destê alîkariyê. Na... Nabe hûn birçî bimirin. Têr bixwin, dû re bimirin! Ha ji we re çadir! Çend dixwazin çadirên me hene. Kincên di binê depoyên me de rizî bûne zehf in. Şokladên di fabrîkan de kevin û kufikî bûne pir in. Çiqas dixwazin emê bişînin. Kurd mirov in û bona wan ji mafê mirovan lazim e."*

Di ekranên televizyonên cîhanê de, kurdan tenê li ezmanan dinêrî. Çavên wan li xêr û bereketa "Hecî Bush" dima. Maşallah! Ev çî xêr û xweşî ye. Di cîhanê de, neha qet milletekî weke kurdan xwedîçadir nîn in. Xelekên trajediya sed-sala bîstî, berdewam dikin. Çend şebekeyên kurdên derve ji hesabên xwe veqerandin. Çawa bazirganiyê bikin. Çawa mamosteyên xwe John û Bush razî bikin. Ev weke pirsaxekemîn, xwe dihavête holê.

Tevîheviyêke mezin di serê gelek "şoreşger" ên duh de çêbûye. Gelek ji wan niha li ber def û zirneya împeryalizmê xwe hiltavêjin. Gotinên xwe yên duh zû ji bir dikin. Yên Saddam kiribûn Saddam kî ne? Yên karxaneyên gazê "diyarî" gelên Kurdistanê û Iraqê kiribûn kî ne? Yên Iraq kiribûn gola çekên xwe kî ne? Û yên "fatihê" li ser gelê me xwendin û di rûniştinên Lozanê de welatê me tarûmar û parve kirine kî ne

Gelê me bi vê rêveçûna mirinê gelek tişt winda kir. Rastê perîşanî û belengaziyeka mezin hat. Tevî vê yekê jî, vê meşê ev rastî îspat kirin: Pirsax kurdan ne pirsax mafên mirovan e. Pirsax bi çadir, xwarin û vexwarinê çareser nabe. Kurdan bi konferans û ramûsana destên Sosyal-Demokratên Ewropayê nikarin derbasê nava rojeva karûbarên Yekîtiya Netewan (UN) bibin. Xwîn û

keda jin û zarokên **Rêveçûna Mirinê**, diwarên bêdengiyê hilweşandin. Kurd û Kurdistan bi cîhanê dane nasdan. Kurdan wateyên dostaniya çadiran fam kir. Pirsax serxwebûn û azadiyê, xwe hilimande koçberêka nûh. Ji her rojekê gotina bav û kalan **"Swarên xelkê tim peya ne."** rastî û zardestiya (hukmeta) xwe nişan dide.

Kurd neçar in piştî xwe bidin çiyayên xwe. Kurd girîng e rim û mertalên Med'an, gurzê Rustem, viyana Şêx Saîd û Seyid Riza û tîfinga Elî Şêr bernedin. Rizgariya kurdan di kampên kolan de nîn e. Rizgariya wan, girêdayê cenga li hevberê dewletên faşîst e û bi taybetî faşîzma Saddam û dewleta Tirkiyê... Alternatîf tenê yek rê ye. Bi hev re rabûn, pêşketin û berxwedan... Oto-banên Bexdad, Anqere û yên din, me rizgar nakin.

Di vê pêşgotina jimara Kovara me ya 7'ê de, em panorama bûyerên Rêveçûna Mirinê nawêşînin. Em baş dizanin her mirovekî me, kêlî bi kêlî daye dû vê pirsê û hemû nûçe û xeberên vê meşê bihîstine. Lewma bi tenê em pirsê dihavêjin holê. Meşa Mirinê erk û delametên çawa dihavêje ser milên rewşenbîrên welatparêz? Mirov çawa dikare ji bin vî barî derkeve? Alternatîfa vê rewşê çî ye? Ji niha û pê ve perspektîva kurdan çî dibe? Gelo Meşa Mirinê wê çawa derbasê lîtratura me bibe?

Xwendevanê rêzdar û hemû rewşenbîrên welatparêz û şoreşger!

Kovara me REWŞEN formeka danûstanên demokratîyê ye. Bi pîvanên welatparêziya rast, her kes dikare bibe mêvanê me û rûpelên REWŞENê dagire. Heta were gotin bawerîya me bi bîr û baweriyên azad heye. Ti hêzeka pêşiya raman û daxwaziyên demokrat û şoreşger bigre, em mafdar nabînin. Çi eger û sedemên pêşiya me bigrin nîn in. Tenê di riya welatê de û bona gel em banî xameyên we dikin. De werin em, têkevin hawîrkana şerê gelî, ziman, gotin û xameyên xwe li hevberê dijmin tûj bikin û di riya serketin û serfiraziyê de, bi hev re bimeşin. Bi xwîn, ked, lebat, rabûn û rûniştina xwe, em riya welatê vekin.

Em li benda roja serketinê, di hemû karûbarên we de, pêşketin dixwazin. Û heta hejmarê 8'ê, hûn tev di xweşiyê de bimînin û hezar silav...

REWŞEN

Nameyên xwendevanan

Hevalên hêja, hevalên kovara REWŞENê û Yekîtîya Rewşenbîrên Welat- parêzên Kurdistan - YRWKê

Berî her tiştî ez, di kar û barê we yê hêja de, ji dil û can daxwaziya xwe ya serkeftinê diyar dikim û silavên germ û gurr ên şoreşgerî û welatparêziyê ji bo bidestxistina parçeyeka axa rizgarkirî ya welêt, pêşkêşî we dikim.

Hevalên delal, dema min cara pêşîn kovara REWŞENê dîtibû, dilê min tavil ketibûyê. Ew kovara kurdî ku min di lîteratûra kurdî de heya niha qet nedîtibû, li pêş çavên min raxistî bû. REWŞEN! Navê wê jî bi hijmekarî û zanyariyê taybetî hatibû hilbijartin. Min di awira pêşîn de dît ku REWŞEN, weke nav jî li ser; bi bejn û bala xwe ya ciwan û bi taybetî jî bi naveroka xwe ya têr û tijî, çarmedora xwe rohnî dikir. Bi taybetî jî qada lîteratûra me geş û dewlemendtir dikir. Heya neha, di dîroka me de, bi vî awayî, çî kovar derneketine. Bingeh û qada ku bejna REWŞENê li ser radibe, tişteke teze û nuh e. Belê, di dîroka edebiyata me de, kovar û rojnameyên gelekî hêja û dewlemend hene. Lê heya neha qet kovarek weke REWŞENê bi zanistî û xwedî armanc û idealên wisan xurt û diyar li nav me kurdan nehatiye pê. Ez bawer im, ku kovara REWŞENê dê her pêş de here û di warê torevaniya kovar û rojnamevaniya kurdî de bibe bingehê zexm û xurt, guleke rengîn, purşeng û bihindar. Pêşniyara min ew e ku kovara REWŞENê li çarmedorên cihanê, xwe bigehîne kurdan û di warê ziman û rastnivîsîna kurdî de bibe xwedî standard û eko-keke bingehîn. Dil dixwazê ku REWŞEN di vî warî de bi pêngavên mezin xwe bigehîne armancê. Bi rastî kovar û rojnameyên kurdî ku îro derdikevin, rewşa wan pir *dramatik* e. Yek jî nikarin zimanê kurdî, li cih bi kar bînin. Ez bi vê gotinê, bi çaveke nizm li xebat û kêferata wan nanihêrim. Lê realîteya me ev e. Yê girîng ew e ku îro mirov li xwe varçile û li gor rewşê, hewildanên nuh û pozîsyonan biafirîne. Îro REWŞEN jî, ji kovar û rojnameyên dinan cihêtir, derveyî warê hewildan û kêferatên xwe yên nuh û teze, di warê zimên de, bi wan kovarên dinê re, her di botekê de dihêje. Lê weke Mazlûm gotî, "Tenê ew ên ku hiş, bawerî û hêviyên xwe bi biryardarî danê, ew armanc bi dest ve tînin - ne yên ku li gor bayê dilivîn." Cudabûna REWŞENê, ji gelek kovarên dinê di vir de diyar e. Pêwîst e ku REWŞEN, bi pêngavên xurt û mezin doza gihana zimanekî zelal, rast û şêrin ji xwe re bike armanc. Û ez ba-

wer im, cudabûna REWŞENê ji kovar û weşanên kurdî ên dinê, di vir de ye. REWŞEN jî hemû kovaran bêhtir hemdemî ye. Dînamîkên REWŞENê xurt in û soz û peyman-darê rojên dahatî ye REWŞEN... Rexneyeka min a dinê jî ev e ku REWŞEN heya îro nebûye xwedî peryodeke rêk û pêk. Ev jî bo Kovarê pir girîng e. Bi bir û baweriya min REWŞEN gava xwe gihande vê merheleyê, dê ev li ba min bibe sedema şahiyeka pir bilind. Ez bi xwe ji bilî kurdî çî zimanekî dinê baş nizanîm. Ez dixwazim bi zimanê xwe, bûyer û rûdanên li welêt û cihanê fêr bibim - ne ji zimaneka dî ku ez kêr pê dizanim. Mirovên weke min gelek in. REWŞEN di vî warî de valahiyeke mezin dadigire. Çima bi zimanê me kovar yan jî rojnameyê jîndar û tijî welatparêzî neyête belavkirin? Ev pêwîstiyê girîng e. Divêt kovara REWŞENê û heya pilekê jî rojnameya dengê gel û şoreşa Kurdistanê, BERXWEDAN, vê valahiye bi tundî dagirin. Rolên xwe bi xurtî bileyzînin.

Diyar e, babet û nivîsên di REWŞENê de belav dibin, xwedî mane û naverokeke tund in. Mustewa û pîla REWŞENê, di vir de xuya ye. REWŞEN hem kovareke siyasî ye, kulturî ye û divêt kovareke zanistî be jî. Ji bo nimûne divêt Kovar car jî caran kad û behsa hinde bûyer û rûdanên zanistiyê jî bike. Bawer im di vî warî de kêmasiyên REWŞENê gelek in. Hûnê bêjin di Kovarê de belavbûna nivîsareke siyasî, bi xwe, nivîsareke zanistî ye jî. Rast e. Ez jî bi we re... Lê mebesta min ne ew e. Divêt di kovareke weka REWŞENê de nivîsên wek agahdariyên li ser astronomî, filozofî û heya bêjî bijîjkiyê jî hebin. Bi taybetî li ser bijîjkiyê ez dikarin alîkariya REWŞENê bikim. Lewra ez bi xwe bijîjk im. Gelek hevalên min ên intelktuel û bijîjk hene ku ezê bikaribim di vî warî de xebateke praktîk jî bi rê bixim û nivîsan amade bikim. Ji bo nimûne mirov dikare li ser anatomiya laşê mirovan xebateke têkuztir bike ku heya nika pir bi qelsî hatiye kirin, yan jî qet nehatiye kirin. Mirov dikare bi taybetî li ser filolojîyê nivîsarên akademîkî ên xurttir amade bike. Li ser teolojîyê, li ser zeolojîyê û hwd. Dîsa hûnê bêjin ma kurdî têrî nivîsîna li ser van babetan nake. Na! Ev nerast e. Kurdî têrî nivîsîna van babetan dike û gelek e û bes e jî. Vekolîneke biçûk li ser babetê bes e. Kurdî têrî dike. Yê ku têrî nake em in. Em bi zimanê xwe baş nizanin. Rastiya rewşa zimanê kurdî gelek diyar e. Rast e ku hêzên dijminê milletê kurd nehiştine kurdî geştir bibe. Lê ew viyan û îradeya li cem mirovê kurd çî car nehatiye şikenandin û nayête şikenandin jî. Her kurdekî dilsoz ku piçek li ser zimanê xwe mijûl bibe, ewê bikaribe gelek tiştan biserxe. Nexwe gotîna min ji intelktuelên kurd re ye ku heya roja îroyîn jî bi zimanê biyanî dimeşin. Têlaqdanek pêwîst e.

Vegerîna ser zimanê xwe, ewê gelek tiştan bide me. Hesta netewetiya me xurttir bike û bergeha me mîna millet berfirehtir bike. Divêt em her dem Cemil Berekat yan jî Yaşar Kemal û yên mayî bînine bîra xwe. Ev jî bo milletekî şerm e. Skandaleke dîrokî ye. Eger em li xwe nevarqilin ewê gelek ên weke vana hîn di civaka me de derkevin.

Ez van rûdan û fenomenan gelekî girîng dibînim. Ez bawer im, dê kovara REWŞENê di vî xalê de rola xwe pir bi girîngî bileyze. Ji ber vê hindê ye, çî kar û postîdeyên jî hêzên dijminane hatine ser me, divêt werine diyar-danê û li ber çavan raxistin. Bêguman nebûna kovar û rojnameyên me, girêdayê hicza li ser ax û niştimana me, girêdayê desthilatdariya stemkariya li ser milletê me ye. Lê belê îro kes nikane vê yekê jî xwe re mîna sedemêke bingehîn û mezin bibîne. Îro ev bend û perwaz hatiye şikandin û pelaxtin. Dengê kovar û rojnameyên me dikarin bilind bang bidin. Rojname û kovarên me dikarin têkevîne welêt li ser axa niştimanî bihêne xwendin. Ma jî vê pîrozîr tiştê mayî heye? Lewra dibêjim, divêt kovareka weka REWŞENê, wê rola xwe ya girîng bi biryardarî bileyze. Heya nameyêke dî, bimînin di xweşiyê de.

H. Dilêr / Stockholm

Hevalên YRWKê ên delal û karbedestên kovara hêja REWŞENê...

Di gel silavên germ û gurr...

Hejmara 5 ya REWŞENa hêja û delal gehîste destê min. Ezê pir be dil spasî we dikem.

Hevalino! Her wesana ku kovara REWŞEN û agahdariya we da hatiye xuyakirin, YRWK dixwazê ku le heyva gulanê da kongira xwe ya 2'yê çêbike.

Ez ji riya dûr, ji Kurdistanê, silavên germ ên xwe pêşkêşî hemû hevalên endam û beşdarên kongirê dikem û serketina we û kongrê û YRWKê dixwazim.

Her bijîn ji bo Kurdistan...

Ehmed Şerîfî
'91.3.20
KURDISTAN

Bersîva nameya xwendevanê REWŞENê, hêja H. Dilêr

Hevalê hêja, nameya we û bi taybetî jî, naveroka nameya we, em pir dilxweş kirine. Lewra em bawer in, ku di her barî de rexne û pêşniyar (kritik & alternatif), ji bo me tiştekî pir bi nirx û hêja ne. Rexne û pêşniyar, pirî caran, dikarin, ji mebesta xwe, bi dîrkevin û bibine navgîn û wasitayên rûxandinê - ne ya çêkirinê... Hingê, rexne wateya xwe winda dike. Nexwe, rexne ji bo baş û rindkirina kar û kêferatekê ye. Ne ji bo rûxandin û xerabkirinê ye. Rexne, ji bo serrastkirina kêmasî û şaşiyên e. Divêt, li rex rexne, pêşniyar jî bihêne diyarkirin. Rexneyên bê-pêşniyar, dikarin gelekî pûç bin û kêrî tiştekî neyên.

Me li nameya we dît, ku rexneya we, li gel hinde pêşniyaran hatine bestin. Em bi vê yekê gelekî kêfxweş dibin.

Rast e ku *ciyê REWŞENê di toreya kovar û rojnamegeriya kurdî de, ciyeke taybetî û bi serê xwe ye*. Em dikarin di vî barî de hinde biraninan, rûberî û muqayeseyan jî bikin.

Em ji rojnameya KURDISTANê dest pê bikin. Ev rojname di sala 1898'ê de, ji hêla rewşenbîrê kurd, M. Mîdhet Bedirxan, li Kahîrê derdikeve. Lê belê nikare bi berdewamî jiyana xwe bidomîne. Di sala 1913'yê de, li Stanbolê ROJÎ KURD derdikeve. Kovara JÎNê (1918) bi du zimanan (kurdî-tirkî) dest bi derketinê dike. Piştî hingê çend deh salan, li Başûrê Kurdistanê, kovareke bi navê GELAWÊJ (1943) derdikeve. Di sala 1932'yê de, kovara HAWARê dest bi jiyana xwe kiriye. Di wê heyamê de, kovara RONAHÎ (1942) û rojnameya ROJA NÛ (1943) dest bi jiyana xwe ya weşanê dikin.

Em dikarin li teniştê van kovar û rojnameyên kurdî û yekta, gelek kovar û rojnameyên lokal û mehelli jî rêz bikin. Lê çî car van kovar û rojnameyan, nebûne xwedî keys û derfeteke rewşa aza û serbest. Ji ber vê astengê, li ber gelek êriş û kêferatên nehemdemî mane û her bi vî awayî, jiyana wan dawî hatiye. Kovarên kurdî li derveyî welêt, her car, para xwe ya stembariyê têr standine. KURDISTAN li Kahîrê derdiket. Ji xwe yên li Stanbol, Bexda û Şamê derdiketin, xwe çî car, jî êriş û kêferatên dagirkeran nekaribûne biparêzên. Piştî heyamekê, jî holê rabûne. Ew rewşenbîr û ronakbîrên di

destpêka vê sedsalê de derketine Ew-rûpayê (xwendekarên kurd ji dema osmaniyan), wan jî, di vî barî de tişteke berçavî ku heya îro mabe nehiştine. Weke Ekrem Cemîl Paşa, di biranînên xwe de ku (li ser xwe jî) gotî, *bi fermana dolîwgeriya osmaniyê*, dîsan vegeyane Stanbolê û çî keleporeke derveyî welat, jî nişên dahatî re nehiştine.

Rewşa kovara REWŞENê gelekî cihêtir e. Kovara REWŞENê, di dem û domaneke gelekî girîng de dest bi jiyana xwe kiriye. Di demeka welê girîng de dest bi jiyana xwe kiriye, ku têkoşîna rizgariya netewa Kurdistanê, ji her demekê bêhtir bilind bûye. Di vê domana dîrokî de, rewşenbîrên welatparêzên Kurdistanê, xwedî li şoreşa gel û welatê xwe derketinê. Vê mebestê jî xwe re mîna erk û bareke bingehîn hilgirtine. Kovara REWŞENê berhe- ma domaneka welê bi wate û zaniyarî ye.

Di warê rastnivîsîna kurdî de, em dikarin vê bidine diyarkirin, ku di hinde xalan de, dîtinên we li cih û rast in. Rewş dramatîk e. Lê belê ev rewşa dramatîkî ne ji bo zimanê kurdî ye. Ji bo mirovên kurd û heya jî bo rewşenbîrên kurdan e... Her çend îro qedexekirî jî bin, zimanê me, di klasîkên me û di stran û folklorê gelêriya me ya hêja de, li pê û jîndar in. Girêdana me bi wan re çendîn xurt û tund be, hingê, kurdiya me jî dê ewçend xurt û tund be. Anku em di jiyana xwe ya rojane de, çîçekî jî be, li ser tore û folklorê xwe bijin, ev dê bikaribe perwerdeyê kurdî gelêrî, bide me.

Rast e, divêt mirov bi çaveke nizim li çî hewildan û kêferatên çandî yên kovar û rojnameyên kurdî nenihêre. Îro kêmasiyên wan gelek in, lê eger jidil hewil bidin, siberoj, dê ev kêmasiyên wan kêmbin.

Li ser rexneya we ya periyoda kovarê, em dikarin çend tiştan diyar bikin. Ev kêmasî, ji ber gelsên teknîkî heya îro li ser REWŞENê hebû. Hewildana me ew bû ku em vê kêmasiyê ji binî rabikin û REWŞEN, her di kêlîka xwe de, bikeve destên xwendevanên xwe. Em dikarin bi sedema vê bersivê jî mizgîniyekê bigehînine we û hemû xwendevanên REWŞENê, ku kovara REWŞENê, bi vê hejmarê û pê ve, vê kêmasiyê jî holê rakiriyê.

Weke hûn dizanin REWŞEN kovareke çandî, hunerî, wêjeyî û ramyarî ye. Li ser rûpelên REWŞENê, nivîsar û gotarên jî van babetan, li gor merc û hoyên zanistiyekê dihêne rêzkirin. Pêşniyarên we yên li ser babetên dinê, eger ji destê me were, emê li gor derfetê li ser rûpelên Kovarê

dahênin. Em bi dilxweşî, xweşhatina nivîsarên we yên bijîjkiyê dikin û em hêvîdar in ku hûnê di vî warî de vekolînen xwe bigehînine Kovarê. Em, li ser gotinê, dîsan bang li hemû rewşenbîrên kurd dikin, ku deriyê REWŞENê ji bo berhemên we yên hêja her dem vekirî ye. Li ser filologiyê me destpêkekê kiriye û em amade ne berhem û vekolînen vî cûreyî, di Kovarê de bêhtir biweşînin.


Têkoşîna rizgariya netewa Kurdistanê û bi taybetî jî têkoşîna çekdarî, hîkarî û posideyê mezî li ser zîman û kultura me kiriye. Berî têkoşîneke çekdarî, li çî perçeyên Kurdistanê rûmet û nirxeke biçûkî jî nedidane zîman û kultura me ya dewlemend û kevin. Her qedexekirin û jî holêrakirina zîman û kultura kurdî armanca dagirkeran bû. Lê dema kurd dest avête çekê û got *na ez vê daketîbûnê napejîrinim!* vêca dijmîn li her alî, bi durrûtiyê kirêt û daketî, *kada serbestiya zîman û kultura kurdî dike*. Rûmet û nirxa zîman û kultura me kurdan, çî car wisan kêmbû nehatiye daxistin. Lê îro dijmîn bi vê hêjayiya milletê me, bi vî rengî, bi kirêtî dilîze. Divêt valabûna - hêja ne serbestî - ku dijmîn di vî warî de îro diyar kiriye, jî bo gihana nava girsên kurd keys û derfeteke êdî berfirehtir derîne holê. REWŞEN jî roja ku dest bi jiyana xwe kiriye, li çarmedora Kurdistanê tete xwendin! Belavbûna REWŞENê li nava welêt, jî bo bizava rewşenbîriya welatparêz, keys û derfeteke pir baş e. Ji bo derveyî welêt jî, her wisan e. REWŞEN weke dengê bizava rewşenbîriya welatparêzên Kurdistanê, dengê xwe li tevayî cihanê bilind bang dike û ev deng li çarmedora cihanê deng vedide. Di dîroka rewşenbîriya Kurdistanê de ev fenomenek e. Dengê rewşenbîrên welatperwer her wisan dikare bigihê cihana mezî jî.

Careka din em dibêjin, em bi nameya we gelekî dilxweş bûn û eger name û nivîsên we yên dinê jî bigihên destê me, emê bêhtir dilxweş bibin. Her wisan em li benda nivîs û vekolînen we ne.

Bi silavên rizgariya netewî û bi hêviya rojên ronak û azad em sipasî we dikin û di kar û kêferatên we de her dem serkeftinê dixwazin.

REWŞEN

Pîrozbahiyeka
NEWROZê
Ji Şamîl BATMAZ Ji
Zindana Dagîrkeran



Şamîl BATMAZ

Gelê me, her Newrozên xwe yên nuh, li ser mîras û kelepura Newrozên berê, bi bîr û baweriyeye zanyarî û rêxistinî pîroz dike.

Ew agirê berxwedanê, ku ji hêla **Kawayê hevdemî Mazlûm DOĞAN**, li zindanan hatiye vêxistin, li ser birc û kelehên Diyarbêkrê, bi laş û bedena **Zekiye ALKAN**'an gurr û geştir bûye, li serê çîyan, li deşt û beriyân, li bajar û gundan xwe bi serhildanan re kiriye yekpare û ji bo wê têkoşîna dijwar a ji bo mafê mirovatîyê vêdi-keve.

Newroz ku sîmbola azadiyê, berxwedan û xweşiyê ye, îro bûye xwediyê karaktereke înternasyonalîst û bûye roja birayetî û piştgiriya gelan li hevberî nijadperestî, faşîzm û dagirkeriyê.

Bi hêviya di vî rojî de bêhtir hevgirêdan, xurtbûn û pêskertina yekîtiyê û piştgiriya me û hêzên gelên bindest û karêrên cîhanê...

Bi dileke şad û xweş...

Şamîl BATMAZ
Zindana Aydin'ê
AYDIN / TIRKIYE

Pirtûka

ŞEVA ÇAR LEHENGAN

Pêşgotina M. Selîm ÇURUKKAYA

Ne tişteki hêsan e ku mirov zindana Amedê ya leşkerî, bi awayekî piralî bi-hêne zimên.

Xwe amadekirina ji bo karekî weha, konsantrasyoneke kûr dixwaze. Karekî weha, jiyaneke dirinde ya dîrokî dihêne bîra mirovî. Ji bo mirovê ku di jiyaneke wilo de mabe, bîranîna vî tiştî jî, bi xwe, kabûseke mezin e.

Mirov nivîsevanek, yan jî wênekêşekî çendîn baş be jî, dîsan nikare Zindana Amedê û dirindetiya ku di wir de hatiye kirin/dibe, bêyî kêmanî bi-hêne zimên. Ev, ji bo kesên ku di zindanê de jiyane, ji bo wan jî wilo ye.

Nivîsevanên vê berhemê bi xwe jî, ji bo ku bikaribin zindana Amedê bi awayeke herî baş binine zimên, daxwazî ji min kirine ku ez pêşgotinekê binivîsim. Min jî, bi dilxweşî xwestina wan bi cih anî û min nivîst. Weke min ji serî ve kad kiribû, dirindetî û şikenceya di hundirê zindana Amedê, ku hatine kirin, pir in û cûr bi cûr in. Ji ber vê sedemê jî, bi awayekî vekirî ku meriv bibêje, pêşgotina min jî ne mûmkûn e ku her bûyerên qewimiye bihêne zimên. Lê wê bibe alîkariyeke baş ji bo têgihîştina vê berhemê.

Nivîsevanê vê berhemê, Fevzî YETKIN û Mehmed TANBOGA, ji sala 1981'ê vir de ye, li zindana Amedê, di şikbeya (qawîş) 33 de diman. Ewna şahidên bûyera xwesotina, Ferhad KURTAY û her sê lehengê din in. Ferhad û hevalên xwe, ji bo zilm û şikencê, dirindetiya li ser zindaniyan di-hate kirin rabe, xwe sotan û bi vî awayî, rejîma dev bi xwîn a tirk protesto kirin. Şikba 33 nimûne ye ji bo jiyana zindana Amedê.

Ez bi xwe jî di wê demê de, di wê zindanê de dimam. Ji ber vê sedemê, bûyerên ku di zindana Amedê bûne, ez jê ne dîr bûm û di navê de dijiyam. Ji bo têgihîştinek bê kêmanî, di dema xwendinê de bigihê xwendevanan, ez dixwazim li ser zindana Amedê, hinekî rawestim û çend tiştên bin-

gehîn binime ziman.

Piştî cûntaya leşkerî ya îlona sala 1980'yî, rejîma tirk xwest ku zindana Amedê bike navenda zil, şkence û dirindiyê. Bêguman ji bo karekî weha jî, mirovên xwedî pêzanî (tecrube) pêwîst in. Li ser vê bingehe, di meha çileyê pêşîn (November) sala 1980 de, efserê tirk Mevlut AKKOYUNLU "GESTAPO" mîna serkarê parastina hundirê zindana Amedê, dest bi kar kir.


Gestapo, ferman li ser ferman deranî û zindan kir navenda şikencê û dirindetiye. Wî fermanên xwe, wilo dihanî zimên;

- Mirovên ku di dema hejmartina zindaniyan de li ser lengan raneweste û heya hejmartinê xwe ranegire, dê lêxistineke xerab bixwe.

Li gorî wî; zencîra di dest de, ya ji pola û qalind, tizbiya wî ye. Jopa (ço) wî jî, her ji bo lêdanê ye.

Kişandina por û sîmbelan hat rojevê û pişt re, xwendina dua li ser xwarinê hat û ya ji hemûyan kambaxtir, şikencê dirindî dest pê kir. Kesên kû dihatin girtin, bi awayekî sistematîkî dihatin şikencekirin. Di dema şikencê de, qêrîna girtiyan digirte teybê. Ji dema razanê heya berbanga sibê, ew qêrîni di hoparloyên mezin, bi dengeke pir bilind bi tevayê girtiyan dida guhdarîkirin. Dengê qêrîniya ku ji hoparloyan derdiket, bi ser zindana Amedê diket û li hin taxên Amedê jî dihatê guhdarî kirin, hêstîrên dayikan dihatine xwar. Razan qedexekirin, merivên radizan an jî li dijî wan derdiket, di şikencê xerab re derbas dikirin û pişt re ku bêhiş diketin, nivmîrî wan dihavetîn şanan (huc-re / cell).

Zindaniyan, ji bo rakirina van zordariyan, di 2'ê çileyê paşîn (January) 1981'ê de, bi tevayî dest bi berxwedanê kirin. Greva birçibûnê. Dervevî çend grûbên biçûk, zindani, bi awayeke xurt û hema bi tevayî beşdarî vê berxwedanê bûn. Piştî deh/duwanzde rojan, ji bo şikandina vê berxwedanê,



Dîmenek ji dirindetiya li ser zindaniyên kurd li zindana Diyarbêkrê - "Hemam!" Xêz: Zulfikar TAK

dijmin xwe piralî amade kir û çûn ser zindaniyan.

Leşkerên bijarte, dest bi şikenceya taybetî kirin. Kesên ku li hevberî zordariyan serî hildidan, ew ji şikenceyên piralî derbas dikirin û piştî ku ji hişê wan diçû, ew di dû xwe de bi kêşandin dihavêtin şanan (hucreyan). Xwestina wan diyar bû, ku kesên berxwe didin, di şanan de bidin hev û kesên ku di şikban de ne, wan li gorî xwestina xwe bi awayê cûrbecûr, bi kar werînin. Ev sîstema dirindî heya roja 4'ê sibata sala 1982'yê berdeyam kir. Di vê demê de gelek kesên ku li berxwe didan avêtin şanan, Yên mayî jî, di şikbeyan de man.

Bi vî awayî, dan û standiniya di nav kesên pêşeng û berxwedanvanên di şikbeyan de, heya deverê hate bi şinorkirin. Di wan rojan de, Gestapo çû deverêke din û serbaz Esat Oktay Yıldiran, hat şûna wî.

Esat Oktay Yıldiran, bi dirindiya xwe ji Gestapo derbas kir. Ferman di roja xwe de pêk anî û xwestinên xwe bi cih anî. Kesên ku di hundirê şikbeyan de dijiyan, ji bêçarî fermanên xwestî hanîn cih Ev fermanên xwestî:

- Xwendina dûaya li ser xwarinê
- Strandina marşa netewî ya tirkî
- Qedexebûna derketina eywanê ji bo hewastandinê
- Bi xwendina marşên şovenî, bi rêveçûna (meşa), nîzama leşkerî çûna hundirê şikbeyan

- Şanîdana rêzdarî li ber leşker û serbazên tirkên zindanê û hwd bûn.

Piştî ku Esat şikbê bêçar kir û hinde kes siparî wî bûn, berê xwe da şanan.

Hejmara kesên ku li berxwe didan,

Piştî xwarinê, dema jimartina girtiyan bû.
Her kes, pêşî, bi dorê, silav didane gardiyan. Pişt re, nav - paşnav, bajar û dîroka ji dayikbûna xwe ji leşkeran re, bi dengeke bilind digotin.
Bi dorê, hejmara xwe digotin.
Piştî hejmar dawî dihat, li ser çokên xwe rûdiniştin.
Ev kar di rojê de, bi sedan caran di hate dubarekirin. Ji aliyê psikolojîk ve, ev tişt, mirov ji kesani (şexsiyet) derdixist û dikire mîna robotê, yan ji acziyeteke mezîn li ser zindaniyan dida paydekirin


nêzî 600 kesan bûn. Ji van, ji bilî du kesan, yê din tev girêdayiyê Partiya Karkerên Kurdistan-PKK'ê bûn. Evan kesana, çî ferman nas nedikirin û li dij biryarên wan ên ku tenê hovîtiyê bi xwe re tîne, bi xurtî radiwestîn. Esat Oktay ji bo ku van berxwedanvanan jî bêçar bike, li eywana şanan cihê şikencê, yê taybetî da çêkirin (Navê wê eywanê, şikbeya 35'ê ye). Li van cihên taybetî / li eywanan, şikence bi berbangasibê dema saet 05.00 dest pê dikir û heya êvarê saet 17.00'yê berdeyam dikir. Dixwestin ku berxwedanvan; xwe bispêrin neyarên dagîrker. Serbaz û leşkerên dagîrkeran, ji bo ku vê xwestinê bi destxînin, bi dorê her girtî di şikencê re derbas dikirin û şikence heya, ji ser hişê çûna girtiyan berdeyam dikir. Piştî ku ji ser hişê xwe diçûn, bi nîvmirîti ew dihavêtin hundirê şanan.

Zordarî, ne li 35'ê tenê hebû. Li şikbeya 37'ê jî, di hundirê şanên wê de şikence hebû. Bi fermanê, lingê girtiyan bi awayekî tazî, di derabê derî de dihatin derêxistin û bi darên qalind, li lingan didan. Carina ev kar 24 saet berdeyam dikir.

Di zindana Amedê de, berxwedan û şikence bi hev re berdeyam kir. Heya roja 4'ê Adara sala 1981'ê, ku di wê rojê de, di bin pêşengiya şoreşgerên hêja Kemal PİR û Hayrî DURMUŞ de, grûbek şoreşger biryar da ku dest bi rojiya mirinê bikin. U rojiya mirinê dest pê kir. 22 roj ji ser livbaziya rojiya mirinê derbas bû, roja 23'yê, ji şanên ku bi şikbeya 37'ê ve girêdayî ye, 110 kesên berxwedanvan anîne şanên ku bi şikbeya 35'ê ve girêdayî. Roja 30'ê, ji berxwedanvanan Alî EREK şehîd ket. Li ser şehîd bûna wî, grûba ku dest bi livbaziyê kir bi hêztir bû û hejmara wan hilkişiyê 28 kesan. Piştî 42 rojan, roja 43'ê, E. Oktay Yıldiran soz û peyman da girtiyan ku zordariya di hundirê zindanê raweste. Li ser vê yekê rojiya mirinê hat rawestandin. Di demêkê pir kûrt de, E. Oktay Yıldiran li ser soz û peymanên xwe ranawesta û dîsan dest bi şikencan kirin. Heya roja 26'ê gulan 1981'ê, girtiyan tu ferman nas nekirin û weke xwe kirin. Piştî vê rojê xwe spartin wana.

Ev xwesipartin çî carî nebûye weke spatineke îdeolojîkî. Hemû girtiyan zanibû ku xwesipartin tişteki xerab e. Bi tevayî ji rewşa ku ketibûnê ne dilxweş bûn û nifir li xwe dibarandin. Sipartinek wanî, bi xwe sipartineke fizîkî ye û gerek e wisan bête dîtin. Ji xwe piştî de-

**Lî zindana Amedê,
ji bo kontrola doktor,
serlêdan û çûna nexweşxanê
bi xwe, şikenceyeke mezin
bi xwe re tine. Kesê ku li
ciyê doktoran dinêre, ew
ne doktor e. Ew gelek
caran beytar e. Dibe ku
doktor be ji, lê belê ew
mirovên nexweş mîna pez
û sewalan dibîne û bi wî
awayî kar dike. Mirovên
nexweş, di bin şikencê de
diçin nexweşxanê.**



Dîmeneka xêzikan ku berxwedana zindaniyan dihêne ziman:
- Berxwedan Jiyan e! Xêz: Zulfikar TAK

meke din, dê êsîrên kurd, yan dê têkevin rêça xiyaretê yan jî dê rêça berxwedanvaniyê hilibijêrin. Ji bilî PKKê, grûbên din hemû, hem bi fizîkî û hem jî bi îdeolojîkî xwe spartin neyaran. Lê weke ku dê di hundirê berhemê de jî, bête dîtin, Ji ber ku PKK'ê bi îdeolojî xwe ne sipart dijmin, berxwedanvanî hilibijart û berxwe da. Ev di berhemê de, bi awayeke vekirî di kesaniya Ferhad KURTAY de tete dîtin.

Piştî ku di şikbeya 35'ê de, xwesipartin pêk hat û girtiyan xwe sipartin E. Oktay; şikence û dirindiya ku dijmin dest pê kir, ji bo her girtiyekî kêlî û deqîqe bûn saet, saet bûn roj, roj bûn meh, meh bûn sal... Kêlî bi kêlî û saet bi saet şikencên cûrbecûr dikirin û zindana Amedê bû navenda şikence û zordariyên dirindeyî. Ji bo kû ev dem baş bête têgihîştin, eger hûn dixwazin emê li rojeka jiyana zindanê binihêrin.

Nobedarê şikbeyan, bi berbanga sibê saet 05.00'ê, bi çend dangan, girtî ji xew şiyar dikirin. Ji bo şikbeyekî tuwaletê hebû. Gerek e hundirê 15 kêliyan (deqîqan) de cilê xwe li xwe kin, di tuwaletê de destava xwe bikin, ruwê xwe biqusînin û mîna leşkeran têkevîne rêzê. Ji bo ku sazendiya leşkerî dest pê bike, dijmin, heya avê jî qut kiribû. Bi awayekî din gerek e girtî bêtî av herine tuwaletê û ruwê xwe biqusînin...

Girtî bi tevayî derbasî rêzê dibûn. Rêveçûna leşkerî dest pê dikir. Rêveçûn heya saet 7 berdewam dikir û vê di hundirê şikbeyan de dikirin. lingê xwe bi hev re, bi yek tempo, bi

awayekê hêc li erdê didan û li gorî xwestina fermanê, gerek e marşên tirkîkan yê şowenî mîna sitirana bihata stîrandin. Ji saet 7 heta xwarina qerwanê dihanîn... Bi hatina qerwanê marş radiwesta. Berpirsiyarê şikbê bi bazdan diçû devê derê ji bo ku qerwanê bîne hundir. Diçû ber derê û silava leşkerî ji gardiyan (Guard) re dida "Ku bi destûra te bê, ezê qerwanê bibime hundir."

- Rahêjiyê kûçik kurê kûçik!.. Bersiva gardiyan ev bû.

Berpirsiyar radihêjin qerwanê û bi lez diçin hundirê şikbê. Berî ku xwarin bela bibe, gerek e dûeya xwarinê bête xwendinê û pişt re jî gardiyan ji wan re bibêje "Afiyet bê!" û ew jî lê vegezin "Spas!" Gelek caran gardiyan şûna peyva "Afiyet bê!", çêr û sixêfên pîs û kirêt ji girtiyan re dibêje; mîna "Hûn q...a diya xwe bixwin!" Yan jî "Hûn k...ê min bixwin". Helbet gotinên wisa nexweş, li ser mahneyekê digotin. Û ev mahneyên gardiyanan her ne bi xeber û sixêfan bû. Lê gelek caran ceza jî didane girtiyan. Weke nimûnê, her roj, xwarina wan dirêtin tuwaletê û pişt re ji wan re şikenceya bi navê "Têkevin bin textebandan! (Ranza altî ol!) bi wan dikirin. Piştî lêdanekê radi-bûn ser xwe. Eger xwarin bixwarana gerek bû, şikbeyek di hundirê 15 kêliyan (daqîqan) de xwarinê bixwin.

Piştî xwarinê, dema hejmartina girtiyan bû. Her kes bi dorê, pêşî silav didane gardiyan, pişt re nav û paşnav û bajar û dîroka ji dayikbûna xwe ji

leşkeran re bi dengeke bilind digotin û bi dorê hejmara xwe digotin. Piştî hejmar dawî dihat, li ser çokên (kabo-kên) xwe rûdiniştin. Ev kar di rojekê de bi sedan caran di hate dubare kirin. Ev tişt ji aliyê psîkolojîkî ve, mirov ji kesani (şexsiyet) derdixist û dikir mîna robot, an jî aciziyetêke mezin li cem zindaniyan dida peydekirin.

Dema hejmartina girtiyan, fermanberê li ser girtiyan rawestayî, yan gardiyan, yan serbaz, yan jî leşkerên komando ne.


Ev kes dema ku dihatine ber şikban, di destê wan de ço û darên pir qalind hebûn. Di her dema hejmartina şikban de, her dem şikencên cûrbecûr bi girtiyan di hate kirin. Ev kar ji serê sibê heya evarê bêtîrawestan, her dem hebû. Girtiyên ku roja dadgeha wan bû, ew roj ji bo wan dibû kabûs û doje. Yên ku diçûn dadgehê, li eywanê didane hev. Gerek e berî saeta dadgehê bi çend saetan, amadebûna li eywanê û bi rêzê li ser lingan rawestiyana. Pişt re li bêtîkên wan digeriyan û cilê wan ji wan dikirin, li derpiyê wan digeriyan. Pîrî caran derpê jî ji wan dikirin û bi fenerê li wan dinihêrin. Piştî gerîna li ser û cilên girtiyan, wan dibirin salona cihê rawestanê. Li wir, bi saetan di cih de mîna leşkeran dimeşandin û stranên şowenî yê tirkî bi wan didane gotin. Dest û lingên wan qeyd û zencîr dikirin û bi çoyan (copan) li wan didan. Di dû xwe de dikêşandin heya otobusa leşkerî. Hinek dikêşand û hinekan jî tenê li wan

didan. Mîna balyayên pembû, girtiyên kurd davêtine ser hev û bi vî awayî di hundirê otobusê bi xwe jî, heya de-vê deriyê dadgehê, şikenceyeke bi taybetî didane girtiyan. Helbet şikenceya dadgehê jî bi xwe şikenceyeke bi taybetî ye. Gerek e girtî berê xwe bidin dadgirê leşkerî û li dora xwe qet nenêrin. Çavên girtiyan her li dadgêr be û bal neçe ser devereke din. Destên wan li ser çokên wan bin û nelebitin. Birçî nebin, tîh nebin, neçîne tuwaletê. Gerek e bibine mirovên mîna ne ji saxan ne jî miriyan.

**Belê, zaroyên vê niştîmanê,
xortên me yên hêja bi
saxî xistibûne tirbekê. Lê,
helbet zaroyên Kawa, li
hevberî dijîminê xwe, dest-
glîrêdayî naminin û di roja
21'ê Adarê 1982'yê de,
Kawayê hevdemî Mazlûm DO-
GAN û roja 17 Gulan
1982'yê jî Ferhad KURTAY
û sê lehengên din, ji bo
ronahîkirina xaka niştîmana
xwe, tarfbûnê jî zindanê
çirandin û canê xwe fîdayê
niştîman kirin.**

Mirovên ku xeletiyêke biçûk kiribe, di vegeerê de, bi hemû awayî wan di şikencan de derbas dikirin. Ger bi awayêke vekirî mirov bihêne zimên; roja dadgehê jî bo girtiyên zindana Amedê, dibû roja şikencê, lêdanê û şikbe li wan dibû dojeh.

Helbet nexweşî û şikence her ne ji bo kesên diçûn dadgehê tenê hebû. Mirovên din ku roja dadgeha wan tune bû, piştî taştêya sibê, dest bi xwendina pirtûkê dikirin. Berpirsiyarê şikbê radihişt pirtûkekê û dixwend. Kesên guhdar, gerek bû hem guhdarî kiribana û hem jî tiştê ku dihat xwendinê, wî tiştî bi dengeke berz dubare bikirana û li yê xwende vegeandibana. Sîstema xwendina wilo, jî bilî Tirkîyê, li çî deverên cîhanê, li çî welatan tune. Karê xwendinê bi saetan berdewam dikir. Yek dixwend û yê dinê lê vedigerandin. Piştî çend saetan, jî bo kontrolê gardiyan dihatine hundir û



guhdarî dikirin. Ji hinekan re digotin;

- Dengê te çima ketiye? Dengê te çima dernayê? Ma tu henekên xwe bi me dikî? Û ew kesana ku dengê wan, ji qare-qar û bare-bara dubarekirinê diket, di şikenceyeke xerab re derbas dibûn.

Ji hinekan re jî digotin;

- Dengê te çima ewçend bilind e? Dengê te çima nakeve? Ev têtê wê wateyê (manayê) ku tu dengê xwe têr ranakî û tu henekên xwe bi me dikî! Bi wî awayî, pir kes di şikencê re derbas dibûn.

Ji bo bêhnberdanê, berî firavîne (xwarina nîvro) girtiyan, xwe bi nasandineke kin (kîsa kunye), derdixînin ciheke nîvvekirî. Berî derketinê, hemû girtî dikevîne rêzê û mîna leşkeran dest bi rêveçûna nîzamiyê dikin. Dema rêveçûna leşkerî gerek e, ling baş rabin û bi xurt li erdê kevin, sîng binepixin. Ev rêveçûn, di bin çû û daran de, bi saetan berdewam dike. Pey re fermantête ku xwe devûrû bavêjine erdê û bi erdê ve bimeşin (surunme). Piştî re wan radikin û girtiyan li hevdu suwar dikin. Ger mirov bi kurtî bêje, heya dema firavîne girtî, di dehan şikenceyên cihêreng re derbas dibin. Bêhnberdan jî bo xwarina nîvro 30 kêlî


(deqe) ye. Gerek e di nava van kêliyan de her kes bêhna xwe berde û nanê xwe bixwe û amade be ji bo dubarekirina karê piştî taştê.

Rêveçûna leşkerî bi şivê re dawî têt. Weke her car, berî xwarinê girtî têtê jimartin û dûa têtê xwendin. Helbet bi şikencê... Roj hemû bi awayêke dirindetî diçe serî û şev têt bi ser zindanê de.

Gerek e girtî li ser piştê razên û xwe nede vî alî yan wî alî. Ji xwe, gerek e tuwaleta kesekî evarê neyê. Li her şikbeyê, li gorî hejmarê kesên têtê de gerek e bi hindikayî 4 yan jî 5 kes nobedar bin û bipên. Nobedar gerek e hevdu biguhêrin. Ev heya sibê wilo ye. Gardiyan her dem evaran digirin ser şikban. Kesên ku dema nobeta xwe de li dora xwe nerîbe û di şikbê de bi nîzama leşkerî bi rê ve neçû be, di şikencê re têtê derbaskirin.

Di jiyana rojane de, pêwîstiya mirov carina bi çend tiştên bingehîn dibin, weke:

- Ji bo pêwîstiya şûstîneka li hamamê
- Ji bo dermankirina nexweşiyên pêwîstî dibe ku mirovî herine nexweşxanê
- Dema hevdudîfîna mermal (eqreba),



nêzik û nasan, çûna hevdu dîtîne

● Hevdu dîtina bi avûkat re.

Li zindana Amedê, ji bo kontrola doktor, serîlêdan û çûna nexweşxanê bi xwe, şikenceyê mezin bi xwe re tîne. Kesê ku li çiyê doktoran dinêre, ew ne doktor e. Ew gelek caran beytar e. Dibe ku doktor be jî, lê belê ew mirovên nexweş mîna pez û sewalan dibîne û bi wî awayî kar dike. Mirovên nexweş, di bin şikencê de diçin nexweşxanê.

Piştî serîlêdana nexweşan ji bo ku herine nexweşxanê, kontrola pêşî ji hêla beytar tete kirin. Mirovên ku rewşa wî ji bo nexweşxanê têr neke, ji şikenceyêka pir xerab re derbas dibin. Ji ber ku dibêjin we derew kiriye û hûn ne nexweş bûn. Çima hûn derketin nexweşxanê.

Mirovên ku diçin nexweşxanê, wan dibin cihên taybetî. Gerek e girtî, li ser piştê raze û xwe nelebitîne. Her ku rabe ser xwe û xwe dirêjke, gerek e li nivînê, xwenasandina kin (Kîsa kunye) bi dengeke bilind bêje. Derketina tuwaletê pir bi sînor e. Di wê rewşa nexweşiyê, şikence fîzîkî û psîkolojîkî li ser wan bi kar dihênin. Mirovên nexweş ku li nav zindanê bimîne belku çêtir bijî. Belku nexweşxanê bi xwe

cihê lezandina mirinê ye ji bo girtiyan. Mirovên ku nexweşxanê ji saxî û silameti derdiket, girtiyan bi çavê lehengekî li wî dinihêrin.

Ji xwe xwarina li wir şolav bû û gelek caran belxam û tifa nexweşan dihavêtine nava xwarinê ji bo ku zindanî bi nexweşiyên din jî bikevin. Kirîna xwarinê li kantînê sînokirî bû. Roja firotina xwarinê, hinde tişt ku zindaniyan dikirin, di wê saetê de digirtin ser şîkbê û xwarinên ku hatibûn kirin, tevî derdor û nivîna dikirin.

Çûna hemamê, roja şikence taybetî ye. Ji xwe çûna hemamê pir kêmbû û sînokirî bû. Her kes, cilê xwe li jêr ji xwe dikirin û bi rêveçûna leşkerî û bi marşên şowênî diçûne hemamê. Bi xertûma avê, av li laşê wana dikirin û bi daran li wan didan. Piştî *temambûna* (!) hemamê, tazî, tevde dihanîn eywanê. Ji eywanê heyanî hundirê şîkbê bi ser zik didan meşandinê (surunme): Laşê wan dîsan qilêr û gemmar dibû. Wê demê, ji bo li xwe kirina cilan destûr didan. Pirçên, ber û bin çengan bi agir dişewitandin.

Roj û jiyana di zindana Amedê, li hundir, li nexweşxanê, li derketina eywan û bêhnberdanê, li hemam û hevdu dîtina merivan de bi şikence derbas

dibû. Her devereke ji devera din pîstir bû. Neyarê bi sedan sal *tûran*, bi hovîtiya xwe li zindana Amedê, careke din zarokên niştîmana me, xistibû bin zilm û şikence xwe.

Belê zaroyên vê niştîmanê, xortên me yên hêja bi saxî xistibûne tîrbekê. Lê, helbet zaroyên Kawa, li hevberî dijminê xwe, destgîrêdayî namînin û di roja 21'ê Adarê 1982'yê de, Kawayê hevdemî Mazlûm DOĞAN û roja 17 Gulan 1982'yê jî Ferhad KURTAY û sê lehengên din (Eşref ANYIK, Mahmûd ZENGİN û Necmî ONER), ji bo ro-

...rojîya mirinê,
ew kirin kulmeke ji
polayê. Û ev kulma ji
pola roja 1 lîlon 1983'yi
de, bi hêzeke jidiyayî
li nav çavê zordariyê
peqiya. Zordarî mîna
cendekê ziyayê heftserî
hilweşiya. Û zindanî
mil li mil, cejna
xwe ya ciwan
piroz kirin.

nahîkirina xaka niştîmana xwe, tarîbûnê ji zindanê çirandin û canê xwe fîdayê niştîman kirin.

Esat Oktay dît ku, ronahiyeka wilo, sibe roj dikare bibe heviyê mezin ji zaroyên vê niştîmanî re. Har bû û hovîtiya xwe bêhtir kir. Li ser bêhtir kirina zilm û şikencê, roja 14 Tîrmeh 1982'ê, bi şehîdbûna rêber û pêşengên rêzdar Kemal PİR, M. Hayrî DURMUŞ, Akîf YILMAZ û Alî ÇİÇEK, zindanî dest dane hev û dest bi rojiya mirinê kirin. Vê rojiya mirinê, ew kirin kulmeke ji polayê. Û ev kulma ji pola roja 1 lîlon 1983'yi de, bi hêzeke jidiyayî li nav çavê zordariyê peqiya. Zordarî mîna cendekê ziyayê heftserî hilweşiya. Û zindanî mil li mil, cejna xwe ya ciwan piroz kirin. ■

Ji tirkî wergerîn: **G. Çiyan**

Nivîsar: Pêşgotina pirtûka "DORTLERIN GEÇESİ / ŞEVA ÇAR LEHANGAN"

Navên Kurdî

A. Dîkîlî

Kurdên nêzî hin netewên din dijîn, ji xwe re nekirine rê ku navên Kurdî li xwe deynin; piranî navên der û dorên xwe girtine. Bervî, Kurdên li nav çiya û belgên xwe mane, xwe piranî bi navên Kurdî xemilandine. Piştî Islamiyê navên gelek netewên rojhilata navîn, bêtir ji yên bûne misilman, xwe bi navên erebî guhertine û demek hatiye ku, di pêvajokê de navên ew netewên xwe bi tevayî kêr kirine û hebûna wan bi tunebûna wan bûye yek. Kurd, anegora çandîya berz û pêş, dîsa jî, ji vê binketina navên erebî nikaribûye xwe biparêze û bi awayekî dijwar bûye neteweke "navereb" yan jî "erebnav", weka "navîslam" û "îslamnav". Beşeke pir piçûk bi navên Kurdî maye, ew jî piranî yan li navîna Kurdistan yan jî ji sinûrên netewên din dûr jiyaye. Yên xwe çêtir karibûne biparêzin, ew Kurd bûne, ku ewên bi girêdayîya bav û kalan (pêşyan) mane, danistana wan jî bi ola îslamê kêr bûye weka ol û çandîya xwe yên kevnare karibûne biparêzin. Hin navên (1) erebî bi banga Kurdî wer hatine guhertin ku mirov bi deng nikare ew navan ji Kurdî bineqîne, ji ber vê jî, piranî Kurd xwe bi wan, mîna ku ew navên Kurdî

bin, zeliqandine. Hin jî dijîvî navên Kurdî (2) yên kevn (û nû jî) bi zanîna ku ew ne yên Kurdî ne, pêk ne anîne, ew navna bê zanîstî ji xwe dûr xistine, şûna wan navên biyanî li xwe xweş anîne (3).

Divê mirov ji cîyekî şûn ve dest pê ke, dêvla navên biyanî yên Kurdî berepêş bixe û bi her awayî dev ji navên Kurdî bemedê. Yên rast ew e ku navên gelek ji me wê biyanî bimînin, lê divê yên dahatû ne wek yên me bin. Divê em Kurd navên Kurdî li zarûkên xwe bikin. Zarûkên me hatina welatê me ne; tu mafê me nîne ku em wan ji navên kalanên wan bê par bihêlin. Navên biyanî li Kurdan xweş nayên, ew bi navên Kurdî xweş dixemilin. Divê em xwe, ji bo wê roja bilind, ku tê de em jî "xwedî tacekî" bibin, amade bikin. Ji îro pêve ne ji sibê, divê dest pê bê kirin bi amadebûna rojên xwedî welat û dewlet bûnê. Pêşiyên me ew qas jî xwastine, lê dîsa nikaribûne me li gor rewşeke wisa bigîjin, divê em bikaribin, bi kêmayî navên zarûkên xwe yên xweş û rind bi bilindî û xweşîya ziman û çandîya xwe ango bi Kurdî û Kurdayetiya şêrîn dilxweş bikin. Ev tişt pêwîstî bi karê mezîna tîne. Divê em hemû navên Kurdî û navên ku Kurd li xwe dikin bi-

civînin hev, paşê wan ji hev bineqînin ta bigîjin zelaliyekê. Dibe ku em nikaribin hemû navan zelal bikin yan jî em nikaribin hemû navên Kurdî bidin cîyê navên biyanî, lê emê bikaribin kêr zêde demek ji bo navlixweşdîtina gelek kesên Kurd bi navên Kurdî dilberz bikin. Navên kurdî gelek zêde ne, wisa ku mirov bi jimartina wan bê hêz dikeve; ji ber ku di zimanê Kurdî de pir tişt dibin nav. Navên giya, kulîlk, lawir, çiya, cî, tişt Kurd li xwe dikin. Wekî din zimanê Kurdî bi awayê nav afirandin (4) jî gelek pêş ve ye. Piranî daçekên (pêşek / paşek) Kurdî bi gotinên din dibin nav, wekî ku gelek lêker di dema niha yan jî buhurî bi navên hin tiştên ba hev nava sazdkin. Li gor van formên gelek nav dikarin bîna afirandinê (5).

Nav di zimanên Îraniyan (6) de bi awayên rêziman, navlêkirin ji bo ku tişt ji hev bêne cudakirin û kaniyên ku jê derhatine bê berçavkirin tê lêkirin (7). Navdanin cûre cûre pêk te (8). Kurd navên bangê (dengdanê) li xwe dikin, wekî din li her perçên welatê xwe li gor zagona dijîmanan paşnav li wan tê kirin (9). Navên Kurdî mirov dikare weka paşnav jî pêk bîne. Gelek nav weka cînav (leq-

ab) ji bo gelek kesên jiyane tîn pêk anîn. Navên hin huner û karan jî mirov dikare pêk bîne (10). Gelek nav hene mirov li mirovan dike lê dikare ji bo lawirên gedî û weka dijûn jî pêk bîne (11). (Kurd, gelek navên biyanî, piranî yên fi-leyî li lawirên xwe dikin. Bawer im, ev hînbûneke olî ye. Ji ber ku gelek kesên Ewropî jî navên îslamî li lawirên xwe dikin, sedemên van tiştan nakeve nav armanca vê xebatê.)

Di xebata navan de Kurd kêmkê pêş ve çûne. Dîjbivî jî gelek zêde navên Kurdî yên gelerî hene. Divê bi kêmayî ev bîna (e) civandin û li ser bê xebatkirin ta mirov bigije zelaliyekê. Ya xweş ew e ku, vê dawiyê çend pirtûkên (12) navan derçûne, lê mixabin bi gelek kêmasiyan. Divê rojê pêş bi xebatên xurt ev kêmasî kêmkê bibin. Di xebata navan de wezîfeyê mezîna dikeve ser ew kesna ku di vî warî de bi metodên zanistî dixebitin. Xebata navan ne tenê civandina wan e, lê divê li ser kûr û dûr jî bê sekinîn, ka nav ji ku derê tîn, mana wan çî ye, ji çî deng û gotinan gihîştine hev, çî qas kevn in ûwd... Pirtûkên amade ne, xwe bi civandin û hin mana nivîsîna navan tîr ditîne, bi hîlbijartina navan jî serên xwe pir ne eşandine; piranî navên erebî ku bi dengên Kurdî bûne, di nav navên Kurdî de mane. Ji aliyê din jî gelek kêmkê nav di van pirtûkan de hene. Hemû nav bi hev re nagîjin pênc hezarî jî. Bi bawerîya min navên Kurdî jî pênc hezarî gelek zêdetir in (13). Divê em navên Kurdî jî yên din baş bineqînin û bîngeha wan derxînin. Dibe ku bîngeha hin navna ne tenê Kurdî bin, lê îranî (arî) bin, ew nayê wê manê ku em ew navna jî bineqînin. Navên îranî (arî) ne tenê yên eceman [farisan-R] e, yên hemû îraniyan (arîyan) e. Divê em ji girtin û lixwekirina wan navan xwe nerewînin, ew nav yên me ne jî. Li ser vê bîngehê min gelek navên Kurdî civandiye û gelek jî li anegora zimanê Kurdî afirandiye. Afirandin jî bin serê min û bêrika min derneketine, min jî ziman û çanda Kurd bi alîkariya rîya zanistî ve civandinê pêk aniye. Lê mixabin divê hê li ser demekê bê karkirin ta bigije çarçava çapkirinê. Berî her tiştî ez dixwazim bi pêşgotinekê bê ku ez kûr û dûr li ser bixebitim û bigijînim zelaliyê tewa, weka pirtûkê normal ya navan biweşînim. Lê ji aliyê din jî dixwazim xebata li ser navan bidomînim. Ta vêga nêzî 18 ta 20 hezar nav civiyane, lê divê ji bo çapa normal jî hê ser lê bê eşandin. Hêviya min ew e ku, bi van navan alîkariyê gelek piçûk pêşkêşî netewa Kurd bikim, daku zarûkên Kurd nebêjin navên Kurdî kêmkê in, da ku dê û bav ji xwe re dev-

xapokiyên nebînin, nebêjin navên Kurdî tunebûne ji ber vî yekî ew navên biyanî li zarûkên xwe kirine. Zarûkên me kulfîkên me ne, divê mirov kulfîkên xwe neke rê ji navên biyanî re. Ger ew ji me nav negrin, li navên biyanî germ bin, wê li ziman û çandî jî zor germ bin. Nav berî her tiştî mirov dixê rêzekê. Mirovên hev nû dinasin berî her tiştî navên hev dipirsîn, dixwazîn mana navên hev bizanibin. Navên biyanî li dil û zimanê Kurdî xweş nayên. Em piranî nizanin mana wan jî çî ye.

1/ Binêre: Xecê, Zilxa, Delal, Zeyneb, Mam/Memo, Fexrî, Feqî ûwd...

2/ Binêre: Berîn, Berna, Berçem, Perçîn, Pervîn, Nermîn, Sêvcan, Gulcan, Gulşen, Guldân, Ebrû, Ferhat, Serdar, Serwer, Rûşen, Bulend, Bala(m), Comerd, Mervan ûwd.

3/ Ew rewş xwe dema paşîn bi lez diguhurînê.

4/ Di Kurdî de nav bi pir awayan tîn afirandin. Kurd pir caran bê ku baş bizanibin mana wan çî ye nava afirandinê, lê bi derbasbûna wext, ger ew nav çî girtîbe, manekê jê re peyda bûye. Ev nav navên gelerî ne. Wekok: Bêrîvan (Bêrîvan/Bê-rî-v-an/Bê-rîvan). Mana vî navî ne tenê Bêrîvan e. "-van" piranî çî û babet û jiwêbûn şanî dide. Babetê "-van" ne ji bo "nêr" e, piranî jî bo "mêr" e: golikvan, şivan, nêçirvan, dilovan (ji bo "nêr" dilêvin), masîvan, lotikvan ûwd. Ji bo "nêr" jî devla"-van" "-vin" pêk bê bêtir ciyê xwe digre: Bêrîvîn, dilvîn, mêrvîn, lotikvîn, nêçirvîn ûwd. Lê ya rastîn ew e ku mirov navên kevnare destpêk ji aliyê gel çewa hatibe bikaranîn wilo jî bihêle.

5/ Weka: Rûken (rû-ken), rûşen (rû-şen/rû-şên), robîn (ro-bîn/roj-bîn), rohat (ro-hat/roj-hat), gulreng (gul-reng), bêmal (bê-mal), perçîn (per-çîn), pervîn (per-vîn), berna (ber-na), gulfer (gul-fer), serdar (ser-dar), Tacdîn (tac-dîn/taj-dîn), gulfizar (gul-fî-zar), guldân (gul-dan), mîrza (mîr-za), porsor (por-sor), dilpak (dil-pak), gulpembe (gul-pembe), dilber (dil-ber) ûwd...

6/ Weka ku JUSTI dide xuyakirin di zimanên Hindî, Yewnanî, Cermenî, Silawî û Keltî de jî afirandina navan bi vî awayî pêk tîn. (Bn. F. Justî, Iranisches Namen buch, Marburg 1895, S. VII)

7/ Herweha ne tenê zimanê Hind û Iranî lê hin zimann din jî (wekok: îbranî) bi van sedeman û forman pêk tîn (bwj.)

8/ Li gor JUSTI 6 cûre navlêkirin hene: A: Xitab (dengdan), Laqab (navê alîkarî),

'Alamah (navê hêjayî, şereffî), B: Kunyah C: 'Alam (navê rastî), Ç: Navê ku mirov jê tê, weka kurê besê yan jî M. M. Barzanî: ji berzan uwd...) D: Laqab yan nisbeh (navçî; navê warê ku mirov jê tê) wekok Meleyê Cizirî (Mele ku ji Cizirê ye), Şêx Seidê Pîranê. E: Navê şan û şereffî yan jî hûnerî: şah, serdar, serbaz, hesinkar ûwd.

9/ Li bakurê Kurdistan zagona tirka derbas dibe. Tirk gelek navên nijadperest li-kurd dikin, weka: Ozturk, Asilturk, Turkkan, Altunturk, Turkoglu, Kurtoglu, Turksever, Turkyurdu, Ozkan, Asilkan, Vatan, Ulus(u), Bayrak, Ozbayrak, Ozsancak, Kahraman ûwd. Li perçên din piranî navê bavan dibe paşnav.

10/ Şivan Perwer, Cigerxwîn, Dilbîrîn, Brîndar, Dilxwîn, Dilgeş, Cigerpare, Pîremend, Bêkes, Bêmal, ûhw. dikarin ciyê navan bigirin û bibin navên hûnermendî.

11/ Weka: gûxwar, gûlawgû (gûyê lawê gû), pozbilind, zûreker (Seyid Rîza ji tirkan re gotiye, yanî: derewker), bozo, simbêlboq, rûreş, rêgû, bîngû, dilreş, kambax, malxirab, sixur (Kurd ve gotine piranî jî dijminên xwe re dibêjin), fisek, zikfîs, ûwd.

12/ Pirtûkên navan bi tipên latînî gelek nû ne. Kurdên di bin destên ereb û eceman di vî warî de bêtir xebat kirine. Yên bi latînî ev in: Ahmet Tîgrîs, Navên Kurdî/A.Balî, Navên Kurdî-1990, Fexredîn, Gulbijêreke Navên Kurdî-1990.

13/ Gelek navên Kurdî hene ku ji aliyê kurdan kêmkê tîn xebitandin, piranî jî van navan ji aliyê tirkan tîn danîn, weke: Berna, Ebrû, Perçîn, Berîn, Ahû, Gulfizar, Gulşen, Gul, Gulnaz, zêrîn, Serdar, Perçem, Berçem, Berham, (Behram) Perwîn, Şîlan, Gulbehar, Nermîn, Nerîman, Comerd, Hanî, Candan, Gurgîn, Gulçîn, Guzin, ûwd.

TÊBÎNÎ

Weke tîte zanîn, eger çî daxwazek jî hêla nivîsevan nehatibe kirin, mafê ser-rastkirina nivîsaran, yê ser-nivîsarîya Kovarê ye. Em dikarin li ser daxwazyê, nivîsarê bîyî guherînek jî biweşînin. Her wisan, ev nayê wê wateyê, ku em di warê diyardanên rêzimanî de, weke li nivîsarê di-hizîrin. ▲

ZEWNCEY ZERENCO

Yew zemon di, yew şariston di, yew cenî û mêrde benî. Mêrdey cenêki seydar o û seyde zerencoza zî zaf hes keno. Labelê, zerencê yê çinî yî. Wazeno xî rî yew zewncey zerenco nê seydi bierîno. Hergû roc wexto ki şono çarşu, çimonê xwi çarneno ki cay çido hêşkwete peyda biko. Rocê raştê yew zewncdey zerenco zaf hewlo yeno. Wendişê zerenco zerrey yê xereqna, cadi zerenco erînenî û qefesî gêno keyewo ti kora yî. Hema nêreseno keye veyndey cenêrdey xwi dono vono:

- Cenêki, cenêki hele bewnî teber, mi yew zewncey zerenco girewta, çira çiyê onasarên cay çinî yî.

Cenêki yena teber, ewnêna zerenco ra û murizê xwi tirş kena, mêrdedê xwi parsena vona:

- Inê zerencê to dik î ya zî marî yî?

Mêrdek vono:

- Cenêki, yew dik o û yew zî marî ya.

Cenêki murizê xwi bineyna tirş kena, çarey xwi çiqirna û vono:

- Mêrdek, ez zrenc bo zî, in keye di to ra vêşêr neyr nêwazano. Çimki mi rî nomheronm hesebêno. Ti zonî, ez ponc wextî nimac keno, roce gêno û xeyrxeyratê xwi vila keno. Ez adirdê cehnimî ra tarseno mêrdek. Ti gonî inê zerenco berî, apey bidî wayirdê yinî.

Mêrdek mat moneno. Nomheromey zerenci newe pey hesêno. Cenêrdey xwi ra vono:

Cenêki, nomheromey zerenci çî ya? Zerenco bêzar û bêzon ku to rî çî zirarê yê bibo?

Cenêki dest bide kena, mêrdedê xwi rî wezo dona û nomheromeydey zerenci ser o hizar melqatiko têsere kena. Ya ki peynîyey qalondê xwi ona, mêrdek pitê xwi nêkeno, hema qefesî gêno û şono çarşu.

Zerenco beno apey dono lablê kuley zerenco pîzedê mêrdek ra nêvecêna. Xwi het vono "zerenco nomherom, willay in gurîy miyon di yew gure esto."

Ay beyntar di yew deme şono, rocê mêrdek vono:

- Cenêki yew gurey mi veciya ez şono filon şaristo û ez hetonî des-poncê rocî nîno keye. Dim a gurey xwi veyneno keye ra teber kuweno.

Mêrdek cenêrdey xwi ra ona vono lablê karê yê cayekî zî çinî yo. Wazeno cenêrey xwi bicerebno.

Beno nemeşewî, mêrdek ageyreno yeno keye û nimitikî şono zere, çî veyno rind o? Cenêki û birakê xwi têvera kewtî ew boqboqey yinî a. Mêrdek wexto ki yinî ay hal di veyneno meselay zerencdê feqîrî rind fehm keno. Tiral xwi gêno rageyreno. Şono yew şaristono zaf durî û hînî weyra moneno.

Rocona yew roc, şono teber ewnêno yew kermatay mêrdimo, gezî girewtî dekewtî çarşuy ruwenî. Mêrdek ay rutoxon ra yewî parseno vono:

- Qey xeyr o, şima se kenî?

Rutox vono:

Şexulîslamê şaristondê ma emir dawo vato: "Çarşu di mijorî, kermî û sewbîna zaf kehlûqato wîrdêkî estî ki binê payon di konenî û mirenî. Û vato ecrê inêno pêrin meştî ma ra wazêno." Ayay ser o ma inêno oncenî pêser ki wa binê payon di nêmonî.

Mêrdek ecêb moneno lablê vengê xwi nêkeno dono piro şono.

Yew deme re pey rocê ewnêno kizîrî kewtî şaristonî miyo kizîr veyndonî vonî.

- Xizênay padîşah abiya, kom dizdo ca ko, padîşa yew mizgîna zaf pîl dono bide.

Mêrdek çaxo ki kizîro goştareno cadi rutuşê çarşuy û meselay zerenco yena yê vîrî. Pîyzedê xwi di vono: "Willay dizdê padîşay şexulîslam o."

Çend rocî ay beyntar di vêreno qali tepîştîşê dizdon ra nêvecêna, mêrdek qerar dono, şono koşkdey padîşay. Eskerondê verdê berî ra vono: "Ez wazeno veciyo huzirdê padîşay komî akarda." Hema yê gêni benî huzirdê padîşay.

Padîşa vono:

- Vacî ma veynî komî xizênay mi akarda? Ez fermonê yê veco wa serey ay zindîqê derkî.

Mêrdek vono:

- Padîşay mi dizdê xizênadey to şexulîslam o.

Padîşa cadê xwi ra hol beno û barreno vono:

- Inê deluy barzê zindo, senêwa şexulîslamdê mi ra vono dizd.

Mêrdek padîşay di lebêno vono:

- Ti çend seetî mewlet bidî mi eke mi xizênay to key şexulîslam ra nêvetî, ti serey mi pirodî.

Padîşa vono: "Wa bo."

Dim a emir dono wezîrdê xwi vono: "Eskero bigîr şo keydê şexulîslam ra bigeyr!"

Yê şonî, e şexulîslam suzdî ser o ronîştî dizbînî yê destî di ha zikir keno. Şexulîslam wexto ki wezîr û eskero veyneno şaş moneno, parseno vono:

- Şima çî wazenî?

Wezîr vono:

- Ino mêrdim vono to xizênay padîşay akarda, ayay ser o zî ma gonî keydê to ra bigeyrî.

Şexulîslam hêrs beno, xwi inata-ata dono lablê eskerî dest bi keye geyrîştî kenî. Geyrenî, geyrenî lablê çî nêveynenî. Şexulîslam wezîrî ra vono:

- Mi şima ra nêva ino nege keno mi, gonî şima serrey inê tull biki.

Hema qali fekdê şexulîslamî di nêqediyaya, mêrdek ti ra vono:

- Ti hele ay suzdî ser a wardî pay!

Senê mêrdek ona vono, rengê şexulîslamî bedelêno, leşey yê recefêna lablê hewna zî vono:

- Ez suzdî ser o zikir keno, ti suzdî pey se kenî?

Mêrdek vono:

- Wardî, wardî!

Şexulîslam mecbur moneno wardeno. Mêrdek suzdî hewe nono, bindê suzdî di yew qapax vecêno. Qapaxî hewe nono, yew nardunî şono diwar. Mêrdek nardunî ro şono diwar, ewnêno xizênay padîşay pêrû ha weyra ya. Veyndey wezîrî dono vono:

- Şexulîslamî tepşê wa nêremo! Xizêna ha wita ya. Xizêna gêni benî padîşay rî. Padîşa eceb maneno, emir dono vono:

- Ay comerdî mi rî biyarê!

Mêrdek şono, padîşa vono:

- Mi rî vacî to senêwa zona ki xizênay mi şexulîslamî barda?

Mêrdek padîşay rî meselay xwi no cenêrdey xwi û rutîşê çarşuy şexulîslamî varmî ra hetonî peynî vono. Padîşa yew mizgîna zaf rindî dono bide û mêrdek şono keydê xwi.

Arêkerdîş: Ma na estaniki hezey vatîşdê yew Pîranîjî nuşt.

KURDISTAN**E. DILZAR**

Kurdistan ciwan î êcgar şîrîn î
Bêşik beheştî ser rûy zemin î
Xudan xilman û horî nexşîn î
Dayim razawê û ciwan û rengîn î
...hewênî jîn î

Seranser şax û bax û gulzar î
Pir le sulav û kanî û rûbar î
Lane û helaney qumrî û huzar î
Nexşawî destî perwerdîgar î
...bûkî behar î

Daykî dilnêrmî roley kurdan î
Laney şêranî Zend û Baban î
Xakî kurmanc û zaza û soran î
Rewgew hewargew lor û goran î
...cê Erdelan î

YEKBÛNÎ KURDAN !

ZAZA KURMANC Û SORAN
LOR Û KELHOR Û GORAN
HER ŞEŞ BE DEST Û BIRD IN
BIRBIRÊY PIŞTI KURD IN

GER YEKDIL BIN EMANE
HEMÛ BELAY ZEMANE
ZORKARANÎ SER ZEWÎ
SERMAN PÊ NAKIN NEWÎ

BULBUL...

Bulbul, bulbul
Le naw gulzar
Eto bo gul
Ez bo nazdar
Bigrin be zar
Bigrin be kul
Ez li jêr dar
Tu li ser çil
Tu be dendûk û
Ez be dem
Bigrin birêjin aşkî çem

Bulbul, bulbul
Bigrin be kul
Dindûk biçûk
Bulbulî ciwan
Ey êsik sük
Ey nexmexwan,
tu bi Yezdan
Be nexmey xoş
Dilî bîryan
Bihêne çoş
Tu bebal û ez be xeyal
Defirîn be ser gulzar û xal
Defirîn degirîn esrîn nasrîn...

Bo kovara REWŞENê xoştîvî dîyarî û
pêşkêş e... Stockholm / 6 5 1991

DEVIREY TO

Na deyîrey to ya
Rojo rojên ra.
Şew û roj,
Wext û bêwext
To va:
Serê Pîranî bi keyek î
Binê Pîranî bi keyek î
Esker yeno lek bi lek î

Vengê to biriya,
Dicle berma,
Ferat şermaya.
Ararafi xo xemelna
Beyntardê di metrîsan di kişiya.
Dêrm bi volqan
Veşa,
veşa,
veşa...

Deyîrêy to tîya di qediyay
Roj giyra
Va fetesiya
Asmên teqa
Vilkî pulusay
Lemî kelemay
Koyî zirray
Kerey varay
Qesbay to
çizzay,
çizzay,
çizzay...

Yew deyîri omey to vîrî
Deyîrey lacekdê Lukanya.
Mêrdimey; marda
Mêrdim; pûş û palaxî
Namûsê azadî panc pere
çax xayîn bi.
Dîna cadê xo di vinderta
Felsefe bêwayir
Mezgdê homayan di zelzele
Meryemi zacilan bî.
Yew keyneka bawkula
namey jay; azadî
Spartakuso bengî
namey jey; kole.
Kole bi hezey to
labelê di hinzar serrî ra ver
kole bi
labelê kole nêmar.

Duri ra, zaf duri ra
Apê Ho ra,
Xal Gandî ra,
Çe ra,
dafîza çe ra

veng ame.
To goş na ser
zerrey to helliyay.
Dardê sarî zî bi
şar zî pelşikteiqendîqerefaye,
bindê payan di mende bî.

Çendeyî zeman
şî ay beyntar dî?
Ez vaca "des"
ti vaci "vist serrî"
To veriki di lacî-keyney bî
girdî
to veriki di zanayîş,
to veriki di sînayîş,
to veriki di bêrî,
to veriki di canmêrdey,
to veriki di riki,
to veriki di kin
û pêynîya peynî
to veriki di lej bi gird
lej,
lej,
lej...

To û lejî
lejî û koyo
koyo û egîto
egîto û şarî
şarî û "serîhildan"
serîhildan û hêvî
hes kerd yewbînan ra.

To rîyê xo tada mêrdimey
û to va:
Ez na deyîri
Bagok di,
Gebar di,
ez na deyîri
zindanan di,
kendir qiriki di,
ez na deyîri
qelbdê şarîstanan di,
ez na deyîri
wertedê adîrî di
gondey xo reyra nuseno.
Rica keno me vajê!
Çirî?
Şîma pêrû hezey îmandê xo
zanî
"Awkî hetanî lêlî nêba zengi
nêbena."

J. E.
Payîz 1990

Sê bira û bavekî wan ji hebû, bavê wan li ber mirinê, gazî kurêd xwe kir, gava ewna diyar bûn, ji wan re got:

- Lawino ji we hersêkan, yek pîc e. Dema hûn ji hev cihê dibin, parê kala xwe nedin yê pîc. Pîçek neçû, bavê wan cihan gewir kir, piştî nîrek bihor û bi şûn ve, her sê bira li hev cihêbûn xwestin. Lê bi penda bavê wan, gerek bû parê nedin yekî. Her sê bira li hev şaş bûn, nizanin kîjan pîc e, heya ku parê nedin yê pîc. Li hev civîn û bi hev re peyivîn. Birayê mezin got:

- Werin em herine cem zangonvanekî, zangonvanî yê lim ser me yekî picîtiyê biyaşkirinke.

Gotinêd her sêka bûn yek û tev bi rêketin û çûn, ji bo çûndina cem zangonvanî. Berê xwe dan bajarê Bexdê cem zangonvanîyê wê çaxê, heya guhêzkin yê ji wan pîc kîjan e û karibin penda bavê xwe pêk hûnin. Lê gava wan dukudand, hêr sêya rêçkek dîtin û tev hev tîkoşîn kirin, gava ewna di wê xebatê de, merovek ji nişka ve di ber pozê wan re bi derket. Gava gihêştin cem hev, aşîtxoş li hev dan û bi tendurusta hev pirsîn. Piştî wê hengê, merovê biyanî pirsik ji wan pirs kir got:

- Gelfî birano, deve yê min yê bi bar, ji pişa min teqya bû, ma we nedît ?

Birayê mezin got:

- Libê me dîtiye. Ew bêdûv bû û diranketî bû.

Birayê ortê got:

- Barê wê yalîk hingiv bû û yalîk ji rûn bû.

Birayê biçûk ji got:

- Li ser milê deve jinkek giran avis hebû.

Merovê biyanî got:

- Belê gotin yêd we giştik rast in. Ma we devê min ku ve biriyê, ji min re binin. Yan mirina min yan ji deva min!

Hûn ji ku ve dijenin bijenin!

Her sê bira bi sûndere beziyan, lê wî li wan bawer nekir bi carekê de, wan ji wî re gotin:

- Bira, em dikin herin cem zangonvanî, fermo tu ji bi me re biçe.

Bi mafteqînî wî ji bi wan re kudand. Pir çûn hindik çûn heya gihêştin bajarê Bexdê. Tev hev xwe ajûtin warê zangonvanî. Gava lekê wan gihêşt wê derê, zangonvanî paypîvek da wan, ewna ji birin otaxa meyvanîyê danîştin dan, paşê bi rûkî geş aşîtxoş li hev dan. Piştî wê hengê û bi şûn ve, zangonvanî çû aliyê heramiyê ezbatata xwe ispirand ji bo coşkirina girarekê, heya karibe ji bo meyvanê xwe xwarinek paqij bidexîne û li pişa wan diyarke û

- Rast e.

Yekî ji got:

- Barê xwe yalîk hingiv bû yalîk ji rûn bû.

Dîsa min got:

- Rast e.

Yê sisiyê got:

- Li ser jinkek bi bar giran bû.

Ew ji rast bû. De min got:

- Deveyê min we biriyê ji min re binin. Wan dest bi sûndan kirin û gotin, me nebiriye. Paşê dîsa gotin, em diherin cem zangonvanî, fermo tu ji bi me re biçe. Niha ez bi van re hatim ji bo gilf. Tu yê van tîkolînke, heya ku ez bawer kim nebiriye.

Berî xwarin li nav wan diyar be, zangonvanî tîkolîn ji wan re vekir. Destpêk ji birayê mezing pirs kir û got:

- Te çawa zanî bû barê devê hingiv û rûn bû ?

Wî got:

- Di hîza deve re ronak bû, mêş li alîkî vedinîştin û li yê din ji venedinîştin. Yê venîştî hingiv bû, yê venenîştî ji rûn bû.

Zangonvanî bi rastî bawer kir, ew berda. Ji yê ortê pirs kir û got:

- Te çawa zanîbû deve vêdûv bû, diranketî bû ?

Wî got:

- Di hêzêr e ronak bû, buşkil komketî bûn ne bela bûn. Ger bela ba bi dûv bû. Diran ketina deve ji, di çêriya wî re ronak bû. Ger çawûr hulis kiriba, bi diran bû, lê hulis nekiribû. Min di we re zanî bû ku vêdiran bû. Zangonvanî, ji wî ji bawer kir. Paşê ji yê biçûk ji pirs kir û got:

- Te çawa zanî bû sîwarê deve jinkek avis bû ?

Wî got:

- Di hîza wê rê ronak bû. Deve existîbû ber çem ji bo piçek aramîyê. Di ber çemre nefel û çawûr bû. Ji wê de



ruyê xwe sipî veke. Paşê zivîrî cem meyvanan, ji wan pirs kir û got:

- Xweda xoşiya we bide, hûn ji bo çi hatine vir? Hûnê ji min re bêjin, destpêkê xwediyê devê ji zangonvanî re axift û got:

- Devekî min bi bar hebû, li pişa min teqiya. Ez bi dû ketim, lê min rêçik şaş kir, lê bes min di rêya xwe re kudand, heya ez gihêştim van xortina. Min ji wan pirs kir; "we deveyê min nedît ?" yekî got:

- Min dît dûvqut bû û diranketî bû,

Min got:

desmalek ketibû. Min desmal rakir bina xuya pîreka jê dihat. Min di wê re zanibû ku siwarê deve jin bû. Avisiya wê jî, di çawirê re ronak bû. Wê xwe dabû ser yalîkî û rabûbû.

Zangonvanî ji wî jî bawer kir. Paşê bi xwediyê deve re got:

- Van deveyê te ne biriyê! Here li deveyê xwe biger.

Piştî wê hingê, zangonvanî xwarinek ji wan diyar kir. Paşê wan dest bi xwarinê kirin. Gava dixwarin, birayê mezin got:

- Zangonvanî ne ji piştî bavê xwe ye.

Birayê ortê got:

- Ev goşt, goştê sega ye.

Birayê biçûk got:

- Ev girara dukela xwe ji teneyê ser miriya ye.

Lê zangonvanî gûhadri ser payiva wan bû. Piştî çend gava şûn ve, zangonvanî li ba wan amade bû, ji wan re got:

- We çî dipeyivî hûnê ji min re tek bi tek bêjin. Bi dillîrî ne bi tirs.

Ji birayê mezin pirs kir û got:

- Te çawa zanî bû ez ne ji piştî bavê xwe me?

Wî bersiv da û got:

- Ger deya te sax e tu yê herê bine û were, heya ku bersiv bi cih be.

Zangonvanî mîna birûska deya xwe amade kir û ji wê re got:

- Ev merov ji min re dibêje tu ne ji piştî bavê xwe ye. Ma rast e lê ne rast e tu yê ji min re biyaşkirinke. Ger tu nebêje serê we herduya wê here. Wê got:

- Rast e, bavê te zaroyê wî ne di bûn. Min ruyê xwe bi rênçberê malê re reş dikir. Heya ku xweda tu peyda kir. Meyvan jî got:

- Te bi me re rûnenişt û nan ne-xwar. Rûniştin li ser te pêwîst bû. Di wê re min te anî der. Paşê ji birayê ortê pirs kir û got:

- Te çawa zanibû ku ev goşt, goştê sega ye?

Wî got:

- Goştê sega tîrşîk e, xwarina vî goştî jî tîrşîk e. Min di wê re bû zanibû.

Xwediyê berxikê jî got:

- Rast e, berxik, me bi şîrê dêlikê xwedî kir. Ger ne şîrê wê ba mezin ne dibû. Ew jî rast ve hat. Paşê vegeyriya ser yê biçûk û wê re got:

- Te çawa zanibû ev dukel ji teneyê ser goristanê ye?

Ew lê vegeyriya û jê re got:

- Gava merov girarê dixwe, ji hev di-keve, sist dibe. Di wê re min zanibû.

Zangonvanî cotyar anî û ji wî pirs kir û got:

- Ma rast e dukelê te ji me re ava kiriye û aniye ji teneyê ser yê goristanê ye?

Cotyar got:

- Rast e wilo ye. Gotinêd hersê biran rast vebatîn, ne derew bûn. Paşê zangonvanî ji wan re got:

- De fermo ji min re doza xwe bêjin?

Birayê mezin got:

- Bavê min ji ber mirinê pendik bo me axift û got:

- Yek ji we pîc e parê malê medin yê pîc. Em jî nizanin kîjan ji me pîc e, heya ku em karibin parê nedine wî.

Hişê zangonvanî li hev ket. Di ber bersivê de ma. Nikarî bû bersiv bidana. Lê keça zangonvanî, guhdariya ser giştî bû. Hema bi lez gazî bavê xwe kir û jê re got:

- Wan ji min re bişîn ezê wan tîkolînkim. Ewna jê re şandin. Lê kej zor çeleng û şox û şepal bû. Gazî birayê mezin kir û jê re got:

- Tu yê here ser goma bavê xwe vede û ji min re dil û kezeba wî bine were! Paşê ez 'ê te tu yê min...

Wî got:

- Wilo nabe. Bavê min ez hejandim û nijandim û xwedî kirim, heya em wilo bûn.

Paşê yê ortê tîkolîn kir, wî jî wek birayê mezin bersiva xwe dabû. Kejê gazî yê biçûk kir û tîkolîn jê re jî vekir.

Wî jê re got:

- Ezê wilo bikim û ji te re binim.

Bi vî awayî kejê yê pîc derxist û ji wan re got:

- Birayê we yê biçûk pîc e. Birayê biçûk, hema ji wan veqetiya û çû. Birayê wî çiqas gazî kirin venezîvirî.

Jin a diyara û nediyara û guhdara be... Çîroka me ji we re gelek xweş, lê bingeha çîrokê ji xwendevanan re ronak dike ku gelê me kurda, ji bo neyaran gelek baqil û zana ne. Lê ji xwe re kêmhiş û bêraman in. Gerek e em vî xeysetnavî ji ser xwe rakin û em di rêçka rastkeşiyê re bikudînin. Rêçkek, mafê destkewtiyê ji bo gelê me kurda re peydakirin gerek e ew jî ev e; divê çekozi û dexesî, peyivger inî û spiyontîti ezîti û dirawîti, bi carekê de ji nav sincê xwe de bavêjin û nehêlin, heya ku em karibin sincpaqij bin. Û berberiya hev ne kin. Heya em karîbin li mafê xwe bigerin û bibînin, ji nav lepê neyara biderînin.

1 Pûşperê sala 2594 yê 1982

B...

FERHENGOKA NIVÎSARÊ

ARAM : Vehes
AŞTÎXOŞ : Silav

BIYAŞKIRIN : Îspatkirin
BIYANÎ : Xerib
BAWER : Îman
BÊRAMAN : Bêhizir, bêhiş

CÎHANGEWIR : Mirin
CIVÎN : Kombûn
COŞ KIR : Keland

DILLÎRÎ : Cesaret
DIYAR : Xuya, kifş
DEXESÎ : Çavnebarî, hesûdî

ISPIRAND : Weşand

KUD : Rêveçûn, meş
KALA : Mal, mulk
KAWÊŞ : Kawêşa lawirî

PEYVGER : Gellac, fesad

TÎKOLÎN : Tehqîq (investigation)
TENDURUSTÎ : Sihhet

ZAGONVAN : Dadnas, huqûqnas

Xwa lê xoş bû mamosteyî hêja, Abdurrahmanê Şerefkendî meşhûr be Hejar Mukirîyanî, şaêr û wergêr û tuwêjewanî zana û gewreyî kurd le şarî Mehabad, le gereki ser xirê le dayik bûwe.

Zortirî hemûwan beşî tom

Korpeyekî Xirekeyî bawêşî tom

Yekemîn cêyekî lemdana pêm

Kurî xot im bitewêm ya netewêm

Bawî Hejar nawî Mela Mehemed û nawdar be Melayî Bor bûwe, ke yekêk le zanayanî helkeuteyî ser demî xoyî le ders û waneyî eslam îda bûye, Bo hewelîn car, le mêjûyî pir lend û lorî Kurdistan da le gundî Şerefkend (Gundêke lê nêwan Mehabad û Boka da) medrese û dibistanî be kurdî çê kirdûwe û deng û wanekanî eslamî û rêbazî aynî be kurdî fêrî feqê û şagirdekanî kirdûwe.

Abdulrehman serdemî minalî le layen babî zanayî ders û waneyî eslametî û xwênden nûsinî kurd û kurdayetî fêr debê. Belam destî germî bawî be bayî sardî mirdin zû çatêg debê û Mamwesta Mela Mehemed le temenî 65-salî de le salî 1917 koçî duwayî dekat û Hejarî hîvde salan debête xemxuarî xuşk û bira û kalan û gewrepîyawî naw malan.


Hejar bo dabînkirdinî nanî zaroyan kitêb û neşqan rademûsê û deîyanxate ser deleqan û qolî merdaneî piyawneî lê heldema lê û dest deka be karî werzêrî û rizq û rojî le bo sêwîyan le herdî req çê deka û be çên û nêr û amûr û ga û cût aşîna debê û nahêlê mindalan bo nan bindin û xalê Hejarî cutiyar gêreyî le hewşê ber malan ho dedatewe.

Sererayî karî seatî cutbendeîya û werzêrî, hejar carêkî dî xo lê kitêb û defteran heldeqtênê û dêtewe ser bezmekeê caranû dest dekatewe be xuwêndin û xuwêndineweyî şîarî hozanwaneyî gewreyî kurd û fars û le ber we gir û galî dekat.

Kurdistanî ser demî mêr gencî Hejar, birindarî destî derebe gâiyetî pêyî çirî taze joîy kurd debê û le şaerkanî taze çîniy horde borjiwayî kem sermayedarî kurd le geşan neşanda debîn û horey

ŞAIRÎ BE NAWBANGÎ HEJAR KOÇÎ

E. Şerîfî



HEJAR MUKIRYANÎ 1920 - 1991

Wêne: Ji Kovara Sirwe

xoş çirî kurdayetî le çapemenîyekanî kurdî Estambûl da, le nawçeyî Mukirîyan gecelawzeyî pê dekirê û hendê le lawanî rûnakbîrî ser be xorde-borjiway kurdîş le nawçeyî Mehabad ne tenîya stranî kurdayetîyan degot belku laî-yengirîşîyan lê dekird û be hezewebûn horeyekî waş bîstîmû mekoî le bo çêken. Belam dewran dewranî Rezaxanî çekeme req bû, ku wa kurdî Hejar û Hêmin û Bêkes wêray weîy hebû weha

lawkêk serda?

Belam karesatekanî mangî xermananî 1920 textî û bextî be şahî zordan le Taran leq kird û sirweyî bayî azadî engot û Rezaxan bêxan û man mayîyewe û tacî şahî birdî û textî kewte lêyî û derfet bo xorde - borjiwayî ronakbîrî kurdî Mukirîyan hemûwar bû heta gastê kurdayetî biken û Komeleyî Jîyaneweyî Kurdistan - JK çê biken. Her kemêk pêş karesetakanî xermananî

KURD MAMHOSTE DUWAYÎ KIRD

Êran, kurdekanî Kurdistanî Tîrkiye komeleyî Xoybûn (Serxwebûn-R) niyan pêkewe, mabû û e kurdekanî Kurdistanî Eraqîş alayî komeleyî Hîwa'îyan le şaxan deşekawe û mabûwe ser kurdî Êran heta mekoyî neteweyî û kurdayetî le bo xo bigurênin û kaw û sitranî pêda helgon. Ca ew derfeteş rexa û rûnak bîranî kurdî mukirîyanîş le deverê komeleyî JK gird û kobûn û resmen le salî 1922 da JK wek teniya rêxirawî siyasî û ferhengî kurdan, le Kurdisatnî Êran da hate arawe û le pûşperî her ee sale da govarî Niştîman kewte ber destan û çawî Kurdanî û be xo run zendeqî dujminanî pê çû.

Lê hewelên jimareyî niştîman da wutarêki Hejar be wî dimeteqeyikî du kesî belaw bûtewe ke lewda rexmeî le derebeyekanî kurd kirduwe ke bo çî genim û co be dujminî xo defiroşin û kurdî bîrsî nan û gal deken. Em dimeteqeye, eger çî nawî Hejarî le ser niye belam her be şêweyî nûsinî ra dîyar e ke berhemî Hejare û paşan le jimarekenî (3-4) Niştîman de dimeteqeyekî debînin ke nişanderî endameti hejar le JK da nişan dida û le ser nusrawe (a- Hejar 20) ke dîyar e jimareyî 20 jimareyî endamîyeti Hejar e le JK êda û Hejar wek yekêk le nûseranî Niştîman denasêne.

Rêberayeti JK le ser şanî mamwestayî zana û hêja Abdulrehmanî Zebihî debê ke nawî xuwastemenî bijîn meşhûr bûwe û em komeleyî heta salî 1924 û gorararanî Hizbî Demokrati Kurdistan -Êran) û awite bunû çûne palî em hizbe, Komele 8 jimareyî govarî niştîman û çend namîkeyî kurdî çap kirdûwe ke yekêk lewa şîarekanî Hecî Qadirî Koyî ye paş pêk hatinî Hizbî Demokrat û tuwaneweyî JK le hizbe da. Hejar wek yekêk le nûseranî govarî

Kurdistan û helalexebatî edebî û çandî xoy dirêje pê deda û her kêr ser beyî neş da le taran govarêki kurdî-farsî be nawî Kuhestan le layen zanayî dilsoz û niştîmanperwerî kurd Dr. Esmailî Erdelan'ewe der deçê ke hêndê wutar û şîrî Hejarî şî tê da belaw debêtewe. Katê xuda lê xoş bû pêşawa Qazî Mehemed le layen hizbewe debête serkomarî Kurdistan, naznawî şairî millî û netewayeti deda be Hejar û Hêmiî rahmetî û ewan duwan şan be şaniyek xebatî ferhengî û siyasî le komara dirêje pê deden û xizmetêk gewre û giran be bo jan-aneweyî ferheng û edebî kurdî deken.

Paş eweyî ke hêze çekdarekanî rijimî gorkirawî padîşayeti pelamarî komarî Kurdistan deden. Hejarîş wek hezaran kesî dî derbeder û perewazeyî henderan debê û dexewê be Seqiz da xo de Kurdistanî Eraq hawêjê. Belam Hejarî terike best le Seqiz qolbestî eceman debê û berew zindanî Bokan gilîy dedenewe. Belam le naw rêga da darfeti bo buzdexwa û radeka û xo daghênete Kurdisatnî ew dûî penayî hejarane debate be malî Şêx Letîfî kurî xuda lê xoş bû Melik Mehmedî Hefidzadeyî padşayî Kurdistan û maweyek le wên derê deji. Paşan barge û bine têk denê û Bexda bigirew hatin. Hejar Bexda dest deka be kar gelî wek wênegerî û rojname-nûsî û zor şit û çitîr û seyr û senere û serencam be hojn kem dehati û vexûwardinî xwardemenî baş û pêwîst le salî 1948 duçarî nexoşî azare barîke (sil) debê û doktoran le Bexda pêy debêjin zortir le merg niziki heta man. Hejarîş kelepo (wesit) deka û debêje:

*Lawekan gewre kiçan nezaran
Dil be can diltirekan dildaran
De meron tawê bêmenin lêre
Fethaiyki bixwênin Xêce*

*Le nêw em gore Hejar nêjirawe
Zor le rêyî ewe cefayî kişawe
Jînî xoyî kirde fidîxoşî kurd
Le rêyî azadî be makamî mird
To xuda katê ke azadî û rend
Regezî xuwê mîjekanu helqend
Kij û kur her çî belamam la da
Pê belê û payî be qebîrim dada
Ey Hejar be sîyeti mirdin heste
Mujde be mewte neket serbest e*

Belam be pêçewaneyî bir û bawerî pîzîşkekanî Bexda, Hejar namrê û bo kurd û çermeserî firehtir her deji û bo çaresereyî nexoşî hegbeyî nedarî û turbênî hejarî le koldebestê û berew Lubnane dejiwê û le wên derê ber ser naxoşî da zal debê û fikêyî simêlanî de û kalê û pêlawheldebestê û berew Şam (Dimeşq) deliw.

Maweyî du salan le malê Haco Axayî kurperwer dewlemend renîci erxeyanî webin serî denê û (bextî seremer) deçirê û Mam û Zinî xanî be (mukirîyanî) delê û zin û meman ser le noê dejenê tewe û pêşkêşî be baregâi Kurdî soran û mukirîyan dekat heta le çêy lêjî pir bon û berameyî behirmend bin û dostan şad dujminan bebêjin, ku ekirad bê mearîfet in bê esil û bûniy ad. Hejarî oxeyî nedî û paşan destî Haco Axayî rademûsê û berew Misir û yekitîyet Sovîyet dajwê û le Bako hendê kome kurd de dozêtewe û çîroyî Kurdayetîyan bo dejenêtewe û her le wê debête endamî Yekêti Nûseranî Azerbeycan û hendê şîarekanî be nawî Kurd Mexellerî turkî azerî pêşkêş be kurde zîman bestirawekanî ordûgayî rizgarî gelî Kurdistan retan dekat.

Belam serencam eweş ew cêga û Mekoye niye ke Hejar oqreyî têda bigirê û be serbestî tê da bo kurd biçirê:

*Be derbederî yan le malî xom
Le xakî ereb, le Eran û Rom
Kok û poşte bim, rût û recal bim
Koşkimde qat bê wêranemal bim
Aza û rizgar bim, şadan û xendan
Yan zincîr le mil, le sûçî zindan
Sax bim, cihêl bim, bigirim guwê
swanan
Yan zar û nizar le naxoşxanan*

PARASTINA ZIMANÊ KURDÎ JÎ

BIREKE GIRÎNG JI PARASTINA NETEWA KURD E

Hogir Ehmed

Zimanê kurdî, hebûna netewa kurd, ta îro parastîye. Weke têtê zanîn, netewe bi gelek cûreyna têtê parastin. Di dîroka gelê me de, gelek serîhildan û berxwedan afirîne. Gelê me, tu caran stûyê xwe li ber dijminan xwar nekiriye. Her tiştên dijmin, heya bi ol (dîn) jî, bi dil nepejirandiye (qebûl nekiriye). Li dijî dagîrker û împaratoran derketine çîyan, bi kevir û kevkanikan (kevirkani) xwe parastîye û biryar û fermanên dijimanan hilnegirtiye. Huner û xweparastina gelê me jî ji wir têt.

Gelê me dem bi dem, bi berxwedanên bêhempa jiyana xwe domandiye. Di gel wê jî, bi giranî zimanê xwe yê zikmakî heya îro parastîye. Parstina zimanê me, ji bo hebûna gelê me pîrozbahiyeye mezine. Zimanê me, bûye bingeha hebûna netewa me.

Bi rastî, dijiminên netewa kurd, di gelek waran de gihane pêkhanina ar-

mancên xwe. Weke talankirina binax û serax, perçekirin, cudakirin, koçberkirin û komkirina girsên gelê kurd. Gelê me, ta roja îro hebûna xwe bi zimanê xwe parastîye. Ji bona vê yekê mirov dikare bibêje zimanê kurdî ji bo netewa kurd bûye çek, şewq û ronahî. Weke her zimanî, zimanê kurdî jî pêwîstî pêşveçûn û vekolînê ye. Bi ziman heqî û neheqî ji hev têne der. Ziman, evîn û aramê, hesret û hêviyê, zanîn û nezaniyê, başî û nebaşiyê ji hev dertîne. Bingeha jiyana û nişana mirovan, ziman e. Kesên ku li dijî zimanê netewa kurd dardikevin, ew jî taybetiyên mirovahiyê dûr in. Dijderketina zimanê kurdî, ne tenê qedexekirina wî ye. Lê belê, yê ku xwedî li zimanê xwe dernekeve, ew jî bixwazin nexwazin dibin alîkarên wan kes û rejîman. Tu caran parastin û pêşvebirina zimanê me ne bi destê kes û hêzên biyanî ye. Ew nikarin vê xebatê ji me re bikin. Her nijadek, dikare zimanê xwe biparêze û derd û êşan û arama dilê xwe, lorîk û

stranên xwe bîne ziman. Kesên ku bixwazin ji bo hişyarbûn û zanabûna gelê xwe bixebitin, bixwazin xizmeta gelê bikin, pêwîst e zimanê wî gelî fêm bikin. Ger ji gel fêm nekin, nikarin derd û êşa wî gelî jî fêm bikin. Heke ziman tune be mirov nikare şêrîni û tehliyê, şorî û tîrşiyê, tahmî û bêtahmîyê [biçêjbûn û bêçêjbûnê] ji hev derîne. Ji hevderanîna van jî bi kurdî qedexe ye! Dijminê kurdan vê qedexe kiriye. Zagon bi dermafê wê derxistiye. Di cihanê de qedexebûna ziman ne hatiye bihîstin û ne jî dîtin. Tenê ev li Kurdistanê pêk hatiye. Çawa ku têtê gotin "însan ji axaftinê jî hev fam dike û heywan ji bêhnê"... Hovîtiya dagîrkerên li Kurdistanê, di vir de baş têtê fêmkirin.

Li gor zagon û fermanên neyaran, gava mirovê kurd, bi zimanê xwe, armanc û hêviyên di dil de, yan jî gilî û gazincên xwe yên di dil de, bîne ziman, dibe gunehkar! Mîna ku mirovek kuştibe.

Li gor kedxwar û li gor bîr û baweriyên rewşenbîrên wan, kesên ku bi kurdî deng dikin û dinivîsin, hemû *gunehkar* in. Ger ku bi zimanê tirkî yan zimanekî din nizanibin jî, dîsan girîng û pêwîst e bi zimanê kurdî nehaxifin. Ji nivîskarên wan ve bigire û heya "kommunistên" wan, kurd weha mîna "heywanan" dibînin. Mixabin! Neyarên gelê me her tim bi vî çavî li me nêrine jî. Di dîroka mirovahiyê de, pîrî gelan zilm û zordarî dîtine. Lê tu gelî mîna gelê kurd, bi vî awayî qedexekirin nedîtiye. Di van çend mehên dawiyê de, hilanîna zagona qedexekirina zimanê kurdî, karekî gelekî demokratîk dibînin. Zimanê kurdî bûye, destika propoganda wan. Dibêjin: "lorîk, stran, dîlok, helbest û hwd... êdî ne qedexe ne. Lê! Ax û waxa ji destê zilmê! Nivîsîn, çapemenî, û weşandina bi kurdî qedexe ne!" Ev serbestkirina beşekî şerê taybetî ye. Dîsan jî pêwîst e, tu bi destûra dewleta tirk deng bikî û biaxifî. Nabe ku tu ji bo pêkhaknîna armancên gelê xwe û pêşxistina zimanê xwe binivîsî, bixwînî û bihizirî. Zîncir li gelê xwe û pêşxistina zimanê xwe binivîsî, bixwînî û binêrî. Zîncir li zimanê me gerandine û kilit kirine.

Xwendevanên hêja, mebesta min ji vê nivîsarê ne tenê dijîtiya kedxwaran e, ku bi her awayî li dijî zimanê me disekin û dixwazin wî tune bikin. Lê mixabin, mirovê me vê yekê tenê di teoriya

xwe de dizane. Di karvaniyê de pêknahêne. Kama (meqseda/mebesta) min ew e ku hinek rexneyên dostaniyê li wan bikim. Ez dikarim bibêjim, ev rexneyên min piranî li rewşenbîrên kurd in. Ev rexneyên min ên dostaniyê li dilsoz, şoreşger, nivîsevan û ramyarvanên Kurdistanê ne. Gumana min ji welatparêzî û dilsoziya wan tune ye.

Dibêjin em welatparêz in, şoreşger û nivîskar in, lê di axaftina xwe ya rojenîn de, di civîn û bangeşîya xwe de bi edebiyata tirkî, erebî û farisî deng dikin. Bi wan zimanan mijûl dibin, bi wan zimanan doza zimanê kurdî dikin. Dibêjin, axaftina bi zimanê kurdî ne girîng e û dijar (zehmet) e. Ez dibêjim; dijin, *negirîngiya* zimanê kurdî (!) xistiye mîjîyê me de. Dîtina zahmetiya wê jî, xizmate netewa me nake.

Gelo, axaftina bi zimanê kurdî, ji tekoşîna çekdarî, ji şikence û stemkariya dijin zor û diwartir e?! Na, kes nikare bêje diwartir e. Gelek nivîskar û hozanvanên kurd, ni-karin rewşa Kurdistanê di nîvisîn û axaftina bi kurdî de binine ziman. Ger binine ziman jî, bêtehm dikin û diherimîn. Nikarin li ser hev û din, çar gotnan rêz bikin. Di mîjîyê xwe de, bi tirkî erebî û farisî difikirin û paşê dixwazin bi kurdî binine ziman! Bi wan zimanan derînin, bi kurdî bibêjin! Bi wan zimanan gotinan çêdikin bi kurdî distirên! Bi wan zimanan zimanê kurdî diparêzin! Ji lew re tu xweşiyê di vî zimanî de nahêlin. Bi ser vê yekê de jî, dibêjin "zimanê kurdî gelekî paş de maye. Ne zimanekî nûjen e. Ne yê politîkê ye. Mirov nikare bi kurdî tişteki bîne ziman..." (!)

Bi rastî eger mirovê kurd nikaribe tiştê di dilê xwe de bi kurdî bîne ziman, wê demê nikare derd, êş û kederên gelê xwe jî bîne ziman. Heke em ji bo gelê xwe bihizirin, binivîsin û tîbikoşin, berî her tiştî, pêwîst e em zimanê xwe jî bo pêşveçûna xebatê bingeh bibînin. Pêwîst e em bi zimanê xwe bistirên, binivîsin, di nava malê de pê deng bikin... Û di jiyane de bi kar binin.

Bi giranî girsên gelê me, zarokên xwe hînî tirkî, erebî û farisî dikin, bi zarokên xwe re tirkî, erebî û farisî deng dikin. Dibêjin em pir li paş in, divê zarokên me hînî tirkî bibin, da ku mîna me li paş nemînin. Bikaribin li her cih û derê deng bikin, erk û wezîfeyan hilgi-

rin. Bibine mamoste, bibine mamûr, bibine doktor û hwd. Hêvî û pêşketinê, di zimanê tirkî/erebî/farsî de dibînin. Zanistiyê di axaftina zimanê tirkî/erebî/farsî de dibînin. Ew bi xwe di mîjîyê xwe de zimanê kurdî zimanekî fermî (resmî) nabînin. Mîna karbidestên tirk/ereb/fars, zimanê serdestan, zimanekî fermî dibînin. Dibêjin, dema ku Kurdistan serbixwe bibe, emê hingê bi kurdî deng bikin, kurdî bixwînin û binivîsin. Anku kurdî neha girîng nîne û tu berjewendiyê ji kesbûna me re peyda nake. Şoreşgerên me jî dibêjin, em doza rizgariya çîni û netewî dikin, doza zimên nakin. Rizgarî û pêşketina zimanê kurdî, bi rizgariya Kurdistanê ve girêdayî ye. Rast e, lê pêşketina zimên jî, mîna hestî û goşt bi rizgarkirina welêt ve girêdayî ye. Cudakirina wan ji hev ziyaneke digehîne zargotin, çand, wêje û pêşveçûna civaka me. Mîna hozanekî bê tembûr...

Sosyalîstên me kurdan jî dibêjin: "Em înternasyonalîst in. Em tu cudabûnê naxînin navbera zimanan. Mirov bi çî zimanî ji hev fêhm dike, pêwîst e bi hev re bi wî zimanî deng bike. Dengkirina bi kurdî pir ne girîng e. Ew kesên ku bi giranî li ser zimên disekinin ew nijadperest in..." (!) Ev nêrîna bi bir û baweriya min, nêrîneke pir çewt e. Ne înternasyonalîstî ye û ne jî şoreşgerî ye. Her welatparêz û demokratekî kurd pêwîst e, bi tekoşîna netewa kurd re, zimanê kurdî jî bi pêşveçûnê û xwedî lê derkeve. Bêyî pêşxistina zimên, tekoşîna şoreşgerî nabe. Bêyî tekoşîna şoreşgerî jî ziman bi pêş nakeve. Herdu bi hev re girêdayî ne. Pêwîst e em tenê bi yekî negrin. Û yê dinê jî bernedin.

Sazî û kesên ku li dijî pêşxistin û axaftina zimanê kurdî ne, ew li dijî netewa kurd in. Kesên ku kurdî girîng nabînin, ew folklor û matê gelê kurd ê jiyane jî girîng nabînin. Kesên ku ji bo pêşxistina zimanê kurdî vekolînan çêdikin, lê kurdî di jiyana xwe ya rojenîn de bi kar nayê jî bi kar nahênin, ew nikarin ji gelê kurd fêhm bikin. Ji bo nimûne jî gelek kurdnasên ku xwestine jiyana gelê kurd bizanibin, berî her tiştî kurdî hîn bûne. Di dîrokê de gelek kesên weha hene.

Kesen ku zimanên tirkî, erebî û farisî jî zimanê kurdî girîngtir û pêşemintir dibînin, ew baweriya serdestên tirk, ereb û farisan tînine ziman, ne baweriya

kurdî.

Mamostayê me, civaknas Dr. Îsmail Beşikçi, di rojnameya SERXWEBÛNÊ, (hejimara 111, rûpel 30) de dibêje: "Di navbera baweriya û zimên de baweriyeke gelek girîng heye. Ger hûn bi kurdî deng bikin, hûn mîna kurdan jî dihizirin. Eger hûn bi tirkî deng bikin hûn mîna tirkan dihizirin. Ji bona kurdan mijûlbûna bi kurdî jî ya tirkî girîngtir e. Ger nix û qiymetê nedin kurdî, tete xuyakirin ku mîjîyê kurdan tete dagîrkirin. Her weha jî xuya ye, ku di civatekê de dagîrkeriya herî hov jî ya mîjî destpêdike. Ji bo kedxwariya mîjî yê kurdan sazûmanên tirkan her tişt kirine."

Li Kurdistanê civaka kurd tar û mar bûye. Di her hêlê de bandûriya dijinan li gelê me bûye. Her demê, dijinan xwestine mirovên me sist û pûç bikin. Li gora vê jî, biryar û fermanên xwe deranîne. Bi sedan sal in, dijinan dixwazin bi zor û pîlanên xwe, me ji holê hilînin.

Bi rastî eger em îro bi zarokên xwe re bi kurdî deng nekin, kurdî zimanekî resmî yê xwe nebinin û mîna dijinan li zimanê xwe binêrin, bêguman ev xizmeta siyaseta dijinan dike. Ev bi xwe jî ramana tirk, ereb û farisan e. Em bixwazin, ne xwazin dibine maşe û haceta dijinan li dijî zimanê xwe. Kesên ku demokrat û şoreşger in, ku dibêjin axaftina kurdî ne girîng e, ew jî ji hêlekê ve para xwe di vê kêmasiyê de distînin.

Pêwîst e ku em baş bizanibin kurdayetî, welatparêzî, demokratî û sosyalîstiya me, bi xwedîderketina li doza Kurdistan û rizgariya netewa Kurdistan e. Barê me ev e, raman û baweriya min jî ev e.

Ez dibêjim, eger em bi leşkerî, aborî ramiyarî û çandî li dijî dijinan bisekinin, pêwîst e em zimanê xwe jî biparêzin û jî wê xebatê veneqetînin. Jê cuda nekin, pê ve girêdin, di jiyana xwe ya rojê de bi kar binin. Pêwîst e em zarokên xwe mîna kurdan mezin bikin, ne mîna tirk û ereb û farisan.

Divêt em mîna xwîna jiyane, ya di reh û damarên xwe de, zimanê xwe jî di jiyane de bi kar binin û bidin pêş. Bingeha jiyana netewî bibînin. Li hevberî politîka dijinan wî weke namûs û rûmeta xwe biparêzin. ★

4.5.1991

XELAT Û SÎPAN

H. Sefqan

Yek ji bûreyên cengên cîhanî, yên yekemîn û duwemîn, reva milletan ji ser xaka xwe bû. Koçberbûna ji ber zilm û zineta ku dewletên cîhanê yên serdest dikirin, zordariyeke giran û kirêt bû. Vê zordariyê bi hêsanî li serê milletên bêserokatî dikirin. Nexasim milletên mîna milletê kurd û ermen...

Bi destpêkirina cenga cîhanê ya duwemîn, pir malbatên Kurdistanê ji bakurê rojava bazdan, derbasî başûrê naverasta Kurdistanê bûn û li wir xwe bi cih kirin. Malbata Derwêş yek ji wan malbatan bû ku ji Serhedan derketibû û xwe li "Binxetê" bi cih kiribû. Wê demê tenê Derwêş û pîreka xwe Silto û keça wan hebûn.

Piştî ku xwe gihandibûn "Binxetê", li gundekî bûne mêvan, piştî ku li gelek gundan geriyabûn kufletê xwe li malekê danî, êvarê tev li mazûbanê xwe çûn mala muxtêr û rewşa xwe anî ziman, ku di-xwaze bibe gundiyekî muxtêr û mîna gundiyan karekî wî bike. Piştî dan û stendineke dirêj, pirs û bersîvên hevûdu dan, di dawiyê de muxtêr ew pejirand ku bibe gundiyeke wî. Ji ber ku wê demê muxtar bi hacetê zilaman bû. Nexasim yekî mîna Derwêş ku di 30 salê xwe de bû. Ser de jî Derwêş hemû qanûnên gudîtiya muxtêr li ser xwe pejirandin. Êdî parçak erd giha Derwêş. Mîna hemû gundiyan çandini û paleyiya xwe dikir.

Ji ber ku Silto, pîreka Derwêş,

nexweş bû, zarokên wê di zik de diçûn. Tenê ew keça wan ma. Çiqas gundiyan dixwest ku Derwêş jinekî xwe bîne, Derwêş ne dipejirand. Ji ber ku hingî ji jina xwe û keça xwe ya tenha hez dikir. Her dem ev gotin digotin: Ez tu carî hewiyê naynim ser Silto... Her wiha salek didu, panzde sal derbas bûn. rojekê Silto bi wê êşa xwe çû dilovaniya xwe û mir. Piştî demekê, Derwêş keça xwe kir berdêliya xwe, bû xezûr zava, lê mixabin dîsa sînor di navbera wan de hebû.

Sal zivirîn, dem hate guhertin, hinekî giyana netewî di nava milletan de xurt bûye, gelê kurd jî mîna wan ketibû ser rîya doza serbestiya xwe. Axatî, rênçberî hilat. Derwêş katiye 50 saliya xwe de. Hindê zarokên wî çêbûne, lê mixabin tadeya salên çûyî, ji nûve lê da der û kêr kir. Êdî kete nav pencên pîrî de û nexweş ket. Mehek didu kişandin. Kete ber sikerata mirinê de. Wê demê jina wî avis bû. Di ber sikeratê de got: Eger keç be navê wê bikin Xelat... Eger kur be navê wî bikin Sîpan... Ez bi hesreta Sîpanê Xelatê me... Derwêş dest ji jiyane berda û çû ser dilovaniya xwe... Ew zarokên din jî sêwî hiştin. Jina ciwan bêxwedî ma.

Meh neçû serî, di şevêke tarî de ku ewran xwe gihandiye zikê erdê, li qiraxa gund û di malekê perîşan, ode û hêwanake ku nava wan bê derî bû tenê merşeke peritî bi ser de darkiribûn, bixêrîk û beragirk yekin axurekî vala ji wan wê de ye.

Wan zarokan xwe li dora diya xwe dabûn hev. Ji tirsan hevûdu hembêz dikirin. Lê dê, diya reben, perîşan û bêçare, maye, pêlên qolincan ew dane ber xwe, hêdî û bi dengekî ku bi zor ji wergiya wê hate der, ji keça xwe ya mezin re got:

- Keça min, bi destê xuhên xwe bigre û herin mala pîra Helîmê, bila bê vir. Her sê zarokan bi destê hev girtin û bi tirs û zor xwe gihandine mala pîra cîran... Pîra Helîmê bi jîrî, bi delametên xwe yên mirovahî rabû, çend hejik şikandin û avêt soba ardû. Zarok tev kirin nava doşekê û doşeka din ji diya wan re danî. Seetek didu çûn, ewr hina ji hev bel bûn. Te digot qey ne çile ye, lê bi sê çar cihan dilop dihatin. Carekê, duduwan, pîrê gaza çirê guhert, şeveqe lê da, pîre dengekî zelal, bêguneh û nazik hate dinê. Pîrê bi kêf li dê zivirî û gote: Keça min Sîpan hate dinê. Zêdeya te pîroz be. Lê dê diya reben xwest bikene lê nedikaribû. Hêdî hesrên wê ji çavên wê bariyan, nikaribû şa bibe. Bi dengekî melûl kêf û girî tev li hev, ku zuha hate der, got: Xwedê ji te razî be û kelegirî ew hilanî.

Belê Sîpan hate dinê. Lê ne bav ne ap ne jî xa... Tenê diyeke reben û perîşan, bêkes û bêxwedan... Diyeke jar ku di nava qîlên demê de dihate cûtin. Çend zarokên bêçare... Gelo wê bi çi rebeniyê bêne xwedîkirin. Rebenî û perîşaniya dê hate ber çavên wê. Nema xwe li ber pêla kelê girt. Da girînek ku di

hundir de ye, hêsireke wê hêdî nu-
qutî ser ruwê sîpan ku ew xistibû
hembêza xwe de. Dîsa pîra Helîmê
li ber dilê wê da: Keça min wê
xwedê ferecê veke, li dû tengasiyan
ferehî ne.. Û pîrê ji ber serê wê
ranebû, heyanî beyaniya dereng.

Belê bi alîkariya gundiyan qenc
û dilovan, Sîpan çelê xwe (40 roj)
xelas kir... Mehên xwe û salên xwe
bûrandin. Xuşkên wî mezin bûn, êdî
bi paleyê, eşêf û liqata ceh û geni-
man xwe xwedî kirin.

Sîpan mezin bû, tevî zarokan
dîfîst. Diçû dibistanê û dihat. Hingî
ku jîr bû, dema ku zarokên, nexa-
sim kurê muxtêr, hunerên wî dîtî
diviya bûn wî dilşikestî bikin. Ji lew-
ra jê re digotin "yê sêwî" pê re
nediçûn û ne dihatin. Her dem bi
tenê dihiştin. Êdî bi melûlî destê
xwe dida ber serê xwe, dilê wî pê
dişewitî. Lêvên wî dizizikîn û hêsrê
wî dihatin xwarê. Bi vî awayî, 13
salên xwe bûrandin. Destê wî dar
girt, dikaribû here şivantiya berxik û
karikan û hinekî ji daxwazên xwe
pêk bîne. Danekê şivantî dikir û da-
nekî diçû dibistanê. Bi vî rengî
xwendina xwe ya gund qedand.
Dîsa bi perîşanî derbasî bajêr bû,
sê-çar salên xwe bûrandin. Diya wî
xwest ku bi zavetiya wî şa bibe. Vir
de çû wê de hat, keçekî camêran
dîtî û li hev kirin. Mîna Memo û
Zînê herdu kulfîkan ji hev hez kirin.
Navê destgirtiya xwe kire Xelat ji
bo ku gotina bavê xwe bijîne.

Hino hino çavên wî vebûn û
xweste xwe bigehîne xortên demê û
bi karê ramyariyê mijûl bibe. Ji ber
ku ramanên partiyên wê navçiyê
çewt bûn, pir ji wan hez nedikir. Di-
viya bû ku qala sosyalistiyê bike.
Gundiyan wî pê dikenyan, digotin:
Sîpan bûye gawir. Ji ber ku ra-
manên sosyalistiyê li gorî nerînen
partîna belav dikir. Êdî bêzî, nefret
û kîn girt. Nema dizane wê çî bike.
Vê carê bi serê xwe liv kir. Wiha
ma heyanî sala 1984'ê ku navê
APOCIYAN bihîstibû. Berxwedan,
serxwebûn, şerê gel, êdî tiştin nuh
in. Êdî bû meraqa wî ku rojekê bi
wan re biaxive û wan nas bike. De-
meke pir kin de, xwe gihande wan.
Piştî dan û stendinekê ku her xort

diaxivî, bêhtir Sîpan pê ve dihate
girêdan. Dawî xort pirtûkek dayê di
bin navê "Berxwedan jîyan e" ...

Her ku carekê dixwand, bêhtir hez
dikir û bawerî bêhtir tanî. Êdî ciwan
li dû ciwanê û roj bi roj têkilî xurt
kirin û dûrî taybetiyên xortên serber-
dayî diket, gav li dû gavê davêt.
Dema ku vejeriya gundê xwe û di-
axivî, vê carê xort û zilamên gund
lê hijmetkar diman. Duh çawa bû
îroj çawa bûye? Her wiha du-sê
seetan deng dikir bêyî biweste. Hin
ramyarvanên sexte hebûn ne di-
xwestin ew ramanên han derbasî
wê navçiyê bibe. Li hevberî wî der
diketin, navê ajanî û sîxurî bi dû wî
dixistin. Lê roj bi roj meh bi meh
Sîpan dikaribû cihê xwe di dilê gun-
diyan de çê bike û dikaribû wan bi
aliyê xwe de bikişîne.

Meh derbas dibûn û Sîpan nema
dihate malê. Ne jî destgirtiya xwe
didît. Tenê bi karê konevanî mijûl
dibû. Evîna wî, hino hino mezin
dibû ta ku bû evîna milletekî... Bê
westî derbasî têkoşîna serxwebûn
û azadiya gelê xwe bû. Carekê diya
wî ew dît pê re got:

- Min te bi rebenî xwedî kir.
Çawa dilê te tehemul dike ku her
serê çend mehan carekê tenê tu
min dibînî? Te ez ji bîr kirime!
Xuhên te, destgirtiya te...

Lê Sîpan hêdî destên diya xwe
maç kir, ew destên ku ji paleyê, li-
qat û eşêfê tev cihok û qelş bibûn:

- Dayika min, min dayik û dest-
girtiyê nuh dîtine, yê rast ew in.
Gerek e tu bi min serbilind bî. Tu
wê bibî dayika pêşmergan... Ji bo
Xelat jî ez û wê bi karê hev diza-
nin, hîn ji me re divê...

Belê Sîpan bi temamî xwe da
tekoşîne. Dê û destgirtiya xwe ji
bîra kirin. Ger carina hevûdu didîtin,
pê re digote Heval... Xelat jî
keçeke xwendewar bû. Baweriya
xwe bi xêza serxwebûnê tanî loma
ji Sîpan re digot:

- Ez dizanim bê çima tu hatiyî
guhertin. Rast e... Wiha tête xwes-
tin. Fîdekarî bi her hawî tête xwes-
tin. Girîng e ta ku gel bi Kurdistan
şa nebe, em jî bi hevûdu şa nebin.
Wê demê emê li ser serê Sîpanê

Xelatê govenda xwe bikin. Belê ez
soz didim ku ezê heyanî dawiyê bi
vê riyê re bim û ezê tê de bi rê ve
herim.

Her wiha bi hevaltî ji bo karê
serxwebûn û azadiyê bi hev re
meşyan. Rojekê, ew xwesteka
Sîpan ya tenha hate cih, ku xwe
bigihîne hêladin ji tîlan û here warê
Siyamed û Xecê, Sîpanê Xelatê.
Wan sînorê çêkirî hiifîne. Wê gir û
kîna xwe li hemberî dagîrkerên tirk
derbike.

Bi şahiyê bêmene, xwe
gîhande qada rûmetê. Di wê rojê
de nameyek ji dayik û hevala jiyana
xwe re şand tê de got:

Belê min rojên rebenî, zor û
zehmetî kişandin. Her weke dayik û
bavê xwe, demekê jî ez winda bûm,
li çolan û sikakên bajaran... Min ge-
lekî ji we hez dikir. Piştî min rîya
şerefê nas kir, perîşanî û wen-
dabûna min ya salan ji bîra min çû.
Lê ez li wan salan poşman dibim.
Roj bi roj hezkirina we di dilê min
de mezin dibe. Hevala min Xelat!
Te sozek dabû min. Ez bi hêvî me
tu li ser soza xwe bî. Dayika min,
bibûrîne. Hemû hezkirin, rojên serb-
est, rohnî, dilxweş û aza ji boyî we
û tevayî welatperweran... *SÎPAN*

Lê mixabin, berî ku dilxweşiya
hemû gelê Kurdistanê bibîne, di
mehên xwe yê pêşîn de, bi qehre-
manî xwe gihande kerwanê şehîdan.
Dema ku diya wî bihîst wiha got:

- Min bi delalî mezin kir, min di-
got wê bibe mamostak, doktorek,
wê me ji vê rewşê derxîne... Lê
dema ku ev rê girt jî ez ne poşman
bûm. Sîpan çêbû, min ne xwedî û
ne xwedan bû lê îroj xweyî min
bi hezaran hene. Bi vê dozê re, em
ên bêkes û bêxwedan, îro xwedan
kes û heval û hevrê ne. Serê min
bi Sîpanê min bilind e.

Belê Xelat jî wiha digot :

- Dema ku Sîpan ji min re got
Heval min dizanibû ku ji dil û can
dike. Min sozek dayê û ez li ser
soza xwe me.

Bi dilovanî li gustîla nişaniyê
nêrî û got : Ez dîsan soz didim ku
ezê li ser vê riyê bimeşim. ■

ŞANO/ TEATER/ ŞANO/ TEATER/ ŞANO/ TEATER/ ŞANO/ TEATER

ŞENGUL Û MENGUL

Perda Yekê

[Perde vedibe, li pişt nîgargehê (mes-rehî) em çiyayê Araratê dibînin. Hêj befir li ser mayî... Li pêş çiyê, pireka weke Pira Delal li Zaxoyê, xuya dike. Li pêş pirê hindêk dar û ber, kevîrên mezin hene. Komeka zaro, ji xwe re dileyizin, stranan dibêjin]

Koma Zaroyan:

Heval hevalojikê
Nan û penîrojikê
Kekê min şivan e
Gopalê min pahn e
Bo guran derman e
Heval hevalojikê
Nan û penîrojikê

[Mam Salo dikeve hundir]

- Salo dîn, Salo dîn!

Mam Salo: Ez ne dîn im, ez ne dîn im.

Dunya dîn e, dunya dîn e.

Koma Zaroyan: Dunya dîn e, dunya dîn e?

Mam Salo: Belê, dunya dîn e, dunya dîn e.

Dunya dîn e Şengulo,

Dunya dîn e Mengulo.

Zaro 1: Şengulo

Mam Salo: Belê, belê Şengulo.

Zaro 2: Mengulo

Mam Salo: Belê, belê Mengulo

Koma Zaroyan: Mam salo, ji bo me bêje Şengul kî ye? Ji bo me bêje Mengul kî ye?

Mam Salo: [Xwe giran dike] Çi, çi...? Ez nabêjim.

Zaro 3: [Mam Salo dikêşin] Mam Salo, îro çiroka Şengu Mengul ji bo me bêje

Mam Salo: Na na, ez nabêjim.

Zaro 4: Tu bi serê me, Mam Salo! Bêje me Şengul û Mengul kî ne?

Mam Salo: Na na, ez nabêjim.

[Koma zaroyan bihinteng dibin]

Mam Salo: Ma hûn ji min dilteng bûn?

Nebin dilteng!

Ez im ez, Mam Salo

Dil ji min bo zarokan

Ez dizanim pir çirokan

Werine bêjime we çirokek

[Diçin li pêş "Pira Delal"ê rûdinin. Mam Salo li niverastê û zaro ji li dora wî dicivin]

Koma Zaroyan: Çi çirok?

Mam Salo: Çi - ro - ka... Şiş, şşş...

Zaro 5: Şoreşa Dersimê

Mam Salo: Na na, me ew got. Şiş...

Zaro 6: Şerê Berdera Sera, li Silêmanî

Mam Salo: Na na, ew ji me got. Şeng...

Koma Zaroyan: Şengul û Mengul!

Mam Salo: Belê, Şengul û Mengul!

[Zaro ji şahî û dilxweşiya xwe dikine hevar]

Mam Salo: [Bi sitiran dibêje û koma zaroyan lê vedigerînin û dileyizin] Hebû nebû... Hebû nebû

Koma Zaroyan: Hebû nebû... Hebû nebû

Mam Salo: Hebû nebû, rojek hebû...

Koma Zaroyan: Hebû nebû, rojek hebû.

Mam Salo: Hebû nebû, bizinek hebû...

Koma Zaroyan: Hebû nebû, bizinek hebû.

Mam Salo: Bizinî du karik hebûn.

Yek bi navê Şengul

Yek bi navê Mengul

Koma Zaroyan: Bizinî du karik hebûn

Zaro [keç]: Yek bi navê Şengul

Zaro [law]: Yek bi navê Mengul

Mam Salo: Ji kerîya pezi wîndî bibûn

Rêka malê wîndî kiribûn

Koma Zaroyan: Na hejarî!

Mam Salo: [Li pêş zaroyan tête û diçe û bi destan çiroka xwe ji bo koma zaroyan welê dibêje] Belê Şengul û Mengulê min...

Rojekê, bizin û du karikên xwe dimînine li dumahiya kerîya pezi û hunda dibin. Û hindî tene ne. Diçin, nikarin rêka malê peyda bikin. Û li wana dibite şev. Şeveke sar û tarî... Bizinî tirsîya Şengul û Mengul nexweş bikevin, gote wana: "Werin em biçîne nav şikevtê" û hûn dizanin şikevtê û heving li çiyayên Kurdistanê gelek in. Vêca şikevteke baş ji xwe re hilbijartin û şevê li wê derê man.

Zaro 1: Mam Salo, ma kes li dû wan negerîya ku wan peyda biki tin?

Mam Salo: Belku... Belê kesê hejar nehête bîra kesî. Divêt ew bi xwe bizavek bikin, xwe bi hêviya kesî girênedin û nehêlin. Yan dê her wisan hejar û bend bimînin.

Zaro 2: Paşê Mam Salo? Çi kirin roja dî?

Mam Salo: Roja dinê, bizinî, dest û baskên xwe hel kir û got; [dengê bizinî têt]: Divêt em bi xwe bizavek bikin.

Em vê şikevtê bi xwe bikine xanî. Her wisan bizinî şikeftî kire xaniyê baş. Her rojê serê sipêdehiyan diçû mîrg û çimenên dor û berên şikeftê û diçêriya. Êvarê dihate mal û şîr dida Şengul û Mengulê.

Çimku zarok divête şîrî ve-xwin.

Zaro 3: Paşê Mam Salo? Çi bû? Ma çiroka te temam bû?

Zaro 4: Na hêja maye. [Bi hêrs û

fûrîn]: Bihêle bila Mam Salo biaxivit!

Mam Salo: Dema zivistan hat û befir barî, giya li dora şikeftê kêmbû, diviya ku bizin biçe nav newalên dûr da ku giya peyda bike.

Belê, berê biçit, gazî kir Şengûl û Mengulê û tiştê gote wan. Hûn dizxanin çî got?

Koma Zaroyan : Na, çî got?

Mam Salo: Werine em biçin, berê xwe bidin û guhên xwe bidinê ka çî gote wan:

Perda Duwê

[Zaro radibin ser piyan û berê xwe didine destê rastê û rohanî li ser wan namîne. Hêla rastê nigargehê rohnidibe. Em mala bizinî dibinin û hindêk fraq û beroş hilawistî ne]

Bizin: Şengul û Mengul, ez îro dûr diçêrim. Giya li van dor û beran kêmbûye. Eger ez dereng bimînim, giro bibim, hişyar bin. Derî li kesî venekin. Her li mal bin û ji xwe re yarî û henekan bikin.

Şengul û Mengul: Baş e dadê. Em derî venakin heta tu neyê.

Bizin: Her bijîn. Eger ez vegerim, ezê bêjim [Bi listin û stran dibêje]:

*Şengûl û Mengula min
Derî vekin, derî vekin
Ez im ez, dayîka we
Ez çûbûm zozanan
Min giya xwariye bi dinan
Şîr hatiye guhanan*

Paşê ezê lingê xwe ji binê derî dirêjkim û hingê hûn biza nin lingê min e, paşê derî venekin. Baş e?

Şengul Mengul: Baş e dadê. Heta tu nebêji.

Şengul: [Bi leyistin û sitiran]:

*Şengula min, Mengula min
Derî vekin, derî vekin*

Mengul: *Ez im ez, dayîka we*

[Ciyê zaroyan rohnî dibe]

Şengul û zaro: *Ez çûbûm zozanan*

Mengul û zaro: *Min giya xwariye bi dinanan*

Şengul û zaro: *Şîr hatiye guhanan*

[Ciyê zaroyan tarî dibe]

Mengul: *Û lingê xwe ji binê derî dirêj ke.*

Şengul: *Û eger me zanî lingê te ye, emê derî vekine.*

Bizin: Pir baş e. Hişyar bin û çavên xwe vekin. Li dora me çar gur hene. Eger em xwe zîrek nekin, dê me bixwin! Baş e?

Şengul û Mengul: Baş e.

Bizin: Ev e ez çûm.

Şengul û Mengul: Tu bi xweşî herî dadê.

Perda Siyê

[Mam Salo hizir û bîrên wî dûr çûne]

Zaro 5: Mam Salo, paşê çî bû?

Zaro 6: Mam Salo, ma tu nivistî?

Mam Salo: Na ez ne nivistî me, lê ez çîrokê dihênime bîra xwe ka çawa bû... Çawa bû... Çawa bû...? Aha.. Hate bîra min. Bizin xatirê xwe ji Şengul û Mengulê xwast çû çêrê. Lê mixabin:

Zaro 1: [Bi tirs] Çî bû Mam Salo?

Mam Salo: Gurek...

Koma zaroyan: [Ji tirsan bi hev digirin] Na... Wey dadê!

Mam Salo: Belê, gurek li piştê deriyê wan bû, guh dabû gotî na bizinî û hemû tişt dizanî. Gurê gewr gelek keyfa wî hat. Û neha ew ên li mala xwe nexşan dikêşe. Werin berê xwe bidine ka ewê çî bike.

[Cihê Mam Salo û koma zaroyan tarî dibe]

Perda Çarê

[Rexê çepê nigargehê rohnî dibe, em mala gurî dibinin. Hindêk serên heywanan hilawistî-daleqandî ne. Serê wan heywanên ku

gur ew xwarine]

Gur: Ha... ha... Îro cejna min e. Wey, wey, wey, ezê kêfê bikim. Ev e çend e ku ez li hêviya vê rojê me. Heta neha ez nikaribûme rêkekê bibînim. Lê îro ezê bikaribim wana bixwim. [Bi leyistin û sitiran]:

*Ez im, gurê gewr
Dinan fîj û dil ji kevr
Ez'ê bixim Şengulo
Ez'ê bixwim Mengulo*

[Ciyê zaroyan rohnî dibe û bi hêrs û fûrîn dibêjin]:

Zaro:

*Tu yî tu, gurê gewr
Te nîne mejî li ser
Te nîne rehîm her
Tu yê nexwî Şengulo
Tu yê nexwî Mengulo
Mam Salo bêje,*

nexwe Şengulo

Mam Salo bêje,

nexwe Mengulo

Mam Salo: Ev çîrok e. Ez nikarim biguherim. Rûnin lezê nekin û bêdeng bin!

[Cihê zaroyan tarî dibe]

Gur: Divêt ez lezê bikim, hîna li min nebûye

derengî. Biçime fêlek li şengul û Mengul bikim û wana bixwim.

[Gur ji malê derdive]

Perda Pêncê

[Nigargeh rohnî dibe, em mala bizinî dibinin. Gur tête ber derî]

Şengul: Tu dibêji kî bit Mengul?

Mengul: Nizanim... Hişyar bi derî venekî ha!

[Şengul û Mengul diçine piştê derî]

Şengul û Mengul: Tu kî yî ?

Gur [Li ber derî dileyize û distirê]:

Şengula min,

*Mengula min.
Derî vekin, derî vekin
Ez im ez dayika we
Ez çûbûme zozanan
Min giya xwarî bi dinanan
Şîr hatiye guhanan*

Şengul:

[Bi dengekî nizm dibêje]:

Ev e ne dayika me ye! Dayika me wisan zû venagere

Mengul: Rast e. Tu rast dibêji. Dadê got ez'ê dereng bimînim! Neha em çî bikin? Ez pir ditirsim.

Şengul: Were em bêjine lingê xwe nişani me bide! Ne ku dadê be, ewê ji serma biqerime li derva.

Mengul: Tu derewan dikî! Tu ne dayika me yî. Eger tu dayika me bî, ka lingê xwe nişani me bide da em bibînin.

Gur: Çawa ez ne dayika we me ? De zû derî vekin!

Şengul: Eger tu dayike me bî, tu ji bo çî lengê xwe nişani me nadî, daku em bizanin çî reng e?

Gur: Ax!

[Destê xwe digeze û ji xwere dibêje]

Min ev ji bir kir! Lingê min? Ha ... Ev e lingê min...

[Lingê xwe ji binê derî dirêj dike]

De vêca derî vekin! Dinya gelekî sar e!

Şengul: Tu fêlbaz! Tu ne dayika me yî! Rengê dayika me sor e. Tu gewr î. Tu gurê gewr î! Em derî venakin.

Gur: [Ji xeman li serê xwe dixê]

Vêca bi min hesiyan. Ax.. ax.. Ez'ê her toleya xwe hilînim. Hûn'ê bibînin.

Perda Şeşê

[Li nigargehê ciyê Mam Salo û zaroyan rohnî dibe]

Zaro 1: [Koma zaroyan ji dilxweşiyan dikine hewar]: Her bijîn Şengul û Mengul! Fikrek baş kirin.

Mam Salo: Belê, belê. Min negote we

lezê nekin? Neha kerbên gurî gelekî vebûn.

Belê, gur bela xwe ji wan venake. Dê rengê xwe sor bike biçê cem wan.

Zaro 2: Ma careka dî? Mam Salo, me divêt em nehêlin ku gur Şengul û Mengul bixwe.

Mam Salo : Alîkarî pir baş e. Lê belê gur dê her fêlên xwe bike! Werin berê xwe bidinê.

[Nigergah tarî dibe]

Perda Heftê

[Mala bizinî rohnî dibe]

Gur [Bi lîstin û sitiran]:

Şengul û Mengula min

Derî vekin, derî vekin

Ez im ez, dayika we

Ez çûbûm zozanan

Min giya xwariye bi dinan

Şîr hatiye guhanan

Ev e ji lingê min e

Berê xwe baş bidinê

[Lingê xwe ji binê derî dirêj dike]

Mengul: Şengul, Şengul!

[Şengul radibe]

Rabe dadê hate! Rabe em derî vekin!

Şengul: Na raweste carek! Ka lingê xwe baş drêj bike em bibînin!

Gur : Ha ev e. Bi xwe ez derewan na kim! Ez dayika we me! De derî li min vekin!

[Şengul û Mengul du dar digirine destên xwe û li lingê gurî didin. Gur lingê xwe paş de dikişîne]

Gur : Ay ay! We lingê min şikand. Kes vî tiştî li dayika xwe nake! Ma we negot lingê dayike we sor e? Va ye lingê min sor e. Ez diya we me.

Şengul û Mengul [dikenin]: Derewin tu derewin! Em zîrek in, em hişyar in. Tu nikarî bi me bixapînî! Lingê diya me ne sor e!

Gur: Ha... [Guhê xwe dide derî] Ma çî reng e?

Zaro [Ciyê wan rohnî dibe û

dikine hewar]: Mam Salo, Mam Salo, bila nebêjin çî reng e!

Mengul: Lingê dayika me reş e!

Gur: Ax li vî belayî! De berê xwe bidinê! Wan bi xwe gote min lingê dayika me sor e û neha jî dibêjin reş e. Vêca kî derewin e? Ez yan ew? Da biçim lingê xwe reş bikim, vegerim hina dayika nehatiye. [Gur diçe û nigargeh tarî dibe]

Perda Heştê

[Cihê Mam Salo û Zaroyan rohnî dibe]

Mam Salo: Vê carê jî Şengul û Mengul rizgar bûn. Belê eger meriv hişyar nebe, dê her bela bi serî de werin. Werin li gel min! [Nigergah tarî dibe]

Perda Nehê

[Li mala bizinê]

Mengul: [Li hundir ji tirsan dihê û diçe] Şengul dadê hina venegeriya. Pir dereng ma hina venege rîya. Tiştêk bi serê neha tibe. Ez geklek ditirsim. Bêyî dadê em nikarin bijîn. Ma tu dibêji dê vegere.

Şengul: Na, na Mengul! Netirse! Dayika me zîreke û tiştêk pê nayê. Û neha wext e bizivire.

[Gur tete piştê derî û li derî dixê]

Şengul û Mengul: Ev dadê ye, ev dadê ye.

Gur [Bi sitiran û lîstin]:

Şengula min,

Mengula min

Derî vekin, derî vekin

Ez im ez., dayika we

Ez çûbûme zozanan

Min giya xwariye

bi dinanan

Şîr hatiye guhanan

Şengul: [Diçe piştê derî] Eger tu dayîka me bî, ka lingê xwe nişani me bide, da em bibînin.

Gur: Hêj hûn bawer nakin ku ez dayîka we me. Ha ev e lingê min.

Mengul: [Şengul û Mengul berê xwe didine hev û li gel hev dipeyvîn] Şengul ev piyê dadê ye, derî veke!

Şengul: Rast e, ev pi reş e. Piyê dadê ye.

Gur: Erê erê ez dadê me zû derî vekin, bi min sar e.

Şengul: Belê dadê... Raweste ez'ê derî vekim.

[Derî vedikin û gur tê hundirû]

Gur: Ev e ez im dadê. Min bi we karî.

Şengul û Mengul: [Bi hewar û qîrin. Lê gur wana dixwe] Gur e, gur e! Hawar gur e!

Gur: [Bi sitiran û lê ji ber ku ziktijî ye bêyî listin]

Ez im ez gur ê gewr!

Dinan fîj û dil ji kevr

Ev e min xwar Şengulo

Ev e min xwar Mengulo

Ay, çend xweş bûn. Çi goştek taze pê ve bûn? Neha ez têr bûm. Lê ez çawa dayîka wan bixwim. Eger ez nexwim ewê min bikuje. Şaxên qilochên wê gelek tij in. Da ez carek biçim mal û rêkê ji bo xwe dahênim.

[Gur diçe nigargeh tarî dibe]

Perda Dehê

[Cihê Mam Salo û zaroyan rohnî dibe. Hemû ji xeman bêdeng rûniştî ne]

Mam Salo: Ma we dît çî bi serê Şengul û Mengul hat ?

Zaro 5: [Bi dengê xemnak] Mam Salo ev çirokeke xemgîn bû.

Mam Salo: Hêj kuta nebûye. Guhên xwe bidinê! Piştî gurê gewr Şengul û Mengulî xwar, çû mala xwe. Dema êvarê dereng bizin hate malê û dît ku derî heya ser piştê vekirîye û mala wê û tikel û pêkel e. Gazî kir [Dengê bizinê têt] Şengul... Mengul... Ev ez im

dayîka we. Hûn li ku derê ne? De bêjine hûn li li ku ne vê sevê?

Mam Salo: Na xêr, Şengul û Mengul, di zikê gurî de ne. Bizin hizra kir û got; hebe nebe dirindeyek herdûkan xwariye.

Dirindeyek bê dil û dilovanî.

Zaro 6: Mam salo bila biçit ji gurî bistinit

Mam Salo: Na ew nizane ku eseh gurî ew xwarine. Vêca divêt ji hemûyan pirsiyar bike ku kê karikên wê xwarine? Yekem car çû mala hirçî. Werin û berê xwe bidinê.

Perda Yanzdê

[Nigargeh rohnî dibe. Em mala hirçî dibînin û bizin li ser banê wî tep-tep dike]

Hirç [Bi fûrin]: Ew kî ye li ser banê min

Şep şep dike

Tep tep dike

Keç û kuluzê min

pirax dike

Li ber mêhvanan min

şarmezar dike

Bizin:

[Bizin ji bi fûrîneka bêhtir]

Ev e ez im ez

Şep şep dikim,

tep tep dikim

Li ber mêhvanan te

şarmezar dikim

Te xwariye Şenga min

Te xwariye Menga min

Were şer û cenga min

Hirç:

Na na...

Min nexwariye Şenga te

Min nexwariye Menga te

Nayême şer û cenga te

Bizin:

[Bi dengê kiz û girîn]: Ca kê Şengul û Mengula min xwariye? Ew li ku ne ? Ma te ew ne dîne?

Hirç: Na xêr here li wan bigere!

[Bizin diçe]

Hirç: raweste raweste! Ez'ê ji alîkariya te

bikim.

[Hirç ji mal derdikeve]

Bizin: Em bi ku de biçin vê şeva tarî? Ez ji kî bipirsim? [Dike hawar] Şengul... Mengul.. Hûn li ku ne?

[Cihê Mam Salo rohnî dibe]

Mam Salo: Bizinê feqîr... Şeveke tarî û dunyayek sar û nizane çî bike. Ew û Mamê Hirç rêka xwe girtin û çûne ser banê pilingî û jê pirsîn. Lê çî ji nedî zanî. Ez ji dihême alîkarî we.

Da em şengul û Mengulê bibînin. Her sê bi hev re çûne ser baniya mala şerî.

[Mala şerî rohnî dibe û bizin û hirç û piling dihêne ser banê wî]

Şer [Bi fûrin] :

Ew kî ye şep-şep dike

tep-tep dike

Keç û kuluzî min pirax dike

Li ber mehvanan min şarmezar dike.

Bizin û hirç û piling [Her sê bi hev re] :

Em in şep-şep dikin

tep-tep dikin

Keç û kuluzê te

pirax dikin

Li ber mehvanan te

şarmezar dikin.

Bizin:

Te xwariyê şenga min

Te xwariyê Menga min

Were şer û cenga min

Şer: Na, na...

Min nexwariye şenga te.

Min nexwariye Menga te

Nayêma şer û cenga te

Belê ez jî bi we re werime da ku empêkve Şengul û Mengulê bibînin [Şer ji mal derdikeve û di gel wan diçe û nigargeh tarî dibe].

[Ciyê Mam Salo rohnî dibe]

Mam Salo: Belê, her çar destên xwe dane hev, her çar hevdu girtin û li pey Şengulê û Mengulê geriyar. Eger ew hevdu bigirin dikarin Şengul û Mengul pey da bikin. Yekgirtin gelekî

baş e. Werin di gel min. [Cihê Mam Salo tarî dibe û rohnî diçe ser bizin û hevalên wî. Hemû mane he-yirî. Dihên û diçin. Lê şêr rûniştî ye]

Bizin: Ez biçime ku derê? Em ji kî pirs-iyar bikin

Hirç: Xeman nexwe emê her wan bibînin û bihênin. Dibe ku çûne ciyekê dûr, ku ji xwe re bileyizin û li wan bûye şev.

Şêr: Ez dibêjim em ji wan ê mayî bipirsin.

Piling: Ma kî maye?

Şêr: Ha, ha... Her çar gur... Hebe nebe ev karê wan e.

Bizin: Tu dibêji ew bin? Vêca em ji kîjanê wan bipirsîn?

Şêr: Yê ji hemûyan mezintir; gurê gewr e. Hebe nebe ew e! Ew dij minê biçûkan e. Hemû bi hev re : Da em biçin. [Diçin ser banê gurî]

Gur: [Bi fûrîn] Ew kî ne...

Şep şep dikin,

tep-tep dikin.

Keç û kuluzên min

pirax dikin

Li ber mêhvanan

min şermezêr dikin.

Hemû bi hev re:

[Bi fûrîni û yekdengî]

Em in em,

şep-şep dikin,

tep-tep dikin

Keç û kuluzên te

pirax dikin

Li ber mêhvanan te

şermezêr dikin

Bizin:

Te xwariye Şenga min,

te xwariye Menga min,

were şer û cenga min.

Gur: Erê, erê.

Ez im ez, gurê gewr

Dinan tîj û dil ji kevr

Min xwariye şenga te

Min xwariye Menga te

Nayemê şer û cenga te

Çi dikin, bikin.

[Cihê gurî tarî dibe û mchê Mam Salo rohnî dibe]

Mam Salo: We dît gurê gewr? Neha bi zin zane Şengul û Mengul di zikê gurî dene. Di gel hevalên xwe hirç û piling û şêrî rûniştin û li ser çareyekî fikirin. Bizin çû mala qazî û hal û rewşa xwe û gurî û Şengul û Mengul ji qazî re rohnî kir. Qazî ji mam rovi ye.

[Cihê Mam Salo tarî dibe û mala qazî rohnî dibe. Rovi li ser cihek bilind rûniştî ye û bizin û hevalên wî li pêş wî rûniştî ne]

Qazî: Gelekî spas qaziyê min. Ez çi ca ran vî karî ji bir nakim.

Qazî: Li ser çava tu bijmêre ku Şengul û Mengul li cem te ne. Bila soz û peyman be, ezê tola te ji gurî vekim. Neha tu rabe here cem hosatyê pîr û bêje wî qazî rovi silav li te ki riye û dibêje bila şaxên qiloçên te weke cûzanê tîj bike, gava tu qiloç li kevir dî, hûr-hûr bike. Bila şêr û piling û hirç di gel te bin. Ne weke gur li rê stem lê bike.

Şêr û piling û hirç: Ser çavan qaziyê me.

Şêr: Emê di gel biçin û nehelin kes nêzîkî bizinê bibe. Dema we xweş be, biminin di xweşiyê de.

Qazî: Bi xweşi herin.

[Mala qazî tarî dibe û cihê Mam Salo rohnî dibe]

Mam Salo: Qaziyek zîrek e.

Zaro 4: [Bi pirsîyar] Mam Salo ma qazî dikare Şengul û Mengul bihêne careke dî.

Mam Salo: Lezê mekin. Berê xwe bidinê ewê neha çi bibe? Bizin çû cem hostayê pîr û fermana qazî gihandê. Hoste qiloçên bizinê tîj kirin ku dema li kevir xe hûr bike. Belê xeber giha gurî, ku bizin çûye cem qazî û gilî lê kiriye. Gur hizra xwe kir û çû cem qazî. Li gel xwe di-yariyek ji bo qazî bir. Lê qazî pîr bêhteng bû û gote, min diyarî te navê. Belê di dilê xwe de got:

[Dengê qazî têt] Bila soz be ezê derdekê bidime te, ku tu çi caran ji bir nekî.

[Cihê Mam Salo tarî dibe û mala qazî rohnî bide]

Gur [Bi dengê grîni, lê bi derewîni] : Mam qazî, Mam Qazî ez li ber bextê te me. Sitem li min hatiye kirin. Bi serê te min Şengul û Mengul nexwariye. Ew her ji xwe re welê dibêjin.

Qazî: Na, na gurê gewr! Min gelek tu divê, dilê xwe teng meke. Ez nahêlim sitem li kesî bihête kirin. Belê gurê gewr, ca di ranên xwe nîşanî min bide.

[Gur devê xwe vedike û dinanên xwe nîşanê Qazî dîke]

Dinanên te riziyanê. Rabe here cem hostayê pîr, bila dinanên te çêbîke û tîj bike, ku tu ji bo roja dadgehê amade bî. De vêca rabe û here.

Gur: Spas Mam Qazî, dema te xweş.

[Gur ji xwe re dibêje]:

Wey qaziyek çi bê mêjî ye? Ew nizane Şengul û Mengul di zikê min de ne.

[Qazî ji xwe re dibêje]:

Wey tu bi xweşiyê neçî. Ev çi bela ye bi serê me de...?

[Mala Qazî tarî dibe û cihê Mam Salo rohnî dibe]

Mam Salo: Belê berî ku gur bigihê cem hostayê pîr, qazî xwe gihandê û çêla rewşa bizinê kir û Gur çi bi serê Şengul û Mengul aniye gote wî. Paşê gote wî, ku dinanên gurî jê bikêşe û li cihê wan hindêk dinanên şema dahêne.

Roja dinê, roja dadgehê bû. Werin da berê xwe bidinê.

Perda Duwanzdê

[Roja dadgehê, qazî rûniştî ye û hemû li pêş wî ne. Lê bizin û gur li pêş hemûyan e. Hemû di gel hev diaxifin. Zarok û Mam Salo li gel wan in. Lê li paş rûniştî ne]

Qazî: Bêdeng bin bê deng! Her weke hûn dizanin îro, roja dadgeha bizin û gurî ye. Kerem ke bi zin were pêş û biaxife.

[Bizin radibe û diçe pêş]

Bizin: Qaziyê me û guhdarên hêja, berî çend rojekê, ez çûbûme çêrê. Dema evarê ez vegeyriyam û hatime malê Şengul û Mengul li mal nebûn. Min ji hirç, piling û şêrî pirsyariya wan kir. Ew çî nedizanîn. Û bi şahidîtiya wan em çûne mala gurî û me pirsyariya jê kir. Gote belê, min Şengul û Mengul xwariye.

Qazî: Hirç û piling û şêr, hûn mirovên baş in, rast û durust dixivin. Ev tiştê ku bizin got rast e? Hûn bi wê re bûn?

Hirç û piling û şêr: Belê belê rast e.

Qazî: Gurê gewr, were pêş. Tu dibêji çî?

Gur: [Bi dengeke têkel û pêkel û bi lez dixave] Bi serê te qazî! Derewan dîkin! Min vê negotiye! Derew e!

Qazî: Hêdî hêdî biaxive. Neha emê bi zanibin ka tu yî yan na! Gelf civat, hûn çawa dibinin? [Keroşk destê xwe bilind dîke û qazî bi destê xwe destûr dide ku keroşk biaxive]

Keroşk dipeyive: Min gelek caran gurê gewr diye ku li dora malên me dihat û diçû û bi çavek nizm berê xwe dida zaro û biçûkan. Ez dibêjim her ew e ku Şengul û Mengul xwariye.

Zaro: [Hemû bi hev re û bi dengekî bilind] Belê belê me dît. Gurê gewr Şengul û Mengul xwarin.

Mam Salo: Bêdeng bin, bêdeng! Hûn tenê guhdar bin û berê xwe bidinê.

Qazî: Ji ber vê hindê, em gihane birya rekê. Ew jî ev e:

[Qaxezekê derdixê û biryarê dixwîne] Gur û bizin dê şerê hevdu bi kin. Eger bizin rast dibêje, ewê bikaribe gurî û eger gur rast dibêje, ewê bikaribe bi bizin. Ma hûn çî dibêjin.

Şêr: Hukmek gelekî baş e. Devê we xweş be qaziyê me.

Keroşk: De ez te bibînim bizin! Zikê gurî bidirîne!

Qazî: Bêdeng bin, bêdeng! Bizin were pêş! Gurê gewr tu jî were pêş! [Bizin û gur diçine pêş û her yek li rexekê radiwestin] Gava min gote we 1, 2 û 3... hûnê dest pêkin! Hûn amade ne!

Bizin: Belê ez her dem amade me!

Gur: [Dengê wî ji tirsan dilerize] Raweste! raweste! Da ez cihê sim û piyê xwe xweş bikim. Neha ez amade me.

Qazî: Başê 1, 2 û 3 !

[Bizin û gur bi nava hevdu girtin, lê gur ji ber bizinê direve]

Bizin: Were pêş hey tirsonek!

Qazî: Te çî ye gurê gewr? Tu jî bona çî naçiyê?

Gur: [Bi dengekî girin] Hostayê pîr fêl li min kiriye. Dinanên min hemû ketin. Ji şema çêkirî bû ne.

Qazî: Here pêş! Here pêş! Gotinan meke! Eger tu neçî ezê hemûyan berdime te.

Şêr: Her bijî bizin! Her bijî bizin!

[Bizin zikê gurî dirîne û ji hundirê zikê gurê Şengul û Mengul derdihêne derê. Hemû radibin ser xwe û zaro jî di gel. Ji dilxweşî û şadiyê hemû bi milên hevûdû digirin]

Hemû bi hev re: Her bijî bizin! Her bijî bizin!

Bizin: Spas, gelekî spas ji we re. Spas ji we re hevalên min. Eger ne hûn bûna ez bi tenê ne dikaribûm bi vî gurî.

Şengul û Mengul: Dadê tu li ku bû yî?

Bizin: Hûn li ku derê bûn Şengul û Mengula min?

Şengul: Dadê em çûbûn mala xalê xwe.

Mengul: Dadê ez nizanîm em li ku derê bûn.

Bizin: Na dadê na. Hûn di zikê gurî de bûn. Ma min ne gote we heta hûn nizanin ez im, derî vene kin! Hûn hişyar ne bûn heta gur hûn nexwarin. Carekê dinê divê hûn baş guhên xwe bi dine min.

Şengul û Mengul: Baş e dadê.

Qazî: Neha jî kerem bikin herine mala xwe! Şêr û piling hûn jî rabin û gurê gewr bibin û bixine zin dana tarî ku çî caran sitem li kesî neke.

Şêr û piling: Belê ser çavan. [Şêr û piling gurî dikêşin û dibin. Gur dike hawar û girî]

Qazî: Dadgeh تمام bû hûn bi xêr û xweşî biçin.

[Mala Qazî tarî dibe û her kes ji nigargehê derdikevin. Paşê nigargeh dîsan li ser cihê Mam Salo û zaroyan rohnî dibe]

Mam Salo: Her wisan Şengul û Mengul hatine cem diya xwe. Bi hev re gelekî şad û dilxweş bûn. Dilê bizinê xweş bû ku çî tiştêkî bi serê her du karikên wê yên delalî nehatibû. Ev besê wê bû. Şengul û Mengul jî bi dîtina diya xwe gelekî dilxweş bûn. Zikê gurî, tarî bû û biheke nexweş û pişiyê jê dihat. Bi derketina ronahiyê, dayika wan jî li pêş çavên wan rawestî bû. Ev besê wan bû. Ji dilxweşiyê dikirin bifiriyana.

Eger Şengul û Mengul, weke di serî de gotibûn, bi gotina diya xwe kiribana û derî wisan bêraman ji her kesî re venekirana, ewê çî gurek wan nexwaribana. Lê dema mirov berî hizireke baş, her bi hêsanî, biryara kirekê bide û bi rindî li ser nehizire, dikare şaşiyên gelekî mezin bike. Divê mirov guhê xwe bide dayik û bavê xwe. Yan jî ewê bela bi serê mirovî werin. Mezina gotî "her kesek guhê xwe nede mezinan, pê ve tene du şaxên bizinan".

Çiroka me îro çû serî. Divê ez neha biçim.

Zaro 1: Mam Salo, tu dê sibêhî werî?

Mam Salo: Belê sibêhê ezê Çiroka Mahabadê ji we re bêjim.

Hebû nebû, hebû nebû

Zaro: Hebû nebû, hebû, nebû...

Mam Salo: Hebû nebû, hebû nebû, hebû nebû, rojek hebû...

Zaro: Hebû nebû, rojek hebû

[Bi vî rengî ji nigargehê derdikevin]

Dawî

Amadekar :
Kumanc Zengene

DESTANA ŞÎRÎN û FERHAD

B. Botanî

Ferhad, lawekî 18 salî ye. Kurê Hejarî hakimek ji hakimên Loristanê... Ew nehtê dixwînit, kevirên rengîn ji xo ra kom dikit û carnan navko, olî û koçkan di gel hevalan ava dikin. **Yakov** hostayê wî ye.

Şapûr, harîkarê hakim Hejarî ye.

Şîrîn, keçeka ermen e, Sih salî ye. Li koça mîr Xesroyî kar dikit. Ew bi xo berpirsîyara jinan e û geleka jîr û jêhatî ye.

Mîr Xesro, mîrekî zalim e. Jina wî mir û tinê kurek jê heye. Navê wî Şêro ye û ew lawekî mêvaz û har e. Mîr Xesroyî naxwazit jinê bînit. Ew bi jinên koçê ra jîna xo diborînit.

Şivan, bekoewan û rêgir e. Mişe çetên wî hene. Ew hemî diz û berûbir in û bizdanan karê wan e. Ew li çol, çiya û geliyan dijîn û rêka leşker û karwanan digirin.

Pîrê, jineka xapînok e û ji mîrî ra kar dikit. Ka çi li bajarî rûdidit an çi kesek li dijî mîrî dipeyivit, ew dibêjite harîkar û leşkerên mîrî. Mîr jî pere û diyariyan didîtê.

Rojekê Şîrîn di ber xwendegê ra diborît û şagirt temaşa lê dikin. Ferhad ji ciwaniya wê hiş di serê wî da namînit û Şîrîn her roj têtê bîra wî.

*Dilê min tev birîn e
Nexweş im çare nîn e
Of aman aman Şîrîn can
Ferhadê te me ez qurban*

*Ka rêka hevîna te
Ka derd û birîna te
Of aman aman Şîrîn can
Hêvya te me ez qurban*

*Te li min tarî kir jin
Ji çava albarit xwîn
Of aman aman Şîrîn can
Nexweşê te me ez qurban.*

Ferhad:

*Şîrînê xozî b' wê gavê
Şaşka min xwar biba
ser kofya te
Temberiya min biba
dosta porê te
Hawar e ez dîn kirime
ev dûriya te*

Dastanbêj: Şagirt pê dizanin û paşê hosta jî... Ferhad ji hevîna Şîrînê dîn dibit û ne ma pûte bidite xwendin û karê xo.

Yakov:

*Ho mezinê me Hejar,
Ferhad ji hevîna Şîrîno
Bûye nexoş û gêj û dîno
Hey rêzdaro, ez benî,
Delalê dîla Ferhad
Ez gorî ew ji hevîna wê
Bûye şeyda
Di serê wî da nemane
Hiş û sewda
Hey xoştivî û hêja
Delalê dîla Ferhad*

Dastanbêj: Li newrozê şivan û çetên xo têne cihên dewlemendan û zêr û xwarinê ji wan didizin û behra hejaran jî didin...

Şivan:

*Cil û xwarinê, bibe j' xo re,
Rebeno were Newroz e
Heçî ne l' ser e, her bê behr e,
Bêkeso were Newroz e*

Dastanbêj: Paşê şivan û şetên xo rêka xo digrin û ber bi cihên xo direvin berî ka leşker bêne wan...

Dastanbêj: Rojekê ahengeka mezin li koça mîrî têtê berhevkin. Jin û mey, muzik û sema derd û dermanê xelkê koçê bûn. Bi kêf û şanaziyan roja xwe derbas kirin.

Şivan:

*Mey û jin, mey û jin
J' bo xoşiya jîna me
Mey û jin, mey û jin
Dermanê birîna me*

Mîr, pismîr û arîkarên wan serxoş dibin û şerê hev dikin.

Ferhad:

*Bi Yezdanî ger nebînim
yara nazenînê
Ez ê bimrim ji derdê hevînê
Eman, eman, eman
ji kul û birînê
Ferhad im, ne şad im
tim bi şîn
Dîn im, nemînim ji hevîna Şîrîn
Eman, eman, eman
ji derdê rengîn*

Dastanbêj: Hejarî gote harîkarê xo şapûrî ku harîkariya Ferhadî bikit, da ku Ferhad bişêt nîzikî Şîrînê bibit. Şapûrî ji karekî ji xo ra li koça mîrî dibînit. U ji ber ciwaniya jinên koçê jina xo berdidit û ew ro, bi roj bû bi wezîrê mîrî. Hingê wî karek daye Ferhadî ku koçê ciwantir bikit. Carekê Şapûr, Şîrîn û nobedar têne hoda Ferhadî... Ew hemî ecêbmayî dimînin wî tiştên entîke ji koçê ra çêkirine.

Şîrîn:

*Hosta Ferhad
Ger tu kar dikî b' pere
B' ziv û zêr bike j' me re
Hey jîr û jêhatîyo, tu hosta yî*

Ferhad:

*Hey dilberê nazenînê
Ji bo te sînda
dixum b' hevînê
Delalê delalê, lê delalê
Jiyana te xoş bit û dilê te şad
Bila gorî te bit canê Ferhad*

Delalê, delalê, lê delalê
 Îdî min ne zêr divê
 û ne jî pere
 Tinê ji derdê xo ra
 dixwazim çare
 Delalê, delalê, lê delalê

Şapûr:

Lê Şîrîné ev Ferhad e,
 pishakimê Loristanê
 Ji dîtina te şad e,
 ey Şîrîna ciwanê
 Delalê, delalê, lê Şîrîné
 Jiyana wî bi endo,
 derd û şîr e
 Ew ji dûriya te
 bêzar û xemgîn e
 Delalê, delalê, lê Şîrîné

Ferhad:

Rast e ku ez
 pishakimê Loristanê me
 Lê ez ji bo xizmeta Şîrîné me
 Eman, eman, eman,
 hey mêvanan

Şîrîn:

Ez hevîna xo didime te
 hey Ferhado

Ferhad:

Şîrîné ez jî didime te
 bi dilekî şado

Pêkve:

Hey delal, delal,
 tu heval î

Şîrîn:

Ferhado ez gorî namê te me

Ferhad:

Şîrîn can eyvez im
 Ez xulamê te me

Pêkve:

Hey delal, delal, tu heval î

Şîrîné û Ferhadî biryara xo
 dane ku cot bibin. Şapûr û nob-
 edarên xo jî hevîna wan pîroz

dikin.

Dastanbêj: Ferhad bi neht, nexş
 û tiştên di ve koçê dixemilînt û mîr
 jê ra ahengekê berhev dikit. Zikreş
 li wê ahengê dibêjite mîr Xesroyî...

Zikreş:

Şerm e, tu mîr î
 û Ferhad xulam e,
 Şîrîné j' xo ra bîrî
 Ka çî bixwazî ez eywez im,
 mîrê tacdaro ez bi gorî
 Ez benî, mîrê pîrmêzin,
 tu delal î

Di cih da nûwek ji aliyê pîrê ve
 digehite mîrî ku Şivanî karwanê
 koçê talan kiriye. Wî jî leşkerên xo
 dişînite wî cihî ji bo kuştina Şivan.

Mîr:

Ey leşker û nobedara
 Yê ku serê Şivanî bînit,
 Dê dime deh zêra
 Ezê wî jî kîme wezîro

Dastanbêj: Nobedar û leşkerên
 mîrî dereng digehine cihê karwanî û
 jî bîrî birîndaran çî tiştêkî dî nabinin
 û dizivirin...

Mîr:

Koçeke ji min ra ava bike
 I' çiyayê Bêstûnê
 Lê ger te dirist ne kir
 dê j' te bistînim Şîrîné
 Ferhado, Ferhado
 xo berhev bike lo

Dastanbêj: Ferhadê reben jî
 bêgav bû ji lewra bi gotina mîrî
 kir...

Şapûr:

Ferhado hevîna Şîrîné
 bila l' bîra te bitîn
 Karê xo jî hew ke
 heya Şîrîn jî te re bitîn
 Ferhado, Ferhado,
 de ha j' xo hebe

Ferhad:

Ger çiyayê Qaf jî bitîn
 sanahî ye dîsan

Lê tîrsa min ew e
 Ku mîr Xesro derewîn derkevît
 û bite poşman
 Mamê Şapûr, Mamê Şapûr,
 sarahî ye

Ferhad:

Lêlê Şîrîné, lêlê dîné
 Ez evdalê te me,
 hey xemrevînê
 Hawar e bêkes im lê
 û dînalim jî derdê hevîné
 Canê te bernadim,
 heya gava mirîné
 Ez gorî de min nehêle bi tinê
 Heya ku sax bim li vê dîné
 Ez jî bo te me yara minê
 Şîrîné, nexoşê te me
 lê Ho ho hoho, de rabe sor-
 gulê

Ez mîrî me ho çav bi kilê
 Were were were were
 Bengiyê te me
 Ferhad im lê
 Şîrîné, lê Şîrîné
 Dil bi xem e

her ne şad im lê
 Şîrîné, lê Şîrîné
 Were were were were
 Te ez kuştim kofixwarê lê
 Şîrîné, ê Şîrîné
 Were bejindarhinarê lê
 Şîrîné, lê Şîrîné
 Were were were were
 Emê îşev li ku bin lê
 Şîrîné, lê Şîrîné
 Li benda te me delalê lê
 Şîrîné, lê Şîrîné
 Were were were were

Şîrîn:

Zikreş û dijmin gelek in
 De hay j' xo hebe ay li min
 Na êm, nayêm,
 nayêm, nayêm

Dastanbêj:

Paşê Ferhad û Şîrîn diçine
 telarê mîrî, li wêrê ahengeka
 mezin hebû. Serxoşine pev

diçin û jin jî direvin û xo ji derd
û bela rizgar dikin... Dîtra rojê
Ferhad diçite çiyayê Bêstûnê...

Ferhad:

Çiyayê Bêstûnê
silavên Yezdanî l' te bin
Ey bingehê ola mino

Çiya:

Ferhad can te çima
Şert b' Xesroyî ra kiriye
Ey zavayê gula mino

Ferhad:

Çiyayê pîroz ez bêgav bûme
Hey rewşa mala mino

Ferhad dest bi karê xo dikit, bi
sedan leşker û gundî harîkariya
wî dikin. Carekê Şîrîn têt nik wî.

Ferhad:

Hey kadizê, mîra çavmestan
Gorî te bit Ferhadê jar û dilko-
van
Şîrînê, Şîrînê tu delal î
Cana min î, lêlê çavmestê
Ronahiya jiyana min î,
xoşya min b' te tê
Şîrînê, Şîrînê, tu delal î
Hey rêka evîné, delalê
Dê xoşiyê vejînin
l' serê vê salê
Şîrînê, Şîrînê, tu delal î

Piştî hevdişînê... Şîrîn û Ferhad
diçine Kermensanê ji bo gewz û
sehranê... Şivanê rêgir jî rêka
wan digrit û rewşa wan têt did-
it...

Şivan:

Şîrînê ez aşiqê bejna te me
Hawar e
ji mej ve l' benda te me
Eman, eman, eman
birîndarê te me lê
Şîrînê ji dûriya te dîn bûme
Bê armanc û bêhevîn bûme
Eman, eman, eman
birîndarê te me lê

Şîrîn:

Şivano ji hevîna te
min Ferhad anî
Ev dê j' me ra ava bikite xanî
Tê da bijîn û binoşin
ji xoşiya canî

Şivan bi xoşhatina wan dikit û
vexwarinê didite wan. Gava ku ew
Şîrîn maç dikit Ferhadî di cih da
xencera xo dertînit û dibit şer. Şîrîn
û Ferhad xo rizgar dikin.

Ferhad:

Hey sorgula Loristanê
Gorî te bin hezar Ferhad amanê
He gulê, gulê, ez ji bo te me

Şîrîn:

Bilezîne divêt em birevin
Felek xayîn e nahêlît
em pêk ve bijîn
Lezê bike, lezê bike,
Ferhado cano

Rojekê mîr Xesro têt çiyayê
Bêstûnê û dibînit Ferhad dê karê
xo hew bikit. Û çiyayê Bêstûnê yê
bûye behîşteka rind. Xema xema wî
ye ku Şîrîn dê bite bûka Ferhadî.
Mîr dizivirite koça xo û ew dişinite
dûw pîrê ji bo harîkariyê. Pîrê jî
tête nik wî...

Pîrê:

Mîrê pirmezî çima rengê te
bûye zero
Eve gorî te me her û hero
Ez ji bo te me, mîrê tacdaro

Mîr:

Pîrê ji hevîna Şîrînê hewar e
Hingiv di devê min da
weke jehrê mar e
Eman, eman, eman
dil birîndar e
Eman, eman ji derdê hevîné
Jiyan ne jiyan e bê Şîrînê
Eman, eman, eman
dil birîndar e

Pîrê:

Mîrê delal dê çarekê
j' te ra bibînim

Jiyan û rewşa te pê vejînim
Ez ji bo te me mîrê tacdaro
Xesroyê pirmezî
dê xwîna Ferhêd birêjim
Û wî ji çiyayê Bêstûnê bavêjim
Ez ji bo te me mîrê tacdaro

Mîr Xesro bi dizî ve dêbabên
Ferhadî dikujit û bê ku kesek bi-
zanibit û pîrê li wêrê bu û paşê
gote xelkê ku hakim Hejar û jina
xo bi destê Şivanî hatine kuştin.
Paşê pîrê bi harîkariya leşkeran
diçite çiyayê Bêstûnê ji bo bedki-
rina rewşa Ferhadî.

Pîrê:

Hey dad û bê dad
Bila kore bim Ferhad
Rebeno, rebeno, jaro dilo
Gêjê bê xeber Şîrîniya mirîné
Mi j' te ra anî ay li minê
Rebeno, rebeno, jaro dilo

Ferhad:

Herê kî miriye hey pîra dil-
birîné
Xudê ne kit ku Şîrînê
Eman, eman, eman
bedbext im lê

Pîrê:

Xulîbsero miriye Şîrîn
Îroya bêdeng e li bin zemîn
Eman, eman, eman
tu bedbext î

Ferhad:

Şîrîn can, ezê çî bikim
bê te gula geş lê
Ez gorî biskên te ên reş lê
Hewar e, hewar e
malwêran im ezo
Kê dixwest mirîna Şîrînê herê
pîrê
Kê tu şandîye vê derê
Dayê pîrê, dayê pîrê
ay li minê

_____ Ji ber maye

33

GULLE!

Dîsan pirtûkeka "nuh" a Dr. İsmail BEŞİKÇÎ, belav bû. Rastî diviya bû ku ev pirtûk berî vê bi deh salan derketa. Lê weke gotî; weşanxaneyê bi navê komal, mîna pirtûka *Jenosîda Dêrsimê*, ya Î. BEŞİKÇÎ, vê pirtûkê jî, wînda dike û nade çapê. Î. BEŞİKÇÎ, mîna pirtûka xwe ya berê, ya wendabûyî, vê pirtûkê jî, dîsan ji têbînî û nivîsên binerên dide hev û ji nû ve dinivîse. Î. BEŞİKÇÎ, di vê pirtûkê de, behsa bûyêrê dike, ku li Kurdistanê haya kêma kesî jê bûye. *Bûyera kuştina 33 gundiyanê kurd li ser tixûbên Ecemistanê*. Generalê dagîrker Mustafa MUGLALI, li Wan, li Serayê (Ozalp), 33 gundiyanê bê-sûc û tewan, bi fermana serok-komarê demê, İsmet İNONU dide girtin û kuştin.

Dagîrkerên tirk, fars û ereb, bi wan sînoren xwe yê kîrîkirinê, ku li ser tijî mayin û bombe ne, dîsan jî nikarin tîkîliyên vî milletî ji binî ve qut bikin. Mayin û bombe tîr nake, vêca bêyî dilovanî dest davêjin her babet metod û azîneyên derveyî mirovahî. Terorîzm ji van metodan yek e. Ji bo birrîna ji ser tixûbê çûn û hatinê, vê qirîkirinê dikin. Heya deh salekê jî, ser bûyerê digirin. Çi kes newêre behs û kada vê bûyerê bike.

Ji ber nakokiyên di navbera hêzên burjûwa, weke Partiya Komar a Gelêrî (CHP) û Partiya Demokrat (DP) ya dema xwe nuh damezirî,

ev bûyer li nava parlamentoya Tirkîyê, ji devê parلمانên DP'yê, dertê holê. Di parلمانto'yê de, guftûgoyên parلمانên tirk li ser bûyerê çêdibin. Rojname hingê derbareyê vê bûyerê dinivîsin. Lê weke xwe dinivîsin... Generalekî bi navê Kenan ESENGİN vê bûyerê di rojnameyeka tirkî de, dinivîse û ew dîtinên xwe yê nerast, (bi rastî dîtinên fermî ên dewletê) weke rêzenivîs belav dike. Weke Î. BEŞİKÇÎ dibêje, "K. Esengin di vê nivîsê de, *veşartina rastiyê kiriye erka ser şan*."

Î. BEŞİKÇÎ li ser kir û fiilên dagîrkeriya Tirkîyê, bi berdewamî welê nivîsiye "Bu olay tek şefflik doneminin temel karakterini tek başına bellirleyebilecek guce sahiptir." Anku; ev bûyer, bi serê xwe tenê dikare karakterê bingehîn a serdema *şetê tenê* bihêne ber çavan. Generalê dagîrker, welê berdewam kiriye: "Sorgu ve muhakeme ne oluyormuş, hepsini oldurun, digerlerine ders olur" Anku; pirs û mehkeme çî ne, hemûyan bikujin bila ev ji yê mayî re bibe fêr û ders." Dîsan general Mustafa MUGLALI li ser çavdêr û serokê dadgir û dadgehan welê diqîre: "Sen bu işe karışma, ben emri yuksek yerden aldım, icab ederse seni bile yokederim." Anku; tu tîkîlî vî karî mebe, min ferman ji ciyê jorîn standiye, eger pêwîstî hebe ezê serê te jî windakim. Vêca Î. BEŞİKÇÎ li ser van gotinên

Orgeneral Muğlali Olayı Otuzüç Kurşun



Bilin Yönetimi, Türkiye'deki Uygulama: 5

dagîrkeran welê dibêje" *bu sozler tam anlamıyla somurgeci yönetimler-e has bir sozdur. Bu cumle tek başına Cumhuriyet doneminin, Kurdistan'daki uygulamalarını açıklama gucune sahiptir. İrkçı, ilhakçı ve somurgeci Kemalizmin, Kurdistan'daki uygulamalarının kısa özetidir.*" Anku; van gotinan, bi wateya xwe ya herî bingehîn, bi taybetî gotinên birêvebirinîyên dagîrkeriyê ne. Ev rist dikare bi serê xwe tenê kirinên hemû dema Komara Tirkîyê derîne meydanê ber çavan. Ev rist kurtebahseke kirinên Kemalîzma nijadperest, talanker û dagîrker li Kurdistanê ye.

İsmet İNONU ewçend dijminatîya gelê Kurd kiribûye, ku di salên 1960'î de, dema Turgut OZAL di avahiyeka teknîkî ya dewletî de serkarê alîkar bûye, dijminatîya wî û dewleta wî, ji hinde gotinên ji T. OZAL re gotî de jî, baş diyar bûye. T. OZAL pêşniyarekê ji Î. İNONU re kiriye, gotiye weke min li Amerîka xwendîye, em dikarin bi projeyeka pêşvebirinê, geliyê navbera Ferad û Çemê Amedê jî wisan pêş ve bibin. Î. İNONU bersiva T. OZAL dide, dibêje; "Ma ewê ala wan jî hebe?" (Binêre kovara TEORI, h 16, r 15)

Dagîrkeriya doliwgeriya tirk ewçend hov û dijminane ye. Pirtûka Î. BEŞİKÇÎ, bi navê **33 Gulle** - bireke mezin ji vê dijminatîyê bi belge û diyardan dibeste. ■

■ ■ Doktor Karlênê ÇAÇANÎ, serokê nivîsevanên kurd li Ermenistanê ye. Meha adarê, li Navenda Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan-YRWK'ê, bû mêvan. Roja 22'yê meha adarê, ser-nivîsariya kovara REWŞENê, hevpeyvînek li gel wî amade kir.


REWŞEN: Berî ku em derbasî hevpeyvîn, pirs û bersivan bibin, em hêvîdar in ku tu ji xwendewarên REWŞENê re, xwe hêj berfirehtir biafî nasîn. Li ser jiyana xwe, kar û xebat û vekolînên xwe, xwendewarên REWŞENê agehdar bikî.

ÇAÇANÎ: Ez sipasiya we dikim. Ez iro pir şa me, ku ez rastî kovara REWŞENê hatime û bûme mêvanê wê. Şadbûna min hîn bêhtir e, ku REWŞEN li gelek welatan û bi gelek zaravan belav dibe. Ez bi dil û ceger, vê kovarê digrim û dixwînim. REWŞEN ji bo yekbûna zimanê kurdî dikare karekî mezin bike. REWŞEN dikare piştgiirtina cenga gelê kurd bike. Li bin ala PKK'ê û bi serokatiya APO, ez di baweriya serkeftinê de dijîm. Gotina min a pêşî ev e.

Ez di sala 1930'yî de, li gundê Cercerisa Xopan, ya Elegezê hatime dinê. Ez di nav urf û çanda kurdî de mezin, kûr û fireh bûme. Li gel bapîrê xwe Çaçani û pîrika xwe Meyro... Kalikê min rind dîrok û çirokên kurdî zanibû. Parekî fêrbûna min ji wî ye. Her wiha bavê min Qaranê Çaçani, bi tor û folklorê kurdî re mijûl dibû. Ew yekemîn kes bû ku li ser Feqehê Teyran nivîsand. Du pirtûkên wî, tev helbestên Feqî ne. Min li Elegezê dibistana xwe gihan de serî. Paşê ez çûme Êrivanê, li wir ez tevîlî instîtuya dîrokî bûm. Cara yekemîn ku ez mîna serokê bajarvaniya kurdî sala 1955'ê xebitîm. Sala 1965'ê jî, min diktora xwe ya li ser pismamtiya kurd û ermenî - di sedsala 19 û 20'î de gihan de serî. Ez hingê, di zanistiya dîrokî de, bûme doktor. Ji biçûkatya xwe, min hez ji nivîsina kurdî dikir. Helbesta min a pêşemîn, di sala 1949'ê de, di Alfabe ya kurdî, ya Heciyê Cindî de derket. Navê wê *Sala Teze* bû.

Wê ez bêhtir rêdar kirim. Pişt re min hêdî hêdî dest bi nivîsinê kir. Pêşî min ji bo zarokan dinivîsî. Pişt re ji bo mezinan jî xebitîm. Berî ku ez belavokên xwe derxim, pir helbestên min hatin belavkirin. Di rojnama *Riya Teze*

ŞOREŞA DI BIN RÊBERIYA DEWLETA TIRKAN TENGAZIYÊN



Karlênê ÇAÇANÎ

de, sala 1960'î de, pirtûka min a *Ehmed Egîd*, ya ji bo zarokan çap bû. Sala 1961'ê, çapa duwê çap bû. Ew jî ji bo zarokan bû. Di wan de ez evîna xwe ji bo biçûkan xuya dikim. Pir evîna zarokan kişand û zû belav bû. Ez pir şa dibûm. Dema min dibihîst ku zarok helbestên min ji ber dixwînin. Vê yekê bêhtir evîn di dilê min de çêkir û ez di nivîsinê de, bi pêş de birim. Piştî van pirtûkên min yek li dû yekê çap bûn. Helbet pir bûn. Ya pêşî ji bo mezinan çap bû. Navê wê *Gul* bû. Dîsa jî para zarokan tê de hebû. Lê bingeh ji bo xwendekarên mezin bû.

Pirtûkên min gelek in. Mîna *Zinê, Zerê, Azê*... Min navê wan bi kurdî danin. Her wiha navê zarokên min jî ew in. Mîna her nivîsevanekî, tiştê ku min li nivîsê gur kir, şerkariya kurdan... Mîna Dimdima Erebe Şemo û Hewara Hacıyê Cindî, şer şerkariya kurdan li hevberî romê-tirkan. Eflî Mamedof hîna xweştir nivîsî. Li ser şerê Dêrsimê... Helbestên min li ser welêt in, li ser civakê ne. Ji ber ku evîna welêt agir berdida dilê min... Wê demê gelê kurd di şer de bû. Her wiha helbestên min jî li ser serxwebûna Kurdistanê û şerê gel bû. Bi wan nava min dinivîsin.

KURDISTANÊ SEROK APO DE XISTIYE NAV MEZIN

REWŞEN: Di vê dema dawî de, dewleta tirk zimanê Kurdî serbest kiriye. Ev e heftê sal e, serbest nekiribû, îro serbest kiriye. Gelo li gor we sedem çî ye ku di vê demê de vê kirê kir?

ÇAÇANI: Min di serî de jî got. Di nêrînên min de, şerkariya gelê kurd bi serokatiya APO, hiştiye ev yek bibe. Lê em neyên xapandin. Bila dijminê tirk baş zanibe, em zanin ku ev politîka wî ye. Îro Ozal û parلمانên wî vê pirsê dihonin. "Demokrat in", ta ku xwe bigehînine bazara Avrûpî. Di texmîna min de, salek-dudo, dema kurd helbest û folklorê xwe îcra bikin, nasnadina welatê xwe û dîroka xwe bikin, wê dîsan tirk vegeerî kuştin û qirkirin û girtinê! Ewê vê ji xwe re bike hincetek û bêje min zimanê wan serbest kir niha jî doza welatê li me dikin. Lê em berî vê serbestkirinê, doza welatê xwe dikin. Ev politîk li hevberî ermenan jî dane meşandinê. Piştî ku nivîsevan û edîtoer ermenan nivîsin, zivirîn ew girtin û dest bi qirkirina ermenan kirin. Guneş jî xistin stûyê kurdan de. Gotina min ew e ku kurd bi vê politîkê neyêne xapandin. Giring e em li hevberî vê yekê şiyar bin. Eger hinek bêjin em'ê çanda xwe pêş de bibin û ... nizanîm çî... Ez dibêjim; na bes e. Ez dibêjim em hîn bêhtir xwe li dora şerkariya PKK'ê û APO bidin hev heyânî serxwebûnê. Lewra ev serbestkirina zimên bi karên wan hatiye pê û ev mizgîniyeka doza serxwebûnê ye.

REWŞEN: Dibe ku dewleta tirk hinde hozan û rewşenbîr bi vê serbestkirinê re bikire û li dijî *serbestiya rastîn* û şoreşê bide xebitandin! Hûn vê yekê çawa dibînin?

ÇAÇANI: Rast e û dibe. Min got ku dixwazin bi vê yekê keleman li pêşiya şoreşê biafirînin. Dikarin bi çand û hozan û tiştên welê, rewşenbîrên xwe firos bikin û bidin xebitandinê. Ji ber ku iro şerkariya kurdan gihaye bilbûnekê. Ewê bigihê amancên xwe. Le gerek e em neyêne xapandin. Tirkan bi dehan caran kurd kirine kelem li pêşiya şerkariyê. Hema niha tirk nîkare vê yekê bike. Ji ber ku me êdî xwe nas kiriye. Giring e ne tenê APO bixebite. Giring e, em jî, hemû rewşenbîr û hozan xwe li dora vî şerî bidine hev. Ne ku yek ji me li Parîsê, yê din li Swêdê û li Mosko rûnên û em ji xwe re binivîsin. Ev nayê pejiwandin. Giring e em bibine yek û yekîtiya xwe fireh bikin. Li dora şerê PKK'ê bicivin.

Xwînmiyîya dijminan min tanî zimên. Hem jî kurdên xwe-firoş, min ew di helbestên xwe de dihetikandin.

Nivîskarên ku ji bo welatê xwe, xwe dişewitînin, ez li gel wan im û ji wan im. Her destanake pêşmergeyan û karekî wan min şa dike. Dema xwîna gelê min dirijê, mîna ku ji dilê min dirije. Ev, hêrs û kel dide min, ku ez bêhtir binivîsim. Ez dixwazim bi gotinên xwe şerê dijminan bikim. Ez ji welatê xwe Kurdistan dûr im. Lê bi dil, hiş û ramanên xwe, bi xame û nivîsarên xwe, ez nêzik im. Ez bi wan li wir im, li Kurdistan im.

Di nerîna min de, giring e hemû nivîsevan ji bo doza millê xwe binivîse. Îroj gelê kurd bi mêranî û egîdî li bakura Kurdistanê di bin rêberiya Partiya Karkerên Kurdistan-PPKê de têdikoşin. PPKê Navekî buha ji bo Kurdistanê anîye pê û li cihanê belav kiriye. Ji lewra giring e her nivîsevan, li gor derfetên xwe li ser vê egîdiyê binivîse û tevayî cihanê re bide naskirin. Bi her zimani, niha em bi xwe li Ermenistanê ser vê yekê dixebitin. Pirtûka mîna duduyan, bi zimanê ûrisî sala 1970, *Keske Sor* 1983'î derket. Amanca min ji wî navî ku gelê rûsî

nas bike ku *Keske Sor* tiştê xuya ye di folklorê me de. Niha jî ez li ser pirtûka xwe dixebitim ji boyî zarokan e. Di sala 1922'î de wê pirtûka min bi zimanê rûsî derket.

Îroj xebateke teze ji kurdan re derketiye. Newroza vê salê şahiyên mezin bi xwe re anin. Ku bi serihildanan hate pîroz kirin. Şoreşa Kurdistanê di bin rêberiya serok APO de, dewleta tirkan xistiye tengasiyên mezin. Eger zimanê kurdî bête pejiwandin, ev mizgîniya serkeftina şoreşa me ye. Ji lewra jî, niha hemû ramanên min ji bo azadiya Kurdistanê û serbestiya gelê kurd e. Îroj Kurdistan girîng e ava bibe. Eger dereng ketibe jî, îroj gerek e, li kîjan perçê bejî, bila ji bo me welateke serbixwe û azad ava be. Pirsê otonomiyê ji bo me ne çare ye. Ji ber ku îroj tevayî cihanê me nas dike. Şerkariya me bûye pîr-seke nava koma mîletan. Ez wekî dîroknasek otonomiyê ji bo me napejirînim.

REWŞEN: Hûn ku li Ermenistanê, di Akademiya Dîroknasiyê de, di beşê kurdzaniyê de dixebitin, ji kerema xwe re hûn karibin hinekî çêla wê xebatê bikin.

ÇAÇANI: Ez, ji sala 1969'ê di Instutiyê de dixebitim. Xebata min li ser tîkiliyên di navbera kurd û ermenan de ye. Ez xuya dikim ku pîsmariya me, vedigere sedsalên kevin. Dîsan ji li ser toreya ermenan, dermafê çand û bajarvaniya kurdan. Li ser van tiştan min pirtûka xwe cilda 1'ê bi zimanê rûsî û ermenî, nivîsiye. Min tê de, li ser çand û toreya kurdî nivîsiye. Neha jî ez cilda 2'ê amade dikim. Ez dikarim bêjim, tu mîletan, mîna millê ermen li ser çanda kurdî ne sekîniye. Sala 1860 li Amedê pirtûk çap kirin û dibistan ji bo zarokan vekirin. Ew dibistan jî bi zimanê kurdî bûn. Zarokê ermenan jî tev yê kurdan dixwendin. Vê carê zarokên ermenan jî bi kurdî deng dikirin. Gelek dîroknasên wan ên mezin li ser kurdan nivîsine. Mîna Qomîtas, Xaçatûr Abovyan. Wî bi xwe tîkiliyên kurd û ermen di pirtûka xwe de daye xuyakirin. Li ser çand û dîroka Kurdan disekine. Pirtûka wî bi navê *Kurd-êzdî* ye.

Tîkiliyên kurd û ermen di şerkariyê de ye. Tîkiliya wan di dîrokê de, li hevberî romê [tirkan] ye. Dema ku tirkan dixwestin qira ermenan binin, kurdan ew parastin. Bêhtirî 60 hezar mal hebûn. Her weha kurd û ermen bi hev re li dijî tirkan şer kirine. Ji sala 1914-15 heya 1936.

Xebata min di Akademiya de ev e.

Pirtûka min ji 250 rûpelî ye. Amade ye ji çapkirinê re. Li ser mîrxasiya Dêrsimê ye. Bi zimanên kurdî û ermenî ye. Pirtûka min a duwê 750 rûpel e. Ew ji li ser tîkiliyên di navbera kurd û ermenan de ye. Wekî din li ser rojnâmên ermenan ku der mafê çanda kurdî de deng kirine, ez dixebitim. Berhemên min li ser dostaniya kurd û ermenan in. Şeş pirtûk in û bi zimanê kurdî, ermenî, gûrcîkî, rûsî ne. Bi almanî û erebî jî çap bûne. Ez REWŞEN jî van ber-hemên xwe bêpar nahêlim.

REWŞEN: Di gotina we de navê Heciyê Cindî û Alfabe derbas bû. Dikarî hineka dinê li ser vê yekê rawestî?

ÇAÇANÎ: Ew pirtûk jî bo dibistanan, ji bo dersxana 1 û 2'yê bû.

REWŞEN: Weke di axeftina we de xuya bû, ku hûn di nav malbateke welatparêz de mezin bûne. Malbateke ku tore û çanda kurdî li balê giranbûha bûye. We Kurdhezî û torevaniya xwe ji wir wergirtiye. Ji bilî van sedemên bingehîn, jî derxistina we ya ji dîrokzanî û nivîsevaniyê çi hene?

ÇAÇANÎ: Weke min got, di serî de bapirê min, dema ku ji min re çirok û serpêhatiyên kurdan digot, ew di dilê min de rûniştin. Bavê min jî parek da min. Lê ya girîng ew e kû mirov xwedî meraq û şahî be, ta ku mirov karibe binivîse û bibe hozan û dîrokan. Ev li cem min peyde dibû. Piştî re hikarî tîn. Mîna şerkariyak kurdan, xweşbûn û ciwaniya Kurdistan, bedewbûna û keç û xortên kurd, zengînûna çand û folklor... Dîsa berhemên nivîsevanan, hikariya wan hene. Mîna Şivanê Kurd a Erebe Şemo. Hikariyêke mezin li ser min kir. Her wiha afirandinên nivîsevanên Ermenistanê yên mezin... Lê dîsa ez dibêjim girîng e di dilê min de bingeh hebe.

REWŞEN: Anku mirov dikare bibêje ku ne tenê hikariya nivîsevanên kurd li we bûye. Hikariya ûris û ermen jî heye. Gelo ji bilî hikariyê, çi alîkariyêk jî dikirin?

ÇAÇANÎ: Belê helbet alîkariya wan hebû. Hema bêhtir hikariya nivîsevanên kurd bû. Mîna Eminê Evdal, Erebe Şemo, Casimê Celîl... Wan li ser min hikariyêke mezin hiştine. Niha jî ger ez pirtûkên nuha da dikevim û dixwînim, ez nalebitim, ew dîsa jî di dilê min de cih digirin.

REWŞEN: Îro Kurdistan ne serbixwe û azad e. Ku mirov tê de serbest binivîsîne. Lê hêla din, hûn bi şahiyêke mezin hatine ser nivîsina xwe. Gelo we çi çetînî û dijwarî dîtin?

ÇAÇANÎ: Belê, rast e. Ne tenê ji bo min, lê belê ji bo hemû nivîsevanên kurd, çetînî û dijwarî pir hebûn û hîna jî berdewam e heye. Eger welat û xakeke aza tunebe, wê sedî sed çetînî bêne dîtin. Eger mirov serbest nenivîse û serbest çap neke, helbet dijwarî ye. Neha li Ermenistanê salê mafê çapkirina 6-7 pirtûkan jî me re heye. Ew çapkirin jî girêdayê kaxezan e. Kêmayî jî ji vê hêlê heye. Li Sovyetê, tengaya kaxezan heye. Neha em derbasî qanûna *xwexwedîtiyê* bûne. Yan

Teze, hemû rojnemeyên din... Neha hin rojnemeyên ermenan û rûsan hatine hatine girtinê ji ber ku nikarîbûn xwe xwedî bikirana. Rojnema Riya Teze qanûna *xwexwekirinê* jî bo wê hinekî sist e. Ji ber ku rojnema kurdan ya tenê ye û dewleta kurdan jî tune ye ku alîkariyê bike. Vê carê Riya Teze nivê sixletê dide û nivê din dewlet dide.

REWŞEN: Gelê Kurdistan jî pêşî êşa perçebûn û jihevûnê dikşîne. Hûn jî hinekî durtî Kurdistanê ne. Gelo vekolînên we

*Li hêlekê kurd, li hevberî kurdan derxistin.
Li hêla din jî, kurd û ermen li hevberî hev derhanîn. Ji ber ku her demê, fîrsa tirkan jî van milletan hebû, ku doza welatekî bikin. Tirkan digotin ev der xaka tirkan e û nabe çi gelên din lê bijîn. M. Kemal bi xwe ev gotin got: *du kulên binçengên me hene; kurd û ermen...* Edfî şer derxist meydana. Bi destên çend axayên kurd, gelek civandin ser hev. Di dîrokê de xuya ye: *Alayên hemdîlyê...* Ew jî kurdên xweffiroş bûn ku tirkan ew li hevberî ermenan dane xebitandin. Vêca jî her du aliyan ve dihatine kuştin. Belê, nêzîkî milyonek û niv ermen qir bûn. Ew jî îspat li cem min xwe hene ku ev bi destê tirkan çebûne. Eger şer di nava kurd û ermenan de hebû jî, romê (tirk) ew tişt jî xwe re kir ma ne û pê hate ser ermenan. Anku çi tank û topên kurdan tunebûn ku pê ermenan qir bikin. Dibe ku çend axayên xwe firotibin û li hevberî ermenan, fevî tirkan ketibûn şer de. Lê dewleta tirk ev tişt bi pîlan û kone danîbû rê û ev pîlan bi destê parlamenê wan hate honandin. Vî tiştî bi kurdan jî kirin. Sala 1914-1915'yê, milyonek û du sed hezar / 1 200 000 kurd hate kuştin.*

jî girîng e em bi xwe çap bikin û belav bikin. Lê berî neha, dewletê, ev tişt dikir. Lê neha na! Tengaya aborî heye. Ji bo wê bar hemû dikeve ser milê nivîsevan.

REWŞEN: Gelo ev rewşa astengiyê li civata kurdên Sovyetê, li pêşiya pêşveçûna toreya kurdî astengek dernahêne?

ÇAÇANÎ: Belê ne tenê ji bo çanda kurdî, lê belê ji bo çanda ermen û rûsan jî ev zorî heye. Ji ber ku qanûna *xwexwekirinê* jî bo hemû milletan e û wê hikariyê bi nebaşî bigehîne toreya wan, nexasim ya kurdî. Ji ber ku welatê me tune ye û rewşa me hin dijwartir e. Dîsa yên din, pir-hindik dikarin tişteki bikin û tore û çanda xwe bi pêş de bibin. Lê rewşa kurdan wê pir dijwar be.

REWŞEN: Ev hikarî wê li ser rojnemeya ya Riya Teze jî hebe..?

ÇAÇANÎ: Heye! Ne tenê rojnema Riya

tenê ji bo kurdên Sovyetê ne, yan jî ji bo tevayê Kurdistanê ne? Ger ji bo tevayê welatê e, ew tixûbanan çendî bend û astengan jî bo vekolînên dîrokî û ramyarî derhanîne?

ÇAÇANÎ: Belê, min li jorê jî got. Vekolînên me jî bo Kurdistanê ye. Ne ji bo kurdên Sovyetê tenê. Min bi xwe pir hindik helbest li ser Ermenistanê gotine. Lê melem û kelam e ji bo tevayê Kurdistanê ye. Ya min jî, ji bo azadiya kurdan e û yekîtiya Kurdistanê ye. Li ser şer ji bo rizgarbûna welat e. Pirsên me ey bûn. Gerek e em neyên xapandin. Iro jî pîrsa me yekîti, serxwebûn û azadiya Kurdistanê ye.

REWŞEN: Şoreşa Oktoberê pir alîkarî da pêşketina civakên gelê Sovyetê. Bi tevayî para gelê kurd û bi taybetî jî para kurdên Sovyetê jî vê alîkariyê

çi bû?

ÇAÇANI: Ez dikarim bêjim ku ji roja pêşî de, dema ku Partiya Komunîstê Ermenîstanê hate ser karesîtiya welat, gelek alîkarî û destek da pêşveçûna tore û çanda kurdî. Gelek biryar ji pêşketina bajarvanî û civaka kurdan, hem ji civînên mezin ji bo vî tiştî çêbûn. Tiştê min xwendiyê ku heyani sala 1930'yê milletê Ermenîstanê bi zimanê kurdî diaxivîn. Mirovên nivîsevan û zana rê ji bo vî

çêbibe, wê doza welatekî li me bikin û wê tirk karibin wan li dijî me bidin xebitandinê. Ew şaşîtiya wan îroj xuya dibe. Ne tenê milletê kurd, yê ermen jî pir koçber kirin. Îro dîsa ew alîkarî heye. Tiyatro, radyo, pir navendên çandî hene. Pirtûkên kurdî têne çapkirin. Pir komên folklorî hene.

REWŞEN: Di dîrokê de, desthilatdarên li herêmê, milletên kurd û ermen pir bi hev êşandine.

xuya ye: *Alayên Hemidiyê...* Ew ji kurdên xwe- firoş bûn ku tirkên ew li hevberî ermenan dane xebitandinê. Vêca ji herdu aliyên ve dihatine kuştin. Belê, nêzîkî milyonek û niv ermen qir bûn. Ew jî îspat li cem min bi xwe hene ku ev bi destê tirkên çêbûne. Eger şer di nava kurd û ermen de hebû jî, romê [tirk] ew tişt ji xwe re kir ma'ne û pê hate ser ermenan. Anku çi tank û topên kurdan tunebûn ku pê ermenan qir bikin. Dibe ku çend axayên xwe firozbûn û li hevberî ermenan tevî tirkên ketibûn şer de. Lê dewleta tirk ev tişt bi pîlan û kone danibû rê û ev pîlan bi destê parلمانên wan hate çêkirin. Vî tiştî bi kurdan jî kirin. Sala 1914 - 1915'yê, milyonek û du sed hezar 1 200 000 Kurd hate kuştin. Îro jî, vê yekê dikin. Tirk li hêlekê Iraq li hêla din... Amed, Wan, Qers, Dersim, Helebçe û gelek cihên din. Gotina min, tiştê ku dijmîn bi serê kurdan kiriye Mûsolînî jî ev tişt nekiriye. Ev rengeke nuh ji faşîzmê ye. Faşîstê Saddam, faşîstê faşîzmê ye. Ez dîrokzan ezê guneh jî bixwazim. Anku her demê dijmîn bi me û ermenan listine. Gunehê gelê kurd tiştêk tune.

REWŞEN: Gotina "tirk" gelek caran di çîrok û helbestên kurdî yên kevin de derbas dibin. Nêha we jî gelek caran ev gotin gotin. Ev jî ber wê yekê ye ku tirk pir zilm û zordariyê kirine. Loma zilm û zordestiya împara-toriya Romê (Latîn) pê ve girê dane û jî tirkên re jî gotine "rom". Hûn ser vî tiştî dikarin hinde diyardanên berferehtir bikin?

ÇAÇANI: Belê sedî-sed rast e. Nêha 90 rengê stranên kurdî hene ku gotina "romê" tê de heye. Li ser zilma romê ye. Anku zilma tirkên. Me jî wan re digot *romreş*.

REWŞEN: Weke em dizanin, di destê kurdên sovyetê de radyo û rojnâmeyek serbest heye. *Radyoya Erîvanê* û rojnâmeya *Riya Teze* ye. Tevî ku folklorê kurdî parastine, dîsan xuya ye ku ev parastin di nav sînoran de maye. Bi taybêfî radyo... Gelo nedikaribûn hîn bêhtir rola xwe bileyîstana? Ma di warê kar û barên nasandina kurd û Kurdistanê de çi bend û asteng hebûn li pêşîya wan?

ÇAÇANI: Na tu bend û rê li pêşîya me demeketin. Şerkariya kurdan dihatê ziman. Demeke navbera tirk û rûsan xweş bû. Paşê dema Stalîn, mirov li ser kadroyên radyo û rojnâmê hebûn. Lê neha em aza ne. Em dinivîsin û dibêjin jî. Demokratî heye.

REWŞEN: Berê jî demokratî hebû. Lê tu ya niha çawa

Îro şerkariya gelê kurd, bi rêberiya serokê PKK'ê Abdullah OÇALAN dibe. Giring e hemû kurd li dora wî xwe bidine hev û li dijî dewleta tirkan şer bikin. Li gora min Serok Apo di serî de dixwaze ku hemû kurd ji bo serxwebûn û azadiyê bixebitin. Ez sedî-sed û heya dawiyê bi vê gotinê re me. Li başûra Kurdistanê îroj pirs gelekî dijwar e. Ji hêla ramyarî û leşkerî, îroj Amerîka li Iraqê xistiye. Kurd jî ketine doza azadiya xwe. "Amerîka dixwaze alîkariya me bike!" Pirs ew e; gelo ev heyani ku derê rast e? Ez bi xwe bi vê yekê ne bawer im. Ne tenê Amerîka, welatên din jî, mîna Frensa, Îngilîz û hwd. Ev politîka wan e ne tiştêkî din. Giring e kurd şiyar bin û neyêne xapandin. Giring e lez nekin, ber bi otonomiyê de neçin, heyani Serxwebûnê şer bikin. Giring e ne Telebani û ne Barzani li ber dahola Amerîka dilanê nekin. Giring e îroj welatek serbixwe çêbibe. Ev li başûr be, li bakur be, li rojhilat be, çi cudahi nîn e. Yê giring avabûna welateke serbixwe û azadiya netewî ye.

tiştî vekirin. Ew ji pêşketina çanda kurdî û bajarvaniya Kurdan bû. Miroveke mezin hebû Agop Qazaryan, hîgî ku me jê hez dikir me jê re digot Apo... Ew pir xebitî. Pitûka xwe bi navê Emis (roj) belav kir. Ji bo pêşketina toreyê kurdî bû. Pir dibistan jî vekirin ji bo zarokan. Her weha ku heta kadroyê kurdan bi xwe çêbûn. Mîna Erebb Şemo. Pêşî Rîya Teze bi xwe ermenî [ziman] bû. Vê paşiyê Erebb û Emînê Evdal, Heciyê Cindî, Casimê Celîl, her weha hêdî hêdî derketin û bi pêşketin. Belê, alîkariyek bû ji bo me. Lê dema Stalîn de ev tişt hate birînê û hemû kêm bû. Hem jî parek ji xelkê me koçber kirin ber bi hêla Kazaxîstanê ve. Pir kesên me li wir qir bûn. Li gorî texmîna min ew, wê demê weha mijûl dibûn, ku digotin gelê kurd li ser sînorê Tirkîyê ye. Eger şerek

Di nerîna we de; "ermen jî bo pêşketina çand û toreyê kurdî pir xebitîye û westaye jî". Sedem çi ye?

ÇAÇANI: Rast e di dîrokê de xuya ye. Ev tişt, di dema Siltan Hemîd de, M. Kemal, Ewren û îroj jî Ozal, vê politikê dimeşînin. Her demê xwestine ku gelê hundirê navçeyê bi hev bidin mijûlkirin. Ji wan gelan mirovên sexte li hevberî wan derxînin. Mîna ku li Dêrsimê kirin... Ji hêlekê, kurd li hevberî kurdan derxistin, li hêla din, kurd û ermen li hevberî hev derxistin. Ji ber ku her demê tîrsa tirkên ji van milletan hebû, ku doza welatekî bikin. Tirkên digotin ev der xaka tirkên, digotin ev der xaka tirkên e û nabe çi gelên din lê bijîn. M. Kemal bi xwe ev gotin got; *du kûlên bin çengên me hene; kurd û ermen...* Edî şer derxist meydanê. Bi destê çend axayên kurd, gelek civandin ser hev. Di dîrokê de

dibînî?

ÇAÇANI: Ya berî niha demokrati li ser kaxezê bû. Mafê axaftinê ji bo ramiyariyê ji me re tunebû. Qedexa bû ji bo me. Lê neha em li ser şer û şehidan dibêjin. Li ser şarkariyê û *Serok Apo* dibêjin û dinivîsin. Lê dîsa ne cûrê demokratiyê ye. Tengayî û kêmanî di hêlên aborî de pirin.

REWŞEN: Gelo we dikaribû di ser sinoran re têkiliyên xwe bi nivîsevan û helbestvanên Kurdistanê re çêbikirana?

ÇAÇANI: Belê me bi xwe çêdikirin. Bi Hejar re, bi Goran re, bi Qedîrcan re... Girêdanên me bi hev re hebûn. Ew ji dihatin Sovyetê. Berhemên me jî digihane hev. Lê, iro li başûr û li rohilata Kurdistanê bi tipên erebî dinivîsin. Li Sovyetê bi tipên kirilî û latîni. Li bakur û Rojavaya Kurdistanê, li Awrûpayê bi tipên latîni... Ev tişt astengek e li pêşiya berhemên hev bibînin û bixwînin. Girîng e em tev bi tipên latîni binivîsin ta ku em bi hev re çand û toreya xwe li pêşxîn û bajarvaniya xwe bi cihanê bidine naskirin.

REWŞEN: Hûn li ser vê pirsê, li ser pîrsa zaravan çî dibêjin? Anku bi bîr û bawerîya we, zîmanê yekgirtî yê nivîsinê dê ji çî rîyan derbas be û were holê?

ÇAÇANI: Ewê zarava kurmançî be.

REWŞEN: Lê zaravên soran, dimil û yên mayî?

ÇAÇANI: Soranî, ew jî zaraveka kurdî ye. Gelê me, li başûr û li rohilata welatê me, pê dihaxîfe. Lê li bakur û li her sê parçên dinê û li Ermanistanê, bi kurmançî dihaxivin. Anku bêhtirî sê parê Kurdistanê pê diaxivin. Ji lewra wê ew zarava soranî û zazakî wê bimînin û nayên jibirkirinê, belê wê kurmançî sertaca wan be.

REWŞEN: Di nerînen we de, hey-anî çî cihê hikariya kultura netewên serdest li ser me heye? Hûn vê rewşê çawa dibînin?

ÇAÇANI: Belê tevî ku welatê me tune ye jî, dîsa folklorê me zengîn e. Iro dijmîn ji me didize. Li Dêrsimê li Qersê, dewleta tirk jî didize. Lê hikariya erebî li ser gelê me heye. Li Sovyetê, wekî em hatine wir em hîn weke xwe ne. Paqij û zengîn in. Dibe ku me hikarî li dora xwe kiriyê. Lê em jî wan nestandine. Ji rabûn û rûniştinê bigre, hey-anî saz û helbest û zewacê... Tev kurdî ne û li gorî qanûnên kurdan e.

REWŞEN: Maksîm Gorkî dibêje: "Ger te bivê dîroka milletekî nas bikî, folklorê wî nas bike." Anku li toreya wî binêre. Hûn rastiya vê gotinê di dîroka Kur-

distanê de hetanî ku derê dibînin?

ÇAÇANI: Ev pîrseke xweş e. Pir rast e. Girîng e mirov ne li ser folklorê tenê bisekine. Ya girîng ew e ku mirov wê pêş de bibe. Belê mirov bide hev û bicivîne, biparêze. Lê gerek e em bi pêş de bibin, ta ku em wê bigehînine gelê cihanê. Divêt ku çand di xelekên teng de nemînin. Ew jî di-kevin ser nivîsevanên kurd ku vê pirsê bilind bikin. Neha li Ermanistanê li ser vê pîrsê tete sekinandin.

REWŞEN: Di Kurdistanê de

Gelê me kurd e û welat jî Kurdistan e. Tuneye "Êzîdistan" yan jî "Misilmanistan" Kurdistan heye! Weke ku di dîrokê de xuya ye, di sed sala 7'ê de, sala 639'ê ereban êrîşî rohilatê kirine. Û bi zorê, bi zora şûrê ola misilmanîyê derbasî nav Kurdistanê kirine. Parekî ji kurdan ev ol nepejrandine û li ser ola xwe mane. Bi navê xwedayê Yezdan mane. Loma ji wan re hate gotin: Êzîdî. Mirovê ku vê bike pîrs û problemek û pê gelê me jî hev bixe, ew kes dijminê gelê kurd e. Sedî-sed ji dijminan têt jimartin.

bêhtirî olekê (dîn), ol hene. Her weke di parçeyên din ên Kurdistanê de, li Ermanistanê jî êzîdî hene. Weke dîrokanekî hûn, vê yekê çawan dinixînin? Hinde hêz û hewilkar dixwazin vê pîrsê bikin sedemek ku pê gelê me dîrî hev bixin! Nerîna we li ser vê yekê çî ye?

ÇAÇANI: Ez bi xwe vê nakim pîrs û problem. Gelê me kurd e û welat jî Kurdistan e. Tuneye "Êzîdistan" yan jî "Misilmanistan" Kurdistan heye! Weke ku di dîrokê de xuya ye, di sed sala 7'ê de, sala 639'ê ereban êrîşî rohi-

latê kirine. Û bi zorê, bi zora şûrê ola misilmanîyê derbasî nav Kurdistanê kirine. Parekî ji kurdan ev ol nepejrandine û li ser ola xwe mane. Bi navê xwedayê Yezdan mane. Loma ji wan re hate gotin: *Êzîdî*. Mirovê ku vê bike pîrs û problemek û pê gelê me jî hev bixe, ew kes dijminê gelê kurd e. Sedî-sed ji dijminan têt jimartin.

REWŞEN: Di nerîna we de to-reya kurdî gihaye ku deverê? Di çî rewşê de diji? Li gorî pêşveçûnên to-re û çandên milletên din, ya kurdî di kîjan koçberê de ye?

ÇAÇANI: Di çî cûrî de ye ez nikarim bêjim, lê ez dikarim bêjim ku em jî wê xelesa xwe yî teng derketine û me gavek bi pêş de avêtiye. To-ra me ketiya nav toreya orta milletî. Iroj çanda me li Amerika, li Ferensa, li Rûsiya, li her derê hatiye naskirin. Lê girîng e hin bi pêş de bibin.

REWŞEN: Iroj li bakura Kurdistanê şerekî çekdarî heye. Hûn dîrokan çawa li ser çarekirina pîrsa netewa Kurdistanê dinêrin?

ÇAÇANI: Iro şerkariya gelê kurd, bi rêberîya serokê PKK'ê Abdullah OCA-LAN dibe. Girîng e hemû kurd li dora wî xwe bidine hev û li dijî dewleta tirkan şer bikin. Li gora min *Serok Apo* di serî de dixwaze ku hemû kurd ji bo serxwebûn û azadiyê bixebitin. Ez sedî-sed û heya dawiyê bi vê gotinê re me. Li başûra Kurdistanê iroj pîrs gelekî diwar e. Ji hêla ramiyari û leşkerî, iroj Amerika li Iraqê xistiye. Kurd jî ketine doza azadiya xwe. Amerika dixwaze alikariya me bike! Pîrs ew e; gelo ev hey-anî ku derê rast e? Ez bi xwe bi vê yekê ne bawer im. Ne tenê Amerika, welatên din jî, mîna Frensa, Îngilîz û hwd. Ev polîtîka wan e ne tişteki din. Girîng e kurd şiyar bin û neyêne xapandin. Girîng e lez nekin, ber bi otonomiyê de neçin, hey-anî Serxwebûnê şer bikin. Girîng e ne Telebanî û ne Barzanî li ber dahola Amerika dîlanê nekin. Girîng e iroj welatek serbi-xwe çêbibe. Ev li başûr be, li bakur be, li rojhilat be, çî cudahî nîn e. Yê girîng avabûna welateke serbixwe û azadiya netewî ye.

REWŞEN: Gelek rewşenbîr hene ku vekolîn û mijûlbûna xwe bi rewşenbîrên dewletên serdest ve girê dane. Ji lewra tu rêberî ji bo pêşveçûna çand û bajarvaniya Kurdistanê nekirine. Banga we ji van kesan re çî ye?

ÇAÇANI: Banga min ji bo hemû rewşenbîrên Kurdistanê re, ji hemû civîn û konferansên wan re, ez dixwazim bêjim girîng e iroj bi yekdengî bête bankirin. Xebat ji bo Kurdistaneke ser-

bixwe azad be. Girîng e heyânî derfetên wan hebin pişt- girtina şerkariya gelê kurd bikin. Li başûr be, li bakur be, ez hozan im, girîng e ez li ser şehîdan û şerê azadiyê bêjim, li ser APO û pêşmergeyan bêjim. Ji Kurdistanê re bêjim. Ez ji bo vê yekê girîng e, bişewitim û rê ji gelê xwe re vekim. Ew ji bo serxwebûnê şer dike, divêt ez ji bo serxwebûnê binivîsim.

REWŞEN: Di vê dema dawî de, dewleta tirk zimanê Kurdî serbest kiriye. Heftê sal e, serbest nekiribû, îro serbest kiriye. Gelo li gor we sedem çi ye ku di vê demê de vê kirê kir?

ÇAÇANI: Min di serî de jî got. Di nêrînên min de, şerkariya gelê kurd bi serokatiya APO, hiştiye ev yek bibe. Lê em nayên xapandin. Bila dijminê tirk baş zanibe, em zanin ku ev politîka wî ye. Îro Ozal û parlamênên wî vê pîrsê dihonin. "Demokrat in", ta ku xwe bigehînine bazara Avrûpî. Di texmîna min de, salek-dudo, dema kurd helbest û folklorê xwe îcra bikin, nasnadina welatê xwe û dîroka xwe bikin, wê dîsan tirk vegerin kuştin û qirkirin û girtinê. Ewê vê ji xwe re bike hincetek û bêje min zimanê wan serbest kir niha jî doza welatekî li me dikin. Lê em berî vê serbestkirinê, doza welatê xwe dikin. Ev politîk li hevberî ermenan jî dane meşandinê. Piştî ku nivîsevan û edîbên ermenan nivîsin, zivîrin ew girtin û dest bi qirkirina ermenan kirin. Guneş jî xistin stûyê kurdan de. Gotina min ewe ku kurd bi vê politîkê neyê xapandin. Girîng e em li hevberî vê yekê şiyar bin. Eger hinek bêjin emê çanda xwe pêş de bibin û ... nizanim çi... Ez dibêjim; na bes e. Ez dibêjim em hîn bêhtir xwe li dora şerkariya PKK'ê û APO bidin hev heyânî serxwebûnê. Lewra ev serbestkirina zimên bi karên wan hatiye pê û ev mizgîniyeka dozkirina serxwebûnê ye.

REWŞEN: Dibe ku dewleta tirk

hinde hozan û rewşenbîr bi vê serbestkirinê re bikire û li dijî *serbestiya rastîn* û şoreşê bide xebitandin! Hûn vê yekê çawa dibînin?

ÇAÇANI: Rast e û dibe. Min got ku dixwazin bi vê yekê keleman li pêşiya şoreşê biafirînin. Dikarin bi çand û hozan ûtiştên welê, rewşenbîrên xwe firos bikirin û bidin xebitandinê. Ji ber ku îro şerkariya kurdan gihaye bilînbûnekê. Ewê bigihê amancên xwe. Le gerek e em nayê xapandinê. Tirkan bi dehan çaran kurd kirine kelem li pêşiya şerkariyê. Hema niha tirko nikare vê yekê bike. Ji ber ku me xwe nas kiriye. Girîng e ne tenê APO bixebite.



Karlênê ÇAÇANI

Girîng e, em jî, hemû rewşenbîr û hozan xwe li dora vî şerî bidine hev. Ne ku yek ji me li Parîsê, yê din li Swêdê, li Mosko rûnên û em ji xwe re binivîsin. Ev nayê pejirandin. Girîng e em bibine yek û yekîtiya xwe fireh bikin. Li dora şerê PKK'ê bicivin.

REWŞEN: Hûn ji bo çi dinivîsin?

ÇAÇANI: Evîna welêt, şerkariya gelê kurd, di dilê min de rûniştiye. Ez dike- lim û ji bo wan dinivîsim.

REWŞEN: Her kesên ku navê şervanên ARGK'ê bihistine, dizanin ku ew li serê çiyar, sînga xwe dane top û tankên dijimi-

nan. Bi mêranî canê xwe di- dine welat. Bi cengawerane ketine ser doza serxwebûn û azadiya gelê Kurdistanê. Gelo *Dr. Çaçani* di-xwaze çi peyarm û mesajê bigehîne wan?

ÇAÇANI: Bila her bijin! Her dem di kar û xebata wan de ji wan û ji *serok APO* re serkeftinê dixwazim. Hêviya huner û hêzê ji wan re dixwazim. Evîna dilê min, xwîna damarên min, hiş û ramanên min bi wan re ye. Eger bête xwestinê, ezê bi van salên xwe, amadem e li gel APO û gêrilla li dijî dijminan şer bikim.

REWŞEN: Rewşen, kovara Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan -YRWKê, di nav rûpelên xwe de xwedî mişe vekolinên dîrokî, çandî û ramiyî ne. Ji bo pêşdetir çûna wê, çi gotinên we jê re hene? Ji rexneyan, ji pêşniyaran dî- tina we çi ye?

ÇAÇANI: Min 5 hejmarên *REWŞEN*ê girtine. Girîng e ez bêjim kovareke baş e pir û pir rind e. Lê ez dibêjim biçûk e. Eger hîn bêhtir li ser tore û vekolînan bigere wê hîn û hîn xwestir bibe. Ger vekolînan xwe li ser nivîsevanên jî derveyî Kurdistanê çêbike wê mirov hîn bêhtir nasayî wan bibe. Mina nivîsevanên Ermenistanê û Rûsiyayê û hwd.

REWŞEN: Em, dawiyê, bi

navê kovara Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan-YRWKê, pir û pir sipasî we dikin ku we ji bo xwendewarên kovara *REWŞEN*ê vê derfeta hevdudîtinê da me.

ÇAÇANI: Ez jî sipasî we dikim. Ez pir û pir şa me ku ez mêvanê we me. Ez pir dilşa me ku ez rastî hevalên şerkariya kurdan dibim. Ez bi vê xebata we ya piştigirtina ji bo serxwebûn û azadiya Kurdistanê pîroz dikim û di xebata we de serkeftinê dixwazim. ■

ŞÊX ELÎ RIZA

Mûsa Enter

Şêx Elî Riza, lacê şehîdê pilê (gird, girs) kurdan, Şêx Seîd Efendî yo. Semedo ki lacê yêwo pîl bi, zaf nuzdî pêrdê xo bi. İlimî dîn û meseladey kurdan ser o zaf zanaye bi. Labelê ser semedo ki piy yê xeneqabi, yo zî yew demewo derg û dila Bexdad di firarey di mendbi û wexto ki ef vejîya ageyra ame welat zî, şarî hem yê ra û hem keydê yîni ra xo durî dabi ew hukmat zî bîlla sebeb yo û mêrdimê jey surgunê Traqya kerdî û dest nabi maldê yîni ser Şêx Elî Riza biney bêveng bibi.

Mi, şinkeydey xo di namey yê eş-nawitibi û mi keydê Şêx Seîd ra zaf hes kerdinî û hurmetê mi ay keyî rî bi. De ez nêzana ez vaja weş ya zî nêweş bi labelê ma yewbînan inhewa şinasna:

Ceney Şêx Seîd Efendiya peyeni way Xalî Begê Cibrî bî. Jay ra yew lacê yê zî bi, namey yê Ehmed bi. Yê zî hezey ay mêrdimandê binandê key Şêx Saîd surgunê Çorlu bibî. Ebi gore bê qanûndê surgunî, ay mêrdimê ki surgun bîbî, hetanî vezîrdê girwandêzerrî (lîç işleri) ra izin nêgirewtinî nişaynî cay surgundê xo terk biki.

Rojê qey Fatma Xanim zaf eciz bena û hema bê izin wardona weyşana yew ereba û yena Estembul key mêrdimandê xo Reşî Begî. Ez û Reşî Beg ma dostê yewbînan bî. Teraqey Reşî Begî zaf weş bî. Yew mêrdimo yarîkerdax bi. Timo kurdan rî deey kerdinî. Labelê xo tesîrdê mesalandê verênan ra nê-xelasnabi. Mi ra timo vatîni xo zulimê hukmat ra bipawi. Timo vatîni "willay ez bawer nêkeno ti, inê serrîy reyra şanî mezêl". 1946 di rojê, Reşî Beg ame mi het, hilhiley yê bi, nefesê yê nevecaynî. Mi yo roşayna, xora qelbê yê zî decay-nî. Mi va: Dato xeyr o ? Va:

- Keyrê çî yo lacê mi. Ceney Şêx Seîd Efendî hema xafla dawopiro omeya keydê ma. Ez nêzana ez se ko? Ez teber ko nêbeno... Eke hukmat bizano halê mi se beno?

Mi cadî biney zerrî day bide û teselî kerd û mi va:

- Dato, senêwa nêbo ti mi ra vanî tîmankewte. Tî qet meraq meki, ez ku na mesela hal biko! Va:

- Ti senêhewa hal kenî lacê mi?

Mi va :

- Ez yay gêno beno keydê ma û heze ki ya raşte-raşt omeya keydê mi, heze ki to zî bindi nêşinasnena. Eke ma tepşayî wa na mesela mi rî bîba yew xatîra. Xora ez eynî hezey yîni, xo

Estembul di surgun di hesebneno. Hema eke hukmat wazeno wa mi zî surgunê Edirne biko. Inay wêşer çî esto?

Reşî beg omêbi cawo ki telebey mendinî (yurt) Reşî Begî va:

- Willay lacê mi ez şermayeno. Hema ez ewta roşeno ti şo, heze ki xeberey mi nê girwîy ra çinî ya, ti se kenî biki!

Ez şîyo. Ceney Reşî Begî Peyker Xanim, hezey lacê xo mi ra hes kerdinî. Heyatî di omey mi ver a. Verê Fatma Xanim mi ra zî nimitî. Mi derî mese-la va, ya zî biney rehet bî. Peyker Xanim bi xo zî Cibriyan ra bî. Torney Eledîn Paşay bî. Eledîn Paşa, mêrdimê Xalî Begî bi. Key Eledîn Paşay eyrû zî Mûş di wayîrê cami di pîlî û weqfanî. Ma tê reyra şî Fatma Xanim het. Mi lew destdê yay ra day û mi hurmetkarey xo nawitî. Mi va ez wazeno ti çend rojî ya zî hetanî ki ti wazena ti bîba mêmaney mi. Ti hem way Xalî Begê Cibrî ya û hem zî ceney Şêx Seîd Efendî ya, eke ti bîba mêmaney mi, qaydê mi rî yew şerefo bol pîl o. Ez wazeno ti na ricay mi qeubol bika. Fatma Xanim, ewniyay Peyker Xanim ra heze ki vaca "ti se vona" Peyker Xanim kirdasî va:

- Willay way mi de ti zana, la Mûsa zî ewladê ma wo.

Inay ser o Fatma Xanim, ricay mi qeubol kerd û çarçefey xo pira girewtî. Xora key ma nuzdî bi, ma tê reyra şî. Ma zaf cay yay zanaynî. Wexto ki vistewrey mi Evdîrehîm Beg û vistîriyey mi pey hesay bol keyfê jînî ame. Jînî Fatma Xanim çîray tenya nêvardaynî. Mi zî, vistewranê mi zî bêhesab helay day mêmandey xo. Ebi inhewa Fatma Xanim des rojî mêmaney ma bî.

Tira pey mêrdimê jay pey hesiyay û amey ya girewtî bardî. Fatma Xanim na mesela heme heway ra mêrdimandê xo rî behs kena û texmînan gore yew serrî ra pey wexto ki ef vajîya, key Şêx Seîd Efendî pêrû omey Estembulî. Elî Rîza Efendî firseto verên di, çand mêrdiman û birarandê xo reyra bi mêmânê mi. Gelek keyfê mi ome. Verê xeberey mi çinê bi ki, yê omey Estembulî. Oxvana ki yê omey û Mercan di otêldê yew Kurdî di ca dawo xo.

Mi û Elî Rîza Efendî ma inhewa yewbînan şinasna. Elî Rîza Efendî vatîşdê "şêx" ra zaf xû kerdinî. Vatîni:

- La mi ra mevajê "şêx" xora nê vatîşdê şaş ser o bol girwey amey ma kurdan serî ser di. Mêrdim esto pî jey şêx o labelê laco ki tira pey mendo to-

laz o, mêrdimê dewlet o. Labelê Kurdê ma hewna zî ay merdimdê pîs ra vanî "şêx". Mi va:

- Estexfirulla ti aynan ra nî yî. Va:

- Ney, ney hema ezî aynan miyan di, labelê mi ra me vajê "şêx".

Yeno mi vîrî hîrê-çêher rojî Estembul di mendî. Sebebê indeyî mendîşê yîni zî ayo bi ki zaf Kurdê Estembulî şîni yîni het. Mi zî yê çîray tenya nêvardayî. Axrîki biletê trendey yîni amey girewtîş û mi hewna lew destdê Fatma Xanim ra day û ma yê Heyderpaşa ra ray kerdî. Cawo ki şîni, qezay Erzîrumî, Xunus bi.

Tira pey hetanî ki Elî Rîza Efendî dînay xo bedelnay tîkîliy ma nêbirîyay. Hetta nêweşîyey yê ya peyendê zî, ez şîyo yê het. Keydê yîni ra çend tenî yê het bî. Yê mi ra zav ciwanêr î û hema ra zî weşî. Şêx Elî Rîza yîni rî yew wesiy kerd û va:

- Bewnê mi ra, şîma rayîrdê Mûsa Anter ra meaqetê. Eke şîma bîaqetî ez heqê xo şîma rî helal nêkeno.

Rojê mi derheqê felaketdey pêrdê yê di wesîqey ti ra waştî. Mi ra wa:

- Willay lacê mi, mi zî waştîni ez ay wesîqan(dokumentan) bido to. Labelê wesîqey ma bi nimitîkî bardîbî Beyrûd û teslîmê yew dostê ma yê erebî kerdî. Tira pey ma waştî labelê pêrû nimitîbî, weşnaybî, nêday ma.

Ma sewbîna yewbînanveynayîşdê zî mesaladey kurdan ser o qîsey kerdinî. Yê vatîni, dormarandê (çorşmandê) demokratîk û sivilan di meselay kurdan nîyna zanayîş û kê ganî verê inay tesbît biki. Inhewa nêbo se hema ayê ki dîna ra û mesaladey kurdan ra hayîyey yîni çîna û hema wardonî na mesala kenî mesalay namusî û tîfingê xo gêni kuwenî koyan, nişnî na mesala hal biki. Mîsal daynî vatîni:

- Hedîseyê ki nê nuzdîyan a bî, şadey nê vatîşandê mi nî. Herbê pêrdê mi, ey Agrî, Zîlanî, Sosanî. û a peyen zî herbê Dêrsimî ha çîman var di yî. Cora zî karo ki şîma no ware di kenî ez munasib veyneno. Verê wa dîna mesalay kurdan bizana, tira pey halbiyayîşê mesala asan beno. Nesîheto ki ez to rî û xortandê kurdan rî biko ino wo. Ez ewta hewna Şêx Elî Rîza Efendî û pêrê yê muhteremî Şêx Seîd Efendî hurmet reyra ona xo vîrî. ■

Ma na nuşta

tîrkî ra tadaya kirdkî

Niştimana xwe binase


BIDLÎS

M. Bozan

Li ser cihderk û jêdera navê bajarê Bidlîsê, pir lec û guftûgoyan, xurtirîn diyardan, weha dibêje: Împaratorê Makedoniya, Îskenderê Mezin, çaxa ku derdikeve sefera Asya'yê, rîya wî di Bidlîsê re derbas dibe. Ciwanî û rindbûna ciyê bajarê Bidlîsê pir bala wî dikişîne. Ji qumandanekî xwe re, ku bi navê Lîs tête nimandin, dibêje: "Vê derê bêhtir ava û perwa bike û lê keleşekê jî lêbêke!" Fermana Îskender tête cih û li Bidlîsê keleşeka pir zexm û aşê tête lêkirin. Di vegeerê de Îskender dixwaze bikeve Bidlîsê, lê bi rojan nikare wî kirê bike. Qumandan Lîs bi destê xwe Îskender dixwe keleşê. Îskender li zexm û asêbûna keleşê heyran dimîne û dixwaze qumandanê xwe bi tiştekî şa bike. Ji ber vê yekê nave qumandanê xwe li keleşê dike û navê keleşê **Bad-Lîs** datîne. Li gor vê çêkirinê navê **Bad-Lîs** bi zeman tête guhartin û gotina **Bad** dibe: **Bid**. Wateya vê jî **welat** e. Anku Bidlîs li ser wateya "**Welatê Lîs**" e.

Dîroka Bidlîsê jî weke navê wê baş nayete zanîn. Sedemên wê ev in: Li derdorên bajarê Bidlîsê bermayên kevin pir nehatine dîtin. Li vê derê, bêhtir yekolîn çênebûne. Lê dîsan jî tête zanîn ku berî gelek, cara yekemîn nişta ûrartûyan li vir bi cih û war bûne.

Ûrartûyan, b.z. di sala 1000'î de, li bajarê Wanê û li Bidlîsê bi cih bûne. Bi çendî



(qasî) 300 salan Bidlîs, di navbera Ûrartû, hurrî, mîtanî, aşûr û babîliyan de maye. Aşûr û Ûrartû gelek caran li ser Bidlîsê şer kirine. Pozîsyona Bidlîsê ya cografîkî rê nedaye ku aşûr bikaribin zora Ûrartûyan bibin û Bidlîsê bi destê xwe ve bihênin. Lê, dîsan jî aşûr digihên armanca xwe û demeke kurt li Bidlîsê desthilatdarî dikin. B.z. di sala 700'î de med, împaratoriya aşûran jî holê radikin û Bidlîs jî medan re dimîne. Med nêzikî sed salan desthilatdarî dikin. Di sedsala şeşan de (bz) pers, medan jî holê dibin û Bidlîs jî dikeve destên wan. Derbasbûna împaratorê Makedoniya, Îskenderê Mezin di Bidlîsê re, b.z. di sedsala çaran de ye. Îskender persan têk dibe (mexlûb dike). Piştî vê yekê, bi heşt salan (B.z.323) Îskender dimire. Makedonya qels dikeve û valahiyek çê dibe. Ermen vê valahiyê bi kar dihênin û

Bidlîsê bi dest ve tînin. Piştî zayînê sala 200'î, rom vê derê kaviil dikin. Piştî demeke kurt, dîsan pers li vir desthilatdarî dikin û ev hetanî sala 641'î berdewam dike. Piştî vê yekê dem û dewra ereban dest pê dike. Sînorê Xelîfe Emer û Îslametiye hetanî ber Bidlîsê berfireh bûye. Lê Bidlîs di navbera ereb û bizansiyan de dimîne. Ji ber vê yekê Bidlîs geh dikeve destên ereban û geh destên Bizansiyan. Di sala 927'ê de bajar bi temami jî Bizansê re dimîne. Di van salan de ereb qels ketibûn û dem û dewra êl û eşîran xurt bûbû. Di sedsala yazdehan de kurd bi navê Merwanî doliwgeriyekê ava dikin. Bidlîs jî dikeve bin desthilatdariya merwaniyan. Ew çax Bedlîs dibe bajarê tixûbê merwanî û bizansiyan.

Di sala 1077'ê de tirkên selçoqî dixwazin Bidlîsê bigirin. Lê selçoqî jî du hêlan

ve tengasî dikişînin. Yek ji wan tengasiyan ev e, ku selçoqî di warê çand û hunerî de pir li paş in. Tengasiya din jî berxwedana kurdan e. Bi rastî jî karê selçoqîyan pir dijwar e. Ji hêlekê ve bi Bizans re û ji hêlaka din ve jî bi kurdan re şer dikin. Di vê berxwedana kurdan de rola merwaniyan girîng e. Lê mixabin e ku di sala 1085'ê de sultanê selçoqîyan, Melîkşah, qumandanê xwe yê bi navê Fexruldwle dişîne ser merwaniyan û ev kes payitextê merwaniyan bi destve dihêne. Keleşa Bidlîsê dikeve. Êdî li hevberî selçoqîyan jî Seleheddînê Eyyûbî pê ve çî kes namîne. Hebûna Seleheddîn bi wan ne xweş e. Dixwazin bi hîle û tilofîskan Seleheddîn teslîm bigirin. Ew çax Xelat di destên tirkên artûqî de ye û artûqî bangî Seleheddîn dikin û dixwazin Xelatê bi dest teslîmî wî bikin. Lê Seleheddîn naxape û leşkerên xwe dişîne

ser Xelatê.

Di destpêka sedsala sênzdehan de begê eşîrên rozkan, rojran û rojkiyên Şerefxanî, li Bidlîsê desthilatdarî dikin. Ev eşîrên li jor nîmandî ji Çolemergê hatine Bidlîsê. Desthilatdariya Şerefxaniyan 400 sal berdewam dike.

Di sedsala şanzdehan de du dewletên mezin li hevberî hevdu ne. Evana sefewiyên farsî û osmanî ne. Careka din Bidlîs roleke mezin dileyze û herdu hêl jî dixwazin Bidlîsê bi xwe ve girêbidin. Serekê sefewiyan, Şah Simaîl û sultanê osmaniyan Yawiz Selîm, her yek ji hêlekê ve, bi êl û eşîrên kurdan re muzakere dikin û di encamê de Yawiz Selîm bi ser dikeve. Wê çaxê Mîr Îdrîsê Bidlîsî bi Yawiz re li hev tê û sencexa Bidlîsê teslîmî Yawiz dike. Bi vê yekê re osmanî li herêma bêhtir xurt dibin û êrîşên xurttirin dibine ser sefewiyan.

Keleha Bidlîsê

Me li jor piçekê behsa keleha Bidlîsê kiribû û me gotibû ku serfermandarê Îskenderê Mezin, împaratorê Makedoniya, bi fermana Îskender, li Bidlîsê kelehekê lêkiribû. Li ser vê bûyerê bi dirêjî welê têtê gotin; ku di eniya Îskender de nexweşiyek hebûye û li dermanê vê nexweşiyê digeriya. Di sefera Asya'yê de, Îskender di Bidlîsê re derbas dibe. Wê hingê diçe ber cihê ku herdu avên Rabat û Kosûr digihêne hevdu û ji wir avê vedixwe. Paşê dikeve xewê. Îskender bawer dike ku eger ji vê avê vexwe ewê baş bibe. Ji ber vê yekê Îskender heft rojan ji vê avê vedixwe û bi rastî jî baş dibe.

Îskender ji vî welatî pir hez dike. Gazî qumandanê xwe Lîz dike û jê re dibêje: "Li vir kelehekê welê zexm lêke ez jî nikaribim bistînim." Paşê Îskender derdikeve sefera Farsistanê (Ecemistanê). Keleh zû lêdibe û di vegeerê de

Îskender wê amade dibîne. Îskender dixwaze bikevê kelehê lê qumandan Lîz rê nadiyê. Heft rojan şer çêdibe û Îskender bêgav dimîne û jî Lîz re dibêje: "Hey bêbav! Tu koleyê min bûyî, vêga tu asê bûyî ha?". Paşê Îskender dikeve ser rîya deşta Mûşê. Wê çaxê qumandan Lîz xwe digehîne Îskender û mifta kelehê didiyê. Îskender jê dipirse: "Tu çima wisan asê bûyî û te ewçend lêşkerên min telef kirin?" Bersiva Lîz xweş e: "Te ji min kelehekî xwest û te got ku divêt ez jî nikaribim wê bikevimê. Min jî fermana te bi cih anî." Ev bersiv dilê Îskender nerm dike û Lîz dibexişîne. Paşê navê Lîs li Bidlîsê dike Anku Keleha Lîs...

Keleha Bedlîsê li ser du çeman cih digire. Diwarên kelehên di navbera çar û heft metreyan de fireh e. Bilindahiya diwaran pêncî metre heye. Dora kelehê jî bi hêsanî sê km heye. Li rohilata kelehê Birca tarî cih digre. Tête gotin ku di demên kevin de, kesên ku fermana wan radibûn di vir re dihatine avêtin. Li hêla rojavê û hema hema nivê kelehê ji serayê re veqetandine. Li nivê din jî bi qasî 300 mal cih digire. Li xwarê û ber bi rohilatê de bazarek hatiye çêkirin. Her du seriyên bazarê bi deriyên hesinî têne hev. Li vê derê bi sedan mal jî ava bûne. Bermayên bizans û ermenan nişan didin ku keleh çend caran xira bûye û cardin ava bûye.

Mizgefta Mezin

Mizgeft di sala 1150'yê de çêbûye. Ebul Muzaffer Merwanî ve mizgeftê daye çêkirin. Mizgeft ji keviran ava bûye. Minara mizgeftê li bakura rojavê dikeve. Sê deriyên mizgeftê hene.

Mizgefta Sorik

Di navçeya Bidlîsê û li rohilatê dikeve. Dûrbûna wê yî ji mizgefta mezin sed metre

tuneye. Di sala 1120'î de çêbûye. Sê caran hatiye hundandin.

Keleha Xelatê

Li Xelatê bermayên du kelehan hene. Yek ji wan bi emrê sultanê osmanî Yawiz Selîm hatiye çêkirin û li kêleka behra Wanê cih digire.

Ya din jî, ji dema urartûyan maye û di erdhêjana (zelzele) sala 1224'ê de xira bûye.

Keleha Kefê

Ev keleh li bakura Cewazê ye û jê 6 km dûr e. Keleh li ser gireke volkanîkî ava bûye. Ev keleh sê alî bi tehtên tûj vegirtî ye û ketina kelehê hew ji bakurê ye. Keleh bermayê urartûyan e. Vekloinên ku bi 4-5 km li bakura kelehê çêbûne, nişan didin ku urartû hem di barê maden û hem jî di barê kevîran de pêşve bûne.

Bidlîs cihê bilind e. Di nava tixubê Bidlîsê de pir çiya hene. Ji sedî heftê û yek parên Bidlîsê çiya, newal û zinar in. Para cihên rast û ji bona zad bi kêrhatî ji sedî deh e. Çandinî, digihê ji sedî 17 parên bajêr. Weke din tev çiya û cihên asê ne. Çiyayên Bidlîsê bi piranî di ser du hezar metreyî ne. Bajêr bi xwe jî ji serpilka behrê 1453 metre bilind e.

Di nava çiyayên Bidlîsê de herî bilind çiyayê Sîpanê ye. Sîpan 4053 metre bilind e û di Kurdistanê de, çiyayê di pey çiyayê Agirî re duwemîn e.

Çiyayê Sîpanê çiyakî volkanîk e. Piştî 3600 metre bilindahiyê çiya bi berf e û sal duwanzde meh ranabe. Tebeqên qeşayê dadikevin hetanî 3400 metreyan. Li serê Sîpanê goleki 400 metre berfireh heye. Sîpan bi epîka Sîyabend û Xecê bi nav û deng e. Ev yek ketiye sitran û dîlokên kurdî jî.

Piştî Sîpanê, çiyayê

Nemrûdê tê. Ew jî çiyakî volkanîk e û vemirî ye. Demekê, bi bilindahiyê, bi çendî çiyayê Sîpanê bûye. Lê bi zeman biçûk bûye ji ber ku volkan çend caran teqiyaye. Nemrûd, 2935 metre bilind e. Li serê çiyayê Nemrûdê jî goleki heye ku pir pir mezin û berfireh e. Ev gol di kortaleki gelekî mezin de ye. Kortaleki 40 km çarçik e. Çiyayê Nemrûd û ev gola li ser çiyayê Nemrûdê pir bala tûristan dikîşîne.

Di pey çiyayê Nemrûdê re çiyayê Ziyaretê tê. Çiyayên ziyaretê çend çiyayên bi rêz in. Cihê herî bilind 2542 metre ye. Ew çiyana li bakura Bidlîsê û li rojavayê çiyayê Sîpanê dikevin. Li Bidlîsê hin rêz û qorên çiya hene, ku em dikarin ji wan behsa du qorran bikin. Yek ji wan ber bi dewama çiyayên Torosên başûr e. Ev qor çiya bi piranî di ser 2000 metreyî ne. Di nava wana çiyayan de, sê heb bi nav û deng in: Girê Hendaxînê, Girê Kevir Sorik (2603) û Girê Kevir Reş (2609) metre bilind in. Qora din bi navê çiyayên Kawuşahab têtê navdan. Di vî qorî de girê herî bilind, bi 2730 metreyî, çiyayê Sînî ye.

Li Bidlîsê avên biçûk û mezin gelek in. Di nava wan de gol û çemên bi deng ev in: Gola Nazik 30 km çarçik e û ji serpilka behrê 1870 metre bilind e. Kûrbûna wê li cihna digihê 50 metreyan. Li golê masî têne girtin. Gola Arîn: 13.5 km çarçik e. Bilindahiya avê ji serpilka gola Wanê bi pênc metreyan bilindtir e. Ava wê bi soda ye. Gola Aygir: Li başûra çiyayê Sîpanê dikeve û 3 km çarçik e. Ava wê gelekî şêrîn e. Gola Nemrûdê: Goleki qater e û di kortala li serê çiyayê Nemrûdê ye. 10 km çarçik heye. Ji serpilka behrê 2400 metre bilind e.

Ava wê jî weke ya gola Aygîrê şêrîn e. Gola Wanê jî qismen li Bidlîsê dikeve. Lê bi navê Wanê re têtê nîmandin.

Çend çem û avên Bidlîsê

Jî ev in: Çemê Xerzan, Ava Bidlîsê, Çemê Xweşik, Çemê Avreşin. Li Bidlîsê çend germavên bi nav û deng hene. Evana, Goroymak, Germav, Alemdar, Komuraltî, Germava Aş, Germava Biçûk, Avtalayam, Germava Çiyayê Nemrûdê ne.

Nexşa Bedlîsê bi vî awayî dikawere xêzkirin:

Li rohilat gola Wanê heye. Li başûr Sêrt û li rojava Mûş heye. Li bakur tixûbên Agirî (Qerekose) hene. Em niha jî navça Bidlîsê û bajarokên wê binasin.

Navça Bidlîsê:

Ji serpilika behrê 1500 metre bilind e. Li navçê 77.295 mirov dijîn. Erda wê 1.631 kmçarçikê e û serê yek km çarçikê 47 mirov dikevin. Bolukyazi, Çukur, Narli Dere û Sarikonak bi navça Bidlîsê ve girêdayî ne. Çil û sê gundên navça Bidlîsê hene.

Aboriya navça Bidlîsê bi piranî li ser pez û sewal e.

Tetwan

Li başûra rojavaya gola Wanê dikeve. Erda wê rast e. Di nava bajarokên Bidlîsê de herî mezintir e. Erda wê 1.235 km çarçik e. Li Tetwanê 65.512 mirov dijîn. Serê 1 kmçarçikê 53 mirov dikevin. Ji sedî 62 parên gelê wê derê li navça Tetwanê dijîn.

Kuçuk Sû "Avabiçûk" û reşadiyê bi Tetwanê ve girêdayî ne. 42 gundên Tetwanê hene.

El Cewaz (Adilcewaz)


Li bakura gola Wanê û li ser kaşekî ye. Cihê wê yên rast jî hene. Ev cihên rast di navbera çiyayê Sîpanê û gola Wanê de ne. Aborî li ser çandinî û dewaran e. Darên gûzan jî hene. Bizn û mîh pir in. Weke din li wê derê mêşên hungiv jî têne xwedîkirin. Erda Cewazê 812 km çarçik e. Lê 23.483 mirov lê dijîn. Serê km çarçikê 29 mirov dikevin.

Golduzu "rasta golê" bi vir ve girêdayî ye. 25 gundên Cewazê hene.

Xelat

Li başûra rojava gola Wanê dikeve. Cihê wê bilind e. Cihêkî dîrokî ye û kevn e. Ji pir împarator û began re bûye ciheke giranbuha.

Erda wê 1.044 km çarçik e. Li Xelatê 26.396 mirov dijîn. Serê yek kmçarçikê 26 mirov dikevin. Ova Kîşla bi vir ve girêdayî ye. 25 gundên Xelatê hene.



Aboriya xelatê jî li ser pez dewaran e. Weke din li xelatê zenaatkarî jî li pêş e. Ji vana yek xeratî ye. Li Xelatê pir bermayên kevin hatine dîtin.

Hizan

Li başûra rohilata navça Bidlîsê dikeve. Erda wê bilind e. Aboriya wê li ser dewaran e. Tûtin, fêkî û hingiv jî di aboriya navçê de cihê girîng digirin.

Erda wê 917 km çarçik e. Li Hizanê 33.746 mirov dijîn. Serê kmçarçikê 37 mirov dikevin. Akşar û Sagınlı bi

Hizanê ve girêdayî ne. Sih û sê gundên Hizanê hene.

Motkî

Cihêkî kaş e. Dûrbûna wê yî ji navça Bidlîsê 25 km çarçik e. Di warê aborî de feqîr e. Gel ji ber wê yekê jî muhacir bûne. Erda Motkî 1.068 km çarçik e. Li Motkî 31.233 mirov dijîn. Serê yek km çarçikê, 29 mirov dikevin. Para herî mezin a şênîyê hemû navçeyê, li gundan dijîn. Geyîkpinar, Kavakbaşı û Meydan bi vir

gel heye. Her ku çend piştî sala 1960'î kapi-talizma tirk li bajar û bajarokên Bidlîsê de hinde guhartin çêkir jî, gund û gundikên Bidlîsê xwe bi temamî ji nava lepên feodalîzmê rizgar nekirine.

Çandinî û xwedîkirina pez û dewaran, li her derê Bidlîsê, di warê aborî de cihên girîng digirin. Di xwedîkirinê de, di nava heywanan de, xwedîkirina bizin û mîh li pêş in. Li Bedlîsê pir daristan jî hene. Ji erda herêmê, 125.460 hektar daristan in. Ev jî têtê sêr wê maneyê ku ji sedî 32 parên erdên Bidlîsê daristan in. Di destpêkê de me behsa Idrîsê Bedlîsî kiribû û me xwendibû ku wî çawan Bidlîs teslîmî neyeran kiribû. Li wê derê ne pêwîst e, ku em dîr û dirêj kad û çêla wê pirsê bikin. Ev yek jî hêla xwendewaran de baş têtê zanîn. Îro jî Kamran İnanê Bedlîsî jî her bi wî awayî, rola bapirên xwe, Idrîsê Bedlîsî dileyize û Kurdistanê pêşkêşî neyeran dike. Ev yek jî baş têtê zanîn. Lê pirs me li wê derê ne ev e. Em baş dizanin ku li ku derê xiyane hebe, li wê berxwedan û serhildana li hevberî zordariyê jî hene. Bidlîs jî di warê berxwedanê de roleke giranbuha leystiye. Gelê Bidlîsê maneya xiyane baş dizanin û edî naxapin.

Bajarê Bidlîsê, weke gelek bajarên Kurdistanê, bajarekî pir berxwedankar e. Her çend, hem di dîrokê de û hem jî di wê serdema me de, hinde hevxeatkarên bijarte (wek ên Idrîs-î Bedlîsî û Kamûran İnan) jî nav vî bajarê me yê berxwedankar derketine jî, dîsan vî bajarî, çî car jî berxwedanvaniya xwe ya têkoşîna serxwebûna Kurdistanê çî kêmasiyekê nîşan nedaye. Gelê herêmê çî car van welatfiroşan nebeşandine û her dem bêbextiya wan li nav rû û çavên wan xistine. Ji ber wê hindê ye ku îro em dibêjin "Berxwedan jîyan e!"

Jêder :

Rojnameya BERXWEDAN

ÇEND STIRAN Û DÎLOKÊN X. ABOVYAN ÊN BERHEVKIRÎ BI KURDÎ

- II -

Xwendewarên delal...

Me, di hejmarê 6'ê, ya
REWŞENê de, nivîsarek bi navê
Kurtebahsek Jiyanê Dostekî Gel-
Xaçatûr ABOVYAN belav kiribû.
Me, ji bilî vê jî, çend stiran û
dîlokên wî yên, ku wî bi xwe, ji
nav civaka kurdî berhev kiribû,
weşandin. Em di vê hejmarê de
jî, bi weşandina stiran û dîlokên
wî yên berhevkirî berdewam dikin
û vê rêzênivîsê dawî tînin.

KILAMA KURDA YA ROJA ME, YA LÎRÎKIYÊ

- Evîndarî -

Lawiko qurba, ez alîkî tu alîkî
Were em hêrine cem qazîkî, cem miftîkî
Hila bira bêje; çika çira du serê çê hev ra
naçîne ser balgîkî

Wey ziyaretê, wey ziyaretê
Dikime qîrîn berva te tîm
Kale-kala peza qurban wê dû me tî
Hekî mirazê me dikî-bike, hekî na-me bike
xuşk û birê vê axretê..

Keçikê qurba, çiya bilind e te evînim
Gul sor bûne naçîpînim
Ezê tu dila ser dilê xwe û te ra nahevînim
Elegezê kaniyê rêzê
Ez ber ketim heta fêzê
Kê ku orta du dila, çar çava xeberde, bira
pêçeka kurîn nede ber hambêzê

Dilê min titûna Lîningradê
Ezê tîkme qilça şerê, ya Êratê



Xaçatûr ABOVYAN

- Ji pirtûka *Kurd-Êzdî* -

Bişînimê kavla Ûrisêtê, nav civatê
Lawiko qurba, tu wê diçî ez mam vira
Çavê min xalî nave av hêsira
Hekî xwedê mirazê me dike, bira bike, hekî nake
tu bê *xuşkê*, ez bêm *bira*

Lawiko qurba, tu wê diçî ezê ça vim
Ezê bivime teyrekî qerqûşê hewa bavim
Ezê cî-miskenê te nizanîm
Bêm ser tûncik-temorya te bisekinîm

Lawiko qurba, sêwî sed car sêwî
De tu ber derê mala bavê mi' ra here-were
mîna rêwî
Ezê te xweykim nava sîng û berê xwe da nola
kara xezala
xezala, berxika hevalcêwî

Hîva gundê me hîva sava
hîv hingiriye, naçe ava

de bira tiliyê min herine çavê dê û bava
xortê mi' ra dîtin, xwe ra kirine zava

Me li hafa gundê Botî

Cot kevotka hev ra gotî:

"Lawiko qurba, wer em herine ber ziyareta
te digotî

Min û te va kê poşman ve-bira şil ve,
paşê kotî"

Mala me cînarê mala şêxa

Lawiko qurba, kaxezekê binivîse,
qol-mizgeftê xwe piştê xe

Were min birevîne, paşê nav û dengê min
dinê xe

Kerî pezê li vê piştê

Lêyî kişya ser lêmiştê

Dilê min neketiye tiştêkî, dilê min ketiye
qayîşa formê qima piştê

Kerî pezê çendî wa ye

Nêriyê nav da weke ga ye

Lawiko qurba min û te va hev ra
soz û qîrar daye

Kerî pezê vê neqevê

Sipî dîke mîna şevê

Tu bixevite bide heqê min bedewê (1)

Ro çû ava, tu nema

Te vê avêt dor û çema

Gede qurba, wekî dayika te bimire

Ezê bêjim; aykê min bû jê ra nema

Hevraz çûme, berjêr hatim

Rastî gul-sosinê mêrga hatim

Awirê qîza kerê usa tûj bûn

Mîna gulla mawîzerê ez hingavtim

Çemo, çem çivîko

Kum û koloz dor kulîlko

Minê sondek xwariye, adek pê ra

Paşî te, tu dest naçin van paşila

Herçê kêla haj hev hene

Bîna çiyayê Girîdaxê-Tendûrekê berî hev e

Wekî tê min ra bext bî-bext be

Wekî bêbext î-mirazê te bikeve dara dirya
qe venebe

Kastyûm Reşo, kastyûm xwe ke

Tûncik-temoriya serda şeke

Şanî-mirazê min qurbana canya xwe ke

Lawikê min sekiniye ser bêlayê

Min hûr-hûr bala xwe didayê

Were tu min ra bêbextiyê neke

Bêbextî qe li mala we nayê

Kerî pezê çendî wa ye

Nêriyê nav da weke ga ye

Sereşivan hatiye

Dûajo biçûkê-xew da maye

(1- Got: Hesenê Mehmûd. Ewî ji zarê
dayka xwe bineliya gundê nehya
Hoktênbêryanê yê Armavîrê Goga Mîrzo
hildaye. Gogê sala 1924'a Ji diya xwe
bûye. Ewê 12 zar anîne û terbet kirine.
Gele nimûnê zargotina civata kurda
zane. Kevaniya mala giran e, mêvanhiz
û qedirgir e û boy wê yekê jê ra divên:
"Xanima Kurmanciyê" W. E.)

Zewal qurba, tê wê diçî min xwe ra bibe here

Ezê şivê biçînim têtşya hespê te ra

Wekî tî û têrîza go: çi ye, çi nîn e

Ezê bêjim; kelî kiriye nevsê şanê xwe ra

Baran barî erd lewitî

Hespê delalê min tor bû lê şimîti

Ezê bidim teşî-kulya herim pêşiyê

Bira xelq bêje: evîndar bû, dilşewitî

Tu qîzika ser çiya yî

Gelo hîviya kê vir mayî

Ezê xwe tê têkim xwe yî



X.ABOVYAN *Di nava kurdan de*

Paşê daynim kêf û şayi (1)

Keçikê dînê

Çi evîntiya min û te kir
emrê min î

Kavilê di gunda da

Kesî serê kesî nekir
sebra min î

Berx û yaziyê ya min bûyi
xwedê nekir
emrê min î

Lo, lo gede, tu wê diçi

Wez çawa bim
poşman ez im

Ezê bivim teyrekî qereqûşî
hewa bavim
xerîbo lawiko

Emrê min î, şîrin can
Cî-miskenê-ser peyabim
Min poşmanê-ser peyabim
emrê min gede

Keçikê dînê

Ezê diçim-xema neke
emrê minî

Weyî êtimê, muhbeta dilê
min-te yek e

sebra min î

Weyî êtimê, dilê min geş e

Melûl neke

sebra minî

Olo gede

Tu wê diçi, yeman, ez dimînim
ola gede

Olo gede, ezê sebra dilê xwe
bi çi bînim

De tu dez mala destê xwe
bihêl bal min

Ezê xem-xeyala pê birevînim
poşman ez im

Keçikê dînê

Tê çavê reşê, bir û qorê
emrê min î

Weyî êtimê

Qolê zêra ser enya kever bide jorê
sebra min î

(1- Got : Sona sultan, 58-salî, bineliya gundê Lênamêrzê li nehya Êcmiyasîn)

Weyî êtimê

Were ramûsanekê bide min
Hergê nadî-ezê te ramûsim
Destê zorê sebra min î

Olo gede

Tu wê diçi, ez mam vira
poşman ez im

Wî bêbexto

Çavê min xalî nave ava van hêsira
heliyam gundo

Minê bihistiye: kavilê gunda
tu zewicî

Vir hada ezê bêm xûşkê
emrê min

Tu bê bira, helyam gund o

Keçikê dînê
 Ezê navê te hilnadim
 Te ra divêm porê, sebra min î
 Weyî êtîmê
 De tu were ramûsanekê min kerem ke
 Bira kul û keser
 Min ra neçe axa gorê poşman ez im

Olo lawiko
 Divê; derê malê meş-meş neke
 Nekeve xem-xiyala
 Cigara xwe geş neke poşman ez im
 Bila serê min qurbana serê te be
 Ez ya te me-miqîm
 Tu xwe şaş neke, poşman lawiko

Dînê,
 Dilê min hêlûna teyrê hewa,
 dînam dînê

Weyî êtîmê
 Lê digere komê qaza li qulinga
 refê kewa, sebra min î
 Weyî êtîmê
 Emekê minê par û pêrar ser te hebû
 Sala îsal diçe boşe, badîhewa
 emrê min î

Oro lawiko
 Dilê min kul e, ha birîn e
 emrê min tu yî
 Lawikê min çûye welatê xerîba
 haj min nîn e
 Bêbexto lawiko
 Diriya xwedê de be
 Kê mizgîniya delalê dilê 'm
 min ra bîne
 Bila paşê felek rûhê min bistîne
 heliyam gundo

Mirê min dînê,

Ezê dimirim yar sebeb e
 sebra min î
 Weyî êtîmê
 De bira tirba min derê mala
 bavê te be, sebra minê
 Weyî êtîmê
 Gava sivê zû radibî
 pêşa xwe lêxe, bêje:
 - Miriyo, rabe, lo, rehme li te be
 sebra min dînê

Olo lawiko,
 Wî alî derbaz be vî alî
 sebra min tu yî
 De çima, berxa min, tu hêrs dikevî
 zef dikalî, emrê min gede
 Were kavilê gunda da min birevîne
 De xwe re têke bermalî, lo bermalî (1)

(1-Têksita vê kilama evîntiyê me ji ber ra-
 dyoyê girtiye. Evê timê bi strana dengbêjê
 me yê hizkirî Efoyê Esed û Cemîla Çawîş
 bona radyo guhdara elam dikin. W. E.)

Gewra min avê tê,
 Bîna mêxik û darçîna ber piştê tê
 Devê min xala sûretê te keta
 Neçelmik ez bigirtima, bişandima Rûsêta

Te çevreşê heba tirî, serda tê bijang-birî
 Şûşa dilê min şikestiye, nacebirî
 Were mala me mêvanî
 Rabe, rûnî giranî
 Ezê ji te ra şerjêkim berxa serberanî

Tê bîna bayê biharê,
 Xudê bêjna bilind xeyrandiye rîşiyê şerê
 Heyfa min tê, axê gorê
 Xweda heland milê mertalê

Min hafa deştê

Dengê du zerya xweş tê

Ax dikim, xûna reş tê

Kal bûm, sed car kal bûm

Ezê nêzîkî heftê sal bûm

Sedan çevêd belek, xirabmal bûm

Hiv xeydiye naçe avan

Pêvir bela bûna li van navan

Îro bîst car roj e

Xew herimiye belek çevan

Serê xwendinê elifba ye

Xala sîvg û berê xelqê delal

sed û sê ye

Singê zeriya min weke mizgefta ye

Erzirûma kambax meriv lê bike

Dirozgêd nimêja eydê ye

Zozanê me baş in

Belekiyê berfê lê şeş in

Rewşê kurmanciyê:

Qîzê bi kezî, xortê sivik e

Teze teraş in

Tirba siyarê min himber e

Cotek merê serzer e

Goştê wî xwariye

Hestiya kirî sefer e


Siyarê holê syar bû xama

Koma xulama xu da cem e

Jêkir serê zeman-xanê ecem e

Min eskerê peya şandiye peyî wî

Dû dermanê gulava xweş pêra daniye



Lawiko

eger devê xwe bikî sîng û berê min

Xerîbiya te yê li te şîrîn be

Dilê minî birîndar e

Ax û wax badihewa ne

Kî dilê bengî jev biqetîne

Bira derdê min bibe para wî

Hespa lawikê min guh daliqandine

Koma siyara ser zengûha xwe raçandine

Lawikê min ketiye nava cêrgê eskerê Reşîd Paşa

Bejin û bala wî usan e

Tê qeyî bêjî mir û hakm e

(1-Heyf... Têkistê wane kurdî neketin destê me. Ev kilam me ji wê têkistê tercîme kirîye, ku cilda efrandinê X. Abovyane 8-da heye. Ew têkist ji zimanê almanî terci-mayî ermenî kirîne. Me cedanye akil û teqîla kurdî bidinê, lê pêra jî me bi xeber-xeber ew tercîme kirîye, wekî fikira wê jî orîgînalê zef dûr nekeve)

Heft steyrkê pêvir û mêzîna vebûne

Min ji vekirîye sîng û ber van mitala da

Paşê hespa xweva giştîme koma siyara

Li welatê Riştûnya (1)

Lawikê min hatiye bal me mêvanî

Min danî ber serê wî bazbenda xwe

Bin wî raxist xalîça Xurêsanî

Ezê çavê belek, bejin û bala xwe
 Bi dil û can porê wî ye kurîşkîra biguhêrim
 Lê eger bi wê jî qîma wî neyê
 Ezê canya xwe ye can qurban kim
 Lawikê min hat bal me mêvanî,
 Simêla kaw xweş ba dide
 Minê bi dil û can çavê belek ber danîna
 Lê ewî ramûsan ji min dixwest
 Min ramûsanek neda wî ye -
 Qe nefikirim dinê da mirin heye

(1-Qezak li Ermenistana Mezin)

KILAMA ÊZDIYAN

- *Têkoşînî, Mêranî û Egîdî* -

Ji Stembolê ferman hat
 Kulma Îslamê gele giran bûye
 Eskerê Reşîd paşa lawkê min bire ordiyê
 Weyî li min, ewî haqa qenc bû
 Çaxê çavê min ew dî, dilê min teqiya...

Ez çure bal xweyê xwe
 Welatê Golê, jê hîvî kir, gune min bîne
 Ewî hîvî-reca min qebûl nekir
 Ordya Reşîd-paşa bal çem hêwiriye
 Cesûs nikaribûn biçûna wî berî
 Min besek stend

Bal çiyayê Şengalê teslîm bibûn
 Xanimekê xwe xemilandibû
 Qerefîl pozê pîjînva kiribû
 Lawikê min ramûsanek ji min xwest
 Lê min nedaê û nizam kêra dihêvişînim

Were dem û heyamê me ne
 Kara xezala li deşta Diyarbekirê

Pala xwe daye girê bi gîha
 Zilamê kawe-kubar li deşta Diyarbekirê
 Bin konda lezeta hênkaya siyê divînin
 Ba liu wane kurîşk dixê, dihejîne (1)
 Lawikê Kawe-kubar şil bûne, qeyî bêjî barana
 gulanê ne

Bejna tê nazike dara çînarê
 Çavê te ya reş in reşbelek in

Porê wan lawikê kawe kurîşk
 Tê qeyî bêjî şirîte konê Temir-Paşa ne
 Ewilê payizê em sitar bûn
 Û ji Araratê derketin, daketin deştê

(1- Kurdê cahil (xort/genc) porê xwe dirêj
 dihêlin)

ŞÊX MÎRZA

Axao, me derketiye pêla ewrê vê nîsanê
 Kê girtiye ser kekê Melo
 bavê Hesên, Şêx Mîrzaê, koma êzdîxanê
 Reşît-Paşa caw şandiye peyî kekê Melo, divê:
 "Were jor dîwanê"
 Şêx Mîrzaê-Kekê Melo bavê Hesên
 siyarê Holê

Şêxê Êzdiya,
 Extiyarê merga kire gazî: "Reşît-Paşao
 min goveka
 dîne te rezil kiro, ezê iro êqîn
 serê xwe bidme oxira vê îmanê"

Wezîro, wezîro
 Wezîro, Şêxî dîne
 Sera Diyarbekirê dinherim kevirê mor e
 Eskerê Reşît-Paşa, Nefî-Emê giran e, kişya dor e
 Şêx Mîrzayê kire gazî, go: "Reşît-Paşa te ez
 xapandim gîzma hilkişandime dîwana here jor e

Ez Şêx Mîrzo me, Şêxê êzîxane me
 ezê roja îroyin

lêxin heta milê min dixebite -
hîviya min yekî jorin êzdiyê sor e


Wezîro, wezîro,
Şêxî dîn e
Axao, qesira bavê Melo,
kakê Hesên, siyarê Holê
dinhêrim kevirê mor e

Eskerê Reşîd Paşa
Nefî Emê giran e, kişya dor e
Reşîd-Paşa cab şandiyê peyî şêx Mîrzayê, dibê:
"Keremke, were dîwana here jor e"
Şêx Mîrzayê kire gazî, go: "Reşîd-Paşao, min sî
rojê te wa-wa kiro, hewariya te bê serê çiyayê
Şengalê, here Roma reş e derewîn e hewara
min bê siyarê rohilatê Ezdiyê Sor e

(1-Got Hesênê Mehmûd, ev kilam ji bavê
xwe-Mehmûdê Elî, binelî gundê nehiya
Hoktêmbêryanêyî Armavîrê, hildaye. Ew
sala 1923'a ji diya xwe bûye, sala 1980-
yî wefat bûye. W. E.)

Wezîro, wezîro
Şêxî dîne
Sera Diyarbekirê dinherim kevirê sir e
Reşîd Paşa kire gazî, go: "Şêxo, tê surman bi
zora şûr e"
Şêx Mîrzayê go: "Reşîd Paşao, min nîveka dînê
te wa-wa kiro, te çima mi' ra zû negot min
kose misirî şûre hêşin mal da nekira bîr e
Minê usa bikira, îro çît û mertalê te û malê te
bida ser e

Wezîro, wezîro, Şêxî dîn e
Axao, sera Diyarbekirê dinhêrim li vî destî
Xencera Şêx Mîrzayê, extiyarê Mergê,
kekê Melo, bavê Hesên syarê holê
nêrize, qewz e hestî
Şêx Mîrzayê kire gazî go:
"Reşîd Paşao, min sî rojê te rezil kiro
Minê 17 mêrê te kuştine li vî destî
Xwedê mala xencerçêkîra xirav ke,
mêrê 18-ada



xençera min şikestî

Wezîro, wezîro
Şêxî dîn e
Sera Diyarbekirê dinêrim devî rê ye
Çûyîn-hatina civatê û alemê tevî lê ye
Bira bavê min kiribe Miçoyê Şêx Îsaê
wele bi navê xwedê
Destê xwe hilda heyfa bavê Melo
şêxê êzdî, şêx Mîrzayê

Wezîro, wezîro
Şêxî dîn e
Axao, sera Diyarbekirê dinhêrim ax sed heyf e
Bira çavê serê min kore-kotî bin
têda nayê deng û sedayê

Miçoyê Şêx Îsaê
Na, wele qîrîna bavê Melo, kekê Hesên, siyarê holê,
Şêxê êzdya, extiyarê merga, Şêx Mîrzayê
Wezîro, wezîro
Şêxî dîne

■ ■ ■ Hew ■ ■ ■

YEKÎTIYA REWŞENBÎRÊN WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ-YRWK

ŞAXÊ SWÊDÊ BI KOMCIVÎNEKÊ DAMEZIRÎ

**BIJÎ BIZAVA
YEKÎTIYA REWŞENBÎRÊN WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ!**



Konferansa

Yekîtiya
Rewşenbîrên
Welatparêzên
Kurdistanê-YRWK

Şaxê Swêdê

Foto: REWŞEN

KONFERANSA YRWK'ê LI SWÊDÊ

Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê-YRWK Şaxê Swêdê, bi komcivîneka xwe ya yekemîn hate damezrîn. Ji dema damezrana Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê-YRWK li Almaniya, li bajarê Bonnê, xebata damezrandina şaxên YRWKê li navendên metropolên Ewropa jî, bireke girîng ji karê Komîteya Navendiya YRWKê bû. Bi komcivîna yekemîn a navenda YRWKê, Şaxê Frense hatibû damezrîn û bi awayeke fermî dest bi xebat û karguzeriya xwe kiribû. Li Rohilata Navîn Şaxê YRWK'ê mizginiya xwe, bi kovara xwe ya bi navê TOREVAN gihande hemû welatperwerên Kurdistanê. Piştî hingê du sal derbas bûn. Roja 18'yê meha Gulanê 1991'ê jî, Yekîtiya Rewşenbîrên Welat-

parêzên Kurdistanê-YRWK Şaxê Swêdê hate damezrîn.

Yekîtiya Rewşenbîrên welatparêzên Kurdistanê-YRWK Şaxê Swêdê, ji dema damezrana YRWKê, dest bi xebata damezrandina Şaxê Swêdê kiribû. Îro xebat û karguzeriya li ser vê riyê, di vê domanê de giha vê mebestê.

Komcivîn, bi kêliyeka rêzgirtina jî bo canê pakê şehîdên Kurdistanê û jî bo canê pakê dilsoz û têkoşerên rîya mirovayetiye, dest bi vekirina konferansê kir. Di rojpergalê de gelek armanc hatibûn diyarkirin. Berî destpêkirina xalên rojpergalê, ji başûr û jî Rohilata Kurdistanê beşdar û mêvanên Konferansê, hinde daxuyaniyên xwe yên nivîskî pêşkêşî konferansê kirin. Ji Başûra Kurdistanê PASOK û jî Rohilata Kurdistanê Bizava Komela KOMAR diyardanên xwe yên nivîskî bi xwendin pêşkêşî

konferansê kirin. Di van gotarên xwe de rewşa îroyin a Kurdistanê hanîn ber çav û bi hêz û quwwet helwêsta otonomîxwaz hate mehkûmkirin. Komela Mêjûya (Dîroka) Kurdistanê jî bi vî awayî diyardaneke nivîskî pêşkêşî konferansê kir. Bizava Proletarya Iraqî û Yekîtiya Xortên Şoreşgerên Welatparêzên Kurdistanê YXKê jî mesajên serkeftinê li gel gotarên xwe pêşkêşî konferansê kirin.

Di komcivîne de gelek nûnerên YRWKê jî bajarên Swêdê û jî Norwêcê amade bûn.

Komcivîn di Rapora Siyasî û Xebatê de rewşa Kurdistanê, herêmê û konjunktura cîhanî bi rexne ji ber çavan derbas kir.

Komcivîn jî bo beşdarbûna KOMCIVÎNA NAVENDIYA YRWKê nûneran diyar kir û li gorî rexne û pêşniyarên nûner û mêhvanan, bi bes-tina biryaran, bi serkeftinî dawî hat.

RAPORA SIYASÎ Û XEBATÊ YA ŞAXÊ SWÊDÊ

Qonaxa ku gelê me tê re derbas dibe, qonaxeke cihêkarekter û nişmî ye. Guhertin û pêşdeçûnên Rohilata Navîn û Kurdistan durehî (dudamrî) û dux-ismetî ne.

Rehên xetêrê û yên deriyên nuh ji bo qevzên neteweyî li ser rîya serxwebûnê muxelefe bûne.

Reh û demar li hev pêçayî û li hev badayî ne. Du aliyên yek zerazeng û yek prosesî ne.

Carina aliyê xeter û bivê xwe nîşan dide, lê ailyê hevîbexş û ronak bi bilindî berşefeq dibe. Carina pêlên windakirin û nemanê û carina jî yên mizgînî û şahiyê berezman dibin. Bûye derya pêl û firtonan welatê me.

Heq û neheq, pêşverûti û paşverûti, demokrasî û milîtarîzm cenga rizgarîxwaziyê û împeryalîzm bi gotineke kurt û kin şoreş û dijîşoreşê, ketine pêxêra hev û he-sabên qiran ji hevdu dipirsin.

Gişt dewletên Kurdistan di nava xwe de parçe kirine, kevnarî û emirmendiya hezar salan û emperyalîzm bi gişt teknîk û şarezaiya sedsala 20'an raserî Kurdistan hatine û ji bo kevir ji kevirê şoreşa me li ser hev nemîne û heta bi heta em careke din nikaribin pişt xwe rast bikin, her lîsk û xiniziyê dikin.

Bûye ferman Rohilata Navîn. Bûye qiyamet. Tiştêk ne weke xwe ye, weke xwe nemaye. Zeman diherike. Pir bi lez diherike. Bêhteng û bê sebr e. Xapînok û derewîn e. Carina bi me re ye û carina dikeve dijê me.

Sibe wê çi bibe, kêliya were, dê çi bibe cihê meraq û pirsê ye

Xelekên zincîra bûyer û ser-pêhatiyên paş didê tebaxa 1990'î. Bi şeweyekî li hev siwar bûn û reqîfîn hevdu, ku bi navê, mirov dikeve şikê: Gelo ji xeleka ewil heta bi ya dawîn qewmandin û rûdaw ne plankirî bûbin? Cihê destpêkê û beşdarên destpêkê li û cihê mesele lê qediya li ku?

Kurdistan bûye navend û merkeza dijatiyê û dijayetiya aktuel di Kurdistan de teqiya.

Komployeke palankirî heye. Govendgêr û serkêşên komployê împeryalîzm Amerîkî û dewleta Tirkîye ne. Hedef şoreşa Kurdistan, rêlêgirtina yekîtiya gelê Kurd û perçiqandina îrada netewî û organîzekirî ye. Cihûwarbûna leşkerê Amerîkî li Kurdistan û hevduîtina cepha Kurdistana Başûr û Seddam karakterekî din dane rewşa siyasî û navçeya Rohilata Navîn.

Hem ji bo Kurdistan û hem jî ji bo gişt netewên herêmê û dinyayê bi giştî ev dê bi xwe re pir tiştan bîne. Û ne mumkun e bi tenê bi Kurdistan û gelê kurd sînorkirî raweste.

Kurdistan direkt çar dewletên dagîrker, dewletên dagîrker jî gişt dunyayê têkildar dikin. Qencî jî û xerabî jî fêde jî û zerar jî herdu jî êdî dê hevbeş bin. Hevbeşî û muştarekbûna sînorqevêz û netewederbaskir jî, dê gişt netewên Rohilata Navîn di du sefên mezin û li dij hev, ji bo demokrasîyê û li dijî demokrasîyê bi împeryalîzmê re û li dij împeryalîzmê kom bike.

Xelekên kurdî di van herdu birên mezin û li dij hev ji niha ve li ser mustewa Kurdistan hatine pê bi awayê xetên otonomîst û xeta Kurdistana serbixwe de bi laş û gewd dibû.

Li Başûr û Li Bakur Serbixwe

Otonomîxwazî sal bi sal kevnepereştir dibe û îro bi xwirti ketiye ser rîya xiyaretê. Pişt xwe dide dijmin, xwedifroşe û dibe dardestê dewleta Tirkîyê û hêzên dagîrker û biyanî.

Derbasbûn û tarîxa serokayetiyan otonomîst tije birakujî û xayintî ye.

Birakujî û xayintî 30 sal in du xisletên esasî yên serokayetiya otonomîst in. Silêmanê Mûnî, Şivan û Seîd Elçî diyarî û xelatên şerokayetiya otonomîstê jî bo Şahê Îranê û dewleta Tirkîyê. Bila ji bîr nebe. Dinya ne dinya duh e. Duh çû û êdî jî nema vedigere. Kurdistan jî

ne Kurdistana 1967-68'ê yan jî 1972-73 ye. Gel şiyar e. Birayeti li her çar perçên Kurdistan pir xwurt e û reş û sipî jî hev cihê bûye. Kî jî bo xwe û welatê xwe û kî jî bo dijmin û hêzên dagîrker û kolonyalîstan e herkes dibîne. Strateg û îdeologên siyaseta otonomîzmê nas in. Bê gel û bê piştgirî ne û li ruyê gelê me nikarin binêrin. Berpirsiyarên her sê tirajediyan mezin li Kurdistanê, ferqa wan ji dijminan nemaye û ji dijminan jî dijmintir bûne.

Ne ev bitenê, xeta serbixwe îro organîzekirî ye. Xwedî rêberîyeke hevdem û jîr e. Partiya Karkerên Kurdistanê PKK heye. Şoreşeke mezin û xwedîperstî jî dar e.

Ji mêjve otonomîst di dawiya temenê xwe de ye. Ji neçarî û bêmeçalî ketiye himbêza Seddam, ji hambêzekê dikeve yeke din. Bêşexsiyet û bêrûmet bûye.

Li aliyekî sisiyan, mesela kurdan înternasyonalîze dibe û dikeve warê navneteweyî. Sînorên bêdengiyê hatine şikenandin û ev jî ji bo dagîrker û kolonyalîstên tirk, ereb û faris derbeke mezin û ji bo me jî destkeftinek e.

Statuya paş şerê cihanî yê yekemî hejriyaye. Kevirên sînoran dileqin. Gelê kurd ji xewa Eshabilkeyf rabûye û hayîdarê hêza xwe ye. Bûye partî, bûye cebhe û bûye Artêş. Îro PKK, ERNK û ARGK hene.

Belê ev e bi kurtî rastiya me di Rohilata Navîn de. Rastiya du xetên dijber û rewşa gelê kurd bi giştî li Kurdistan ji awira rawestgeha Gulana sala 1991'ê.

Hevalên rewşenbîr û welatparêzên Kurdistan!

Di demeke waha nasik (hesas) û nişmî de, ku a li welatê me mese-la şerê nav du xetên siyasî û rewşenbîrî aktuel e û pirsê kurdan êdî di nav sînorên welatekî û du dewletan de nayê ragirtin. Çi ne erkên me welatparêz û rewşenbîrên Kurdistanê?

Cihê me divê li ku be û em divê çi bikin?

Xebata rewşenbîrî, îdeolojîkî û fikrî di çi warî de ye? U em li derveyî welat heta bi çi derecê wezîfên xwe tînine cih?

Derveyî welat ji welat nikare qut be, derve bi hundir e hundir esas e. Xwurtî û rizgariya me li derve girêdayê guhertinan û xebatên li hundir e.

Derve divêt ji hundir re bibe alîkar, bibe dengê rast û rastgo li derve.

Îro li Ewrûpa û li her aliyê cihanê behsa kurdan dibe. Ji bo kurdan rayeke giştî û alîkarwaz ava dibe. Ev ber û produktê xebata salên serhildanî yên '90 û '91'ê û guhertinên mehên dawî ne.

Belê li vir tiştekî kêm û xelet heye. Ew jî ew e. Raya giştî ku çêdibe li ser esasekî çewt û ne ilmî û zanyarî bejin dide. Mesela gele kurd, mafê 30 milyon insan hêsan û biçûk dibe, dibe meseleke însanî û wextî. Pirsekeke mirovên bê cih û bê war û hewcedarên çadir û dermanan... Avakirina, raya giştî li ser vê bingehê, çêkirina komitan komkirina peran, li darxistina xwepêşandanên û her şêwe çalakî seqet e û ji aliyê perspektîfêkî dirêj bînirxandin di bin şikê de ye.

Pirs pirsê gelkî bindest, mafê devleteke serbixwe û Kurdistaneke azad û yekeker e.

Ji vê awirê gava em li xebatên van herdû mehên dawî ku bi navê Cebhê Başûrê Kurdistanê bûne binerîn ji fêdê zêdetir zêder dane û ne bi tenê li Kurdistanê belê her wiha li vir li Swêd û Ewrûpa jî em bi xerakirin, defor-mekirin û dijminahiyên pratîk û otonomîzmê re li hember hev in.

Li Swêd hejmarek programên radyo hatin çêkirin. Hinde kes bi navê Cebha Kurdistan, cebha xerakirinê, derketin televîzyonan. Bi navê kurd û Kurdistanê înfomas-yon dan, qise kirin.

We dît, we bihist. Niwênerê Cebha Başûrê Kurdistanê çi digot: "Serxwebûn xewn e. Kesê behsa serxwebûnê dike xewnan dibîne." (!)

Ev seqet e, xayintî û dijminayeti ye, înfomasyonê ne rast û derewîn e. Hem jî di demekê de ku çar milyon insan li seranserê bajarên Kurdistanê rabûbûn ser xwe û ji sedî 95'ê axa Başûra Kurdistanê xistibûn bin destên xwe, peyvên wilo heger naxayintî be ji ehmeqiyê û bêxeberiyê pê ve çi ne? Mirov dikare çi navî lê bike? Em navekî ji vî navî rasttir nabînin. Tişt gerek e bi navên wan yê rast bêne bi navkirin. Nav û methûm divê li hev bikin. Belê, ev xayintî û dijminayeti ye, avakirina rayekeke giştî yî sexte û nedurist e.



Me rayeke giştî û sexte navê, ev ne derman û ne çare ye.

Em ne parsek in. Kesên bi çavên parsekan li xwe dinerin hene di nav me de. Mirovên mîna nivênêkê cebhên Başûra Kurdistanê, Emer Şêxmûs, Mehmûd Bakşî û Mihemed Uzûn bi çi çavî li xwe dinerin bi kêfa xwe ne. Xwe beramber kesî û tu tiştî berpîrsiyar nabînin. Her tişt li bejna wan têt û ev kirine felsefa jiy-anê ji bo xwe.

Ew ji rewşenbîr in! Behsa Ehmedê Xanê, Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran dikin. Roman û çîrokan dinivîsinin. Li Unîversîtan xwedî kursî ne. Xwedê giravî pîspor û şarezayên mesela kurdî ne. (?)!

Rewşenbîrên wilo serê xwe bixwin, wê bi kêrî Kurdistanê û çi bînin?

Hêjan e çi û şexsiyeta wan çend pere ye?

Ji me re ne lazim in kesên wilo!

Ev *taxim* wê roj bê ku nikaribin li çavên xelkê, welatê xwe binerîn û ji

ber gotinên xwe ku bûne belge serê xwe di ber xwe xin. Ev *taxim* ne serbilindahî û rûmet, belê sernizmayî û leke ne.

Ev *taxim* ne zariwên Ehmedê Xanê, Xalid Begê Cibrî, Elî Şêr, Nûredîn Dêrsimî, Mezlûm Doxan in. Nevî û torinên Ebduleh Cewdet, Cihad baban û kesên mîna wan in. Di tiradisyona rewşenbîriya kurdî de damara şexsiyetezîf, damara otonomîst û reformîst in.

Hevalên welatparêz!

Gotin nebes e, kar divêt. Gotin û kar bi hev re hêja ne û xwedî nîrx

in.

Gotina ilmî û karê rast, helwêsta rast me divêt îro. Xweorganîzekirin, organîzebûyin divêt. Di nav rewşenbîr û siyasîyên kurd li derveyî welat de munaqeseyekî xwurt û zindû heye. Hestê Kurdistanî û serbixweyîyê, serî hildaye û rexneyên li cihanbîniya otonomîstî têne girtin bi seetan tûndtir û radîkaltir dibin.

Midaxela vê munaqesê divêt, jê re rêberî divêt, kanalîzekirin û ilmîkirina wê divêt.

Munaqesê vê carê ji munaqeseyên paş teslîmbûna serokayetiya malbata Barzanî li welat û derveyî welat derketibûn pîr firehtir û kûrtir in. û di şert û mercên pîr cihê û ji awir û riwangeya mējuyê Kurdistanî û serbixweyîyê de pîr bi aweatajtir de dibin.

Ji ber wilo em damezirandina Komîta Hevkarî ya Komeleyên Kurdistanê di cihê xwe de dibînin û bi çavê xebatê, ilmîkirina munaqesên,

organîzekirina kes û miravên Kurdistanî ji her çar aliyên Kurdistanê lê dinerin. û li ser vî esasi bixêhatina wê dikin.

Amadeyiya hevalên me ji Başûr, Rohilat û Başûrê Rohilat di konferansa me ya îroyîn de, hevalên me ji Komar û Komela Mêjûyê Kurdistanê destpêkeke nuh û ji bo me hêz û qewet e.

Hevalên hêja!

Xwuşk û birayên konferansê!

Em rewşenbîrên Kurdistan xwedî kêmanî û qusûrên mezin in.

Qusûrên rewşenbîrên kurd ne yek û dido belê bi sedan û bêhijmar in. Rewşenbîrên me rola xwe nalîzin û heta van salên dawî jî heger mirov çend rewşenbîrên şoreşgerên proletarî ên şehîd dehêne alîkî, me tu hunêrên rewşenbîrên kurd nedîne.

Bi gotinên rewşenbîrêkî kurd bi navê A. Dîkilî, hêjmarek mezin ji rewşenbîrên me îro di riya Ugur Mûmcû, İlhan Selçûk û Ecewît de diçin.

Pirs û pirsgerêkên rewşenbîrî ku li welat û aliyên cihanê ji aliyê rewşenbîrên tene çareserkirin û dermankirin bi dehan in û hê destnedayî ne.

Tiştên ji me tene xwestin hene. Rewşenbîrên kurd deyndarên netewa xwe ne. Tu kar nekirine. Karên sedsalan ketine ser hev bûne lod û bender.

Rewşenbîrên me bi alîkariya biyaniyan xwe dinasin xwe bi qeys biyaniyê ha jî be otorîte qebûl nakin.

Otorîten tarîxê, otorîten edebî, otorîten folklorî û zimanî divên.

Di nav rewşenbîrên kurd de sersarî û bexemiyeke fireh û qirnan tê heye.

Rewşenbîrên li derveyî welat ji yên li hundirê welat in, di zindanan de ne û di nav şertên dijwar de kar dikin, gelekî paştir in. Şoreşa Kurdistan bi taybetî li bakura welêt bi qewzên mezin û tarîxî ber bi pêş de dire. Li Ewrûpa û li derveyî welat prose-sekî ters û bervajî heye. Rewşenbîrên me yan jî siyasiyên me yên li derveyî welêt, heger beşê nêzikî Partiya Karerên Kurdistanê-PKK û hejmareke biçûk ji

rewşenbîrên Kurdistan yên perçên din bête cihêkirin, di nav nekirkeriyê de wextê xwe dikujin û li bendeyî rehma xwedê û ewrûpiyan in ku ji bo Kurdistanê tiştêkî bikin.

Hejmara ji xwe dipirse em çî dikin, ji sedî çendê wextê me dikeve xizmeta welat? Me çî berhem dane? Ewçend salên min ez li derveyî welat im min çî huner hene? Min bi çî kertê alîkariya xebata ji bo azadiya welatê xwe kiriye? Kesê van pirsan ji xwe dikin pir kêmin.



Tempoya xebatê pir hêdî ye û alakiyên fikrî û îdeolojîkî lewaz in. Tembêlî û tiraletî ecêb e. Hesasiyet kêmin e. Çalakiyên rewşenbîrî û berhemên rewşenbîrî qet bersiva pêşketina li welêt nadin. Li welatên xelkê nadexisin. Pozê wan naşewite. Tempoyekî normal, fedekariyê demdemî û normal, mijûlahiyêke bi minasebet û gerêdayê çend rojên nas nikare karê rewşenbîrêkî ciddî û welatparêz be.

Em welatekî bindest in. Parçekirî ne û dijminên me çend dewlet bi hev re ne.

Rewş û rastiya gelê me tempo, fedakarî, merxasî û şarezaiyêke bêmîmune dixwaze.

Otonomîst, reformîst û siyasiyên klasîk û dirêjayî û dewamên wan li Ewrûpa dikarin xwe bi tempoyêke klasîk û kevnêr bixapînin û bi hêviya alîkariyêke ewrûpî parsektiya xwe bidomînin.

Parsektî karê wan e û ji bo wan bûye suruşt û exlaq û êdî nikarin dev jê berdin. Dev ji wê parsektiyê bernadin.

Ew bi qîma xwe ne. Lê em ni karin qîma xwe bînin. Ew qîma xwe bi her kêmaniyê tînin.

Ji bo wan kar û xebatên tîn kirin bes e û zêde ye jî, ji ber ku çalakiyêke bi vî tewrî bi stratejî û programê wan re jî li hev dike û hatin û pêşeroja xwe bi ya netewe û welatên serdest ve girêdayî dibînin.

Em hevalbendên serxwebûnê, rewşenbîrên Kurdistanê yeker û serbixwe em nikarin xwe bi tem

poyêke weha bixapînin û divêt em bi giş aliyên xwe ji ên daholvan û zurnevanên otonomiyê cihê bin û ferq bikin.

Ferqa nav me û wan divêt ne tenê di sloganên û gotinan de be. Belê ev ferq divêt di berpirsiyariya beramber şoreşa welat, şehîd û zindaniyên welat de di berpirsiyariya beramber kultur û çanda welat û giş hêjayiyên neteweyî de xwe bi xurtî û bê dudilî pêşan bide.

Ferqeke din, girêdayê mesela şexsiyete ye. Şexsiyeta raser û hakim heta neha şexsiyeta otonomîst bû. Ev şexsiyete birîndar û bêkarakter e. Ev şexsiyete divêt li her derê li hundir û li derve bi devkî û bi nivîskî di roman û çirokan de, di piyês û skeçan de û di her şêwe analîz û lêkolînan de bête mehkûmkirin û ruswakirin.

Li welatê me şexsiyeteke xurt, Kurdistanî radîkal çêdibe. Nişan û berjengên vê şexsiyete pir in. Berxwedanvanên zindanan, şehîdên riya serxwebûn û azadiyê,

rabûn xelkê li bajar û gundan her yekê bi serê xwe bi şexsiyeta nuh ve barkirî ne. Û damarek ji yên mê jî, mantalîte û psîkolojiya nuh in.

Di nav erkên rewşenbîrên me de di tenîştina riswakirin û binerdkirina şexsiyeta kevn de berzikirin, populerkirin û nasandina vê şexsiyeta xort û dînamîk jî heye.

Piraniya rewşenbîrên kurd, bi taybetî ewanê bi kurdî dixwînin, dinivîsinin û bi kurdî difikirin li Swêdê ne. Bêje hema giş kovar û rojnameyên kurdî Serxwebûn, Brexwedan û Rewşen ne tê de, li Swêd derdikevin, li Swêd finanase dibin û cardî ji Swêd li Ewropa bela dibin. 20-40 *Forlag*, anku weşanxane hene li Swêdê. Salê hejmarek kitêb derdikevin û bi kurdî. Belê hin ji wan nayên firotin. Xwediyê kitêban nikarin bifiroşin, nikarin xwe bigihînin bazar û sûka kitêban. Xwendevan nivîsevan dûrî xwendevanan, dûrî welat û rastiya welat in. Di nav kaprîs û kompleksên jiyanêke ferdî û ji xwe re xwe bi xwe dişewitînin. Xwe di-xapînin, bêhna xwe bi tiştên biçûk, anarşîk û hedefnabînin derdixin. Ni-karin produktîv û bêrdar bin. Tiştên dikin besit û vêt in. Sererû û kopyayî ne. Dilop in, bi ketina xwe ziwa dibin.

Kombûn û merkezîbûyîneke hemdem û modern çare ye. Ji belawelayîye tiştêk çênabe û belawelayî pûç û vala ye. Pûş e bê zad e.

Bi hezaran Serxwebûn, Brexwedan, Rewşen û Dengê Kurdistan belav dibe, li welat û li derve. Meqalenivîs nizane çilo û çawa bela dibe, çawa digihe xelkê. Belavkirin û bixelkê gihandin karekî organizasyonî ye û bi lez û hewarî tê cîh. Heta kitêbeka rewşenbîrekî bi serêve digihê xwendevanekî, bi sedan kitêbên YRWKê digihên destê xwendevanan. Ev ferqek mezin e. Kesek û du kes pir tiştan nikarin bikin, bikin jî nikarin bigihînin cîhên ku gerek e bigihê. Belê kombûn û merkezîbûyînin di nav yekîtiyêke xwurt û mezin î rewşenbîrî de dikare qebiliyetên me çend qat bike û ji bo me gişt îmkân û jîrekiya xwe têxin

kar ji bo me bibe afîkar û navgîn.

Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan bi vê mebestê hatiye avakirin û damezrandin. Merkeza Yekîtiyê li Almanya li bajarê Bonnê ye. Organa yekîtiyê kovara REWŞEN e. Avakirina Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdisatan hewl û qevzeke tarîxî ye. Avahiyeke hemdem û modern e li ser esasên prensîbên Kurdîstanî mêtîyekî nuh î welatparêziyê û rexnegiriyê ava bûye. Rêxnekirawekî radîkal û layangir û piştgirê şoreşa Kurdistan û şerê çekdarî ye. Li dijî otonomîzmê û her şêwe çarçeweyên kulturî ye. Şervan û têkoşerê azadiya Kurdistanê serbixwe û yeker e.

Ji bo rewşenbîr rola xwe bi baştirin û bi kêrtirîn şêwe bilîzin, ji bo ku gişt karî û zanebûnên xwe di karxin û di gişt aliyên jiyandî rê li dijîminên welatê me teng bikin, avakirina yekîtiyên xwurt û Kurdistanî divên. Ji yekîtiyê hevbendî û ji hevbendiyê jî xwurtî û hunerên mezin tene pê.

Bi vê mebestê, li meha 10'ê ya sala 1990'î me hejmarek rewşenbîr, li ser esasê xebat û zemîna ku heta wê demê pêkhatibû, civîneke berfireh li dar xist û di civînê de me Komîte û programekî wextî ji bo 6 mehan anî pê.

Ji civîna yekemîn û vir de me du civînen din kirin û me biryar girt ku civîna îro jî bikin konferans û êdî li vir li Swêdê jî Şaxekî Yekîtiyê ava bibe. Li gorî lêkolîna ku me heta niha kiriye û kar û xebata komîta me di çarçewa programa şeşmehî de ji bo avakirina yekîtiyêke xwurt û kompetent zemîn heye û gişt hoy û sebebên ilmî me ji bo hewleke waha daye. Ji civîna yekemîn û heta konferansa îro me çi kir, rewş çi ye, yekîtiya rewşenbîran di çi warî de ye? Berî hertiştî em dikarin bêjin ku îro yekîtiya rewşenbîran li Swêdê di nav kurdan her çar aliyê welatê me de heta bi cîhekî hatiye naskirin. Meydan û zemîna dayin û standin û têkiliyan berfirehtir bûye. Rewşenbîrên rasterast yan îndirekt angajeyî çalakîyên yekîtiyê dibin. Bi nivîs û wergerandinên xwe erebî û bi zaravayê soranî û jî tirkî, dibin afîkar. Di van çend mehan de karên hatine kirin, kê mî in helbet. Bir-yarên hatine cîh, biryarên nivîrê

hatine cîh û biryarên qet nehatine cîh hene. Ev hinekî jî girêdayê qonaxa xebatê û rewşa wextî ye. Ev qonax qonaxa derbasbûnê, qonaxa di aliyê zemîn de sinorkirî bû û qonaxêke bi vî rengî jî taybetî û xisletên xwe hene. Esas qonaxa normal û resmî dê piştî organên salê di konferasê de bêne dîyarkirin dê dest pê bikin.

Di çend xalan de bête komkirin ev in xebatên komîtê:

A- Aliyê rêxistinî

Zîndûragirtina pêwendiyên bi merkeza YRWKê re li Bonnê. Girtina protokola civînan. Vexwendina endam û hevalbendan dan bi nivîsin jî bo civînan. Postekirina gişt meqale, hevpeyvîn û wergerandinên ji Swêdî ji merkezê re. Arşivkirin û dosyekirina xebatên komîtê.

B- Nivîsîn, hevpeyvîn û meqalên hatine wergerandin û xebatên girêdayê wergerandina ji zimanekî bo yê din û ji dîyalektekî bo yê din.

Di nav çalakîyên komîtê de û bi însiyatîva komîtê hatine kirin, wergerandinên hatine kirin cîhekî yekemîn digrin. Me ji tecrûbeya xwe ya çend mehan nasî ku wergerandin xizmeteke mezin dike û alîkarek baş e ji bo hevdûnasîn û li hevdûnêzîkbûna welatparêz û rewşenbîrên Kurdistan. Wergerandina meqalên Îsmail BEŞİKÇÎ, hevpeyvînen bi İsmet Şerîf Wanî re hatine kirin û cardî hevpeyvîna bi İ. BEŞİKÇÎ re hatiye kirin û belakirina wan li hevalên endam û dost bû alîkarvanekî baş ji bo kurdên Başûr, Rohilat û Rohilata rojava ji bo ku şoreşa bakura Kurdistanê baştir binasin û bibin xwedî rayeke objektîfî û zanistî.

Dîsan wergerandinên xeber û meqalên rojname û çapemeniya Swêd weke şaxekî wergerandinê ya cuda hate girtin û bi dehan xeber û meqale me kirine tirkî, kurdî û heta carina jî erebî.

C - Di nav xebatên Komîtê de Avakirina Komîta hevkarî piştî çend civînen hevbeş, danîştina programekî kar, organizekirina semînerêke bi alîkariya komîta Hevkarî dikare bête hejmartin.

BIRYARÊN KOMCIVÎNA YRWKÊ - ŞAXÊ SWÊDÊ

Ji bo Nêzîkkirina ZARAVAYÊN ZIMANÊ KURDÎ

Parçe-parçebûna welatê me derbeke mezin li me daye. Hêz û kapasîta me ya netewî girtiyê bin kontrolê û bûye mezintirîn rêlêgirê zimanê kurdî ku bibe zimanekî edebî û yekgirtî.

Mesela diyalekt û devokan meseleyek e ku ji bo her zimanî heye. Zimanên navneteweyî mîna Îngîlîzî, frensî û almanî bi xwe jî ji diyalektên navçe û herêmên cihê li Îngîltere, li Frense û li Almanya pêkhatine. Heta îro jî ferq û cudayiyên nav diyalektan bi temamî ranebûne li nav van welatan.

Ji bo nimûne, li Swêdê hejmarek diyalekt hene û cudabûniyên nav diyalektên Skone û Norrland ew çend mezin in ku kesên van her du navçeyan, dikarin hevdu dijar fêhm bikin. Dîyalekt dewlemendiya zimanekî ne.

Dewleta neteweyî, çapemenî û weşanên merkezi radyo û televîzyon û berî her tiştî perwerdeyî- eke modern û welatgir, lîteratur û edebiyata hevbeş û alfabetik hevbeş mezintirîn alîkar û rexweskirin jibo avabûna zimanê standart yan jî yekgirtî û edebî.

Diyarî û berhelastên li ser rîya zimanekî yekgirtî ne tenê sînorên dewletên dagîrker û kolonyalist, paktên mîna Sadebad, Bexdê û Cento ne. Belê di nav van dijarîyan de karanîna 3 cûre alfabetan jî heye.

Zimanê kurdî heta vê rojê bi gelek diyalektan tete dengkirin û bi çend cûre tîpan tete nivîsîn. Nêzîkkirina diyalektan divêt ev ji kar û delametên rewşenbîran be. Bi mebest û armanca lihevnezişkirinê em dê li pêş li ser van xalan rawestin.

● Vekirina kursên zimên bi her sê diyalektên kurdî, bi yê kurmancî, soranî û dimilkî.

● Amadekirina ferhengokeke

biçûk a kurdî-kurdî ku tete de beşên kurmancî - soranî - dimilkî jî hebin.

● Weşandina nivîsên soranî bi tîpên latînî.

SEMÎNAR LI SER PIRSÊN REWŞENBÎRÎYÊ

Em Yekîtiya Rewşenbîran in. Yekîtiyeke xwurt, xwedî otorîte û prestîj hedef û amanca me ye. Yekîtiya Rewşenbîran divêt li ser hev pirseke serekî ya neteweyî û navneteweyî aghdar û xwedîgotin be. Yekîti pêwîst e bibe merkeza û navenda perwerdekirinê, pêşxistin û rohnîdarkirinê.

Erkên rewşenbîran hene, barê rewşenbîran giran e û rewşenbîrekî layiqê navê rewşenbîrîyê bi berpirsiyariyeke rasterastî re rûberî ye.

Kîjan mirov dikare bibe rewşenbîr? Rewşenbîrî çî ye? Di welatekî bîndest de erk û delametên rewşenbîriya welatparêz çî ne? Pirsên bîngehîn yê ziman û çanda me çî ne?

Bona ev pirs û pirsên mîna van werine rohnîkirin, em dê li ser van xalên jêrîn rawestin:

● Pêşkêşkirina semînarên cûre-cûre li ser van pirsên jorîn. Semînar her mehê li ser pîrsekê amade be.

● Ev kar ango karê semînanan dê li gora programekî bi rêberî û însiyatîfa Komîta Kargêr bête amadekirin.

● Hevalê ku semînarê bide bi kanal û rîya Komîta Kargêr li Swêdê bi kêmanî berî mehekê dê endam û hevalbendên yekîtiyê aghdar bike.

LI SER PÊŞXISTINA PROGRAMÊN RADYOYA DENGÊ SERXWEBÛNÊ

Di jiyana civatan de cihê radyo û weşanên girseyî anku bi zimanê

latînî masmedia çendîn mezin e, em dibînin. Lewra weşanên radyoyî kaş û çîyan, deşt û newalan û çem û rûbaran Nas nakin. Gişt di-qewêzin, dihêjin her alî û dikevin her malê.

Di yek kêfê de bi milyonan mirov bi hev re, li mala xwe de, li kursî û nivîna xwe de, dikarin li axaftineke siyasî, mûsîqakê, piyeseke, çîrokekê yan jî, li serpêhatiyekê bibin guhdar.

Ne tenê li welatekî belê li welatên cîran, li seranserê cîhanê çî dibe, çî diqewime bi alîkariya radyo û televîzyonan tete nasin û fêmkirin.

Hêza kitêb û belavokan li ba ya radyo û televîzyonan lewaz û jar dimîne û cihê radyo û televîzyonê ne kitêb ne rojname û ne jî belavok dikarin bigrin.

Dagîrkerên welatê me vê baş dizanin. Em jî îro bi vê rastiye hayîdar bûne.

Niha di destê YRWKê Şaxê Swêdê de heftê du seet weşana radyoyî heye. Girîng e ev radyo bibe navendeke belakirina her cûre pirsên huner û wêjeya kurdî bi hemû diyalektan. Programên wê dewlemend bibin û bala hemû kurdên li Stockholmê bikşînin. Lewma jî:

● Çêkirina hevpeyvînên cûre-cûre bi rewşenbîrên welatparêz re

● Weşandina programên xwe bi hemû diyalektan li gora îmkanan

● Amadekirina programên zarokan yê bi zimanekî sivik û li ser pirsên gelekî balkêş

● Amadekirina kasetên zarokan û bi berfirehî belakirina wan

● Ji mehê carekê şandina kasetta radyo ji her welatekî Ewropa re

● Li pêş amadekirina kitêb û broşûran ji programên radyo

● Ji bo em li pêş em bibin xwedî radyoyekê ji bo seraserê Swêd xebatînin û hewldayin.

LI SER ALÛKARIYÊN JI BO PÊŞGIRTINA ŞERÊ SERXWEBÛN Û AZADIYA KURDISTANÊ

Gelê me ji xewa qirnan şiyar bûye, xwe ji zingar û gemara hezarênan salan dawîşîne.

Pêlên welatparêziyê di ser hev re diqulipin. Yekîtiya gel ava dibe. Xebat û berxwedan, modern û pîralî ye. Hestê Kurdistanek serbixwe û azad geş û gur e. Nîrê koletiyê dişikê. Dagîrkerî û kolonyalîzm diheje.

Di demeka waha de divêt piştgiriya gelê me bête kirin û dengê wî yê heqxwaz bigihe raya giştî û demokratîkî li cîhanê.

Ji ber vê yekê berpirsiyariyên me hene û ji me pir tişt têne xwestin.

Di hemû şoreşên rizgariya neteweyî de her demê rewşenbîrên şoreşger û welatparêz bûne motorên pêşketinê û rewşa gelê xwe bi xwurtî rohnî û zelal kirine.

Lewma jî girîng e bi hemû derfetên xwe em têkevin nava girsên gel û hewl bidin pirsên bingehîn çareser bikin.

Di vî babetî de ji bo konferansê pêşneyarên me ev in ji bo biryaran:

- Nasandina têkoşîna rizgariya netewa Kurdistanê bi hemû hêz û rêxistinên demokrat û pêşverû yên cîhanî

- Amadekirin û pêşxistina nivîsên siyasî li ser pîrsa serxwebûna welat û hêviyên gel

- Avakirina alîkariyê xwurt li gel hemû yekîtiyên û komeleyên Kurdistan yên bi bîr û baweriyên serxwebûnê dilivin

- Swêdîkirina belavok buroşur û nivîsînên aktuel li ser Kurdistanê bûyerên Kurdistanê

- Alîkariya Kurdistan Komîte ku di vê qadê de, di zemanekî nêzîk de, li pêşiya me bête avakirin.

- Li darxistin û organîzekirina civîn û konferansan ji bo rojnamenivîsaran û kesên li derveyî Kurdistan ku dixwazin bibin xwedî înfomasyon li ser rewşa rojane li Kurdistanê

- Xwurtkirina têkilî û dayîn û stanan bi xelkên biyanî yên ne Swêdî ji Rohilata Navîn Asya,

Afrika û Amerîka Latîni û hewldayin ji bo wergirtina piştgiriya wan li Swêdê.

- Xwurtkirin, pihêtkirin û xwurtkirina pêwendiyên bi komelên endamên Komîta Hevkarî re. Wergirtina biryar û projeyên hevbeş û xebat ji bo cêbecêkirina wan.

LI SER KOVARA REWŞENÊ Û KARÊN WERGERANDINÊ

Derketina rojnama Kurdistan zêdeyî sedsalî dibe. Ev gavekî mezin û tarîxî ye. Hewl û hemleyeke rewşenbîrên kurd e. Bi rojnama Kurdistan rewşenbîriya gelê kurd dikeve qonaxê berz û bilindtir. Xisletek ji yên rewşenbîriya modern û hevdemî, derxistina kovar û rojnama e.

Rojnamenivîsî, meqalenivîsî û bi pirs û pîrgirêkên civakî, siyasî û kulturî daketin bi rojnâme û kovaran re bi pêş dikeve û distewe.

Jiyan û cîhana îro bê kovar nabe û kovar û rojnâme bûne parçek jiyandê.

Ji derçûna rojnama Kurdistan û vir de li her aliyê welatê me bi dehnan kovar û rojnâme hatin û çûn. Emrê hin, kin û yên hinan pir dirêj bûn. Hin bi kalîte û hin bêkalîte bûn.

Bi baweriyê me kovara REWŞEN di nav kovarên heta îro de hatine û çûne yek ji seriyoztirinên kovara ne. Bi rastî kovara REWŞENÊ bi şeş jimarên xwe yên heta niha derketine bala hemû rewşenbîrên welatparêz kişandiyê û xwe gihandiyê bilindahiyê hêja di dilê gelek mirovan de. Bi sedan nameyên ku digihêne redaksiyona kovarê vê pîrsê îspat dikin.

Li her derê, hemû perçên Kurdistanê û hemû welatên Ewropa yên Rojava û Rohilat bi berfirehî belav dibe.

Ji hêla din ve gelê me li her çar perçên Kurdistanê li her parçeyekî di bin posîdeyên zimanê dewleta serdest de maye. Lewma jî pêwîst e gelek nivîs werine wergerandin bi zimanê kurdî (kurmançî-soranî-dimilkî).

Li ser vê bingehê em van xalên jêrîn dipejirînin :

- Vekirina kampanyekê bi navê **her mehê nivîsek ji bo REWŞENÊ**

- Amadekirina hevpeyvînan bi

rewşenbîr û nivîsevanên kurd re weşandina wan di REWŞENÊ de

- Wergerandina nivîsên balkêş û bi kelk ji zimanê Swêdî û zimanên din ji bo kovara REWŞENÊ. Ku ji nirxan nîrxekî wan heye

- Wergirtina meqalên baş ji kovarên bi taybetî Başûr û Rohilatê Kurdistan, Latînkirin û weşandina wan

- Xwurtkirina redaksiyona kovarê û alîkarbûyîn ji bo redaksiyona kovarê ji aliyê diyalektên kurdî de

- Her heval divêt kovara REWŞENÊ bi firehî bigehîne hemû mirovên dora xwe û nerîn, pêşniyar û rexneyên wan bigehîne redaksiyona REWŞENÊ.

- Komkirina wêneyên hêja bona arşîva REWŞENÊ.

- Peydakirina pirtûk û eserên kevin bona arşîva navendiya REWŞENÊ

- Wergerandina perçeyên çanda kurdî û gotarên siyasî yên cûre cûre bi hemû zimanên herêmê li îmkanan.

LI SER XWURTKIRINA KOMÎTA HEVKARÎ YA KOMELÊN KURDISTANÊ

Kurdistan welatê me ye û em kurd netewek in. Em sînorê nav Kurdistan nanasin. Ev sînor li derveyî îrade û daxwaza me hatine danîn û sînorên dewletên dagîrker û împeryalistî ne.

Amanc rakirin û têkdana van sînoran e.

Kurdistanibûn prensîbeka me ya serekî ye.

Ji bo xwurtkirina xebata yekîtiya gelê Kurdistan li ser bingeha serxwebûn û azadiyê pêşdebirina aksiyonên bi hev re li hevberî hêzên bi tenê berjewendên xwe yên teng diparêzin alternatîfên danî holê.

Li ser vê bingehê :

- Kirina semînarên hevbeş

- Alîkariya dualî di her babetî de mîna wergerandinê, şevên piştgiriya, belavokên hevbeş

- Amadekirina broşûrekê bi zimanê swêdî û li gora îmkana bi zimanên din yên navneteweyî ji swêdiyan û xelkên Ewropî ■

HEVPEYVÎNEK Di gel SEYDAYÊ TÎRÊJ

Pismam

XWENDEWARÊN HÊJA

Em di vê hejmarê de hevpeyvînek ku di sala 1989'ê de, di gel Seydayê Tîrêj çêbûye, diweşînin. Ev hevpeyvîn berê li kovara şaxê YRWK'ê li Rohilata Navîn, li **TOREVANê** weşiyaye. Em vê hevpeyvînê, ji bo ku berfirehtir bigihê girsan dîsan di kovara **REWŞENê** de diweşînin.

TOREVAN: Ji çakiya xwe ger Tu ji me re bi kurtî li ser jiyana xwe biaxifî...

TIRÊJ: Navê min Nayîfê Hiso ye. Bi Seydayê Tîrêj tême naskirin. Di sala 1923 de ez hatime dinayê. Di Heft saliya xwe de min dest bi xwandina Qûranê kir û ev xwandin sê salan dirêj kir. Piştî wê, bi salan min têkiliyê xurt bi Cegerxwîn re çêkir û dest bi nivîsina helbestan kir û heya niha ez pê re mijûl dibim. Ez di jiyana xwe de çirê eşiyam, ji lewre piraniya helbestên min wê dibêjin.

TOREVAN: Berî her tiştî, emê bipirsin dema ku mirov helbesta te Bilbilê Dilşad dixwîne, kela xwîna dilî pêra radibe û pêlan davêje ber bi jor. Gelo sedem çî ye ku ev hozana, reşê girêdide û şînê digêrin?

TIRÊJ: Belê, rast e, min helbesta "Bilbilê Dilşad" dema şkestina serhildana Barzanî ya sala 1975'ê nivîsî. Kela dilê min rabû û ez eşiyam. Her weke têtê zanîn merovê hozan û şair zû bi bûyeran dihesa û bi nalîna gelê xwe re dinale.

TOREVAN: Hêviyên te di malikên dawiyê de gelek xurt in. Bi dûrbîna wan hêviyan Kurdistan di çî rewşê de ye û gelê me di çî domanê de dijî?

TIRÊJ: Îro gelê kurd hişyar bûye. Kar û barê xwe nas kiriye û her weke min di helbesta xwe de gotiye; 'karwanê me bi rê ketiye' û wê bigihê mirad û meqseda xwe. Em ticaran bêhêvi nabin. Hêviya me di birûska devê tîfingan de ye:

"Piştî wê sitêrê
Bi xwe berbanga sibê ye
Dê roj hilê
Ronî têkevê şûna şevê ye
Karwanê me
Dê bighê war û meqsedê ye
Çêrx felekê
Her dem bi fitî û ger û dewr e..."

TOREVAN: Îro li bakura Kurdistanê şoreşek di bin ala Proletarya de bi rê ketiye, xebat û delameta nivîskarên welatparêz di vê şoreşê de çî ye?

TIRÊJ: Weke me got, hêviya me di birûska devê tîfinga wan de ye, şoreşger in, canfida ne... Ez wilo wan dibînim, di gel vê qehremaniya wan, divê em kesê torevan, nivîskar, rewşenbîr bi xama xwe dakevine qada cengê. Ev jî berpirsiariyê, divê em lê xwedan derkevin.

TOREVAN: Torevanê ku xwe bide yan, xwe nede bin barêziyê, xwe di quncikan de veşêre û bibêje min navê serêşî... Çêtir e ez li ser evî û dildariyê binivîsim. Û her weha, bi çî nêrinê tu li wî torevanî dinêrî?

TIRÊJ: Êw kesekî tirsonek e, hîn ez dikarim bôjim ne merov e. Jê re nayê gotin torevan. Ji ber ku karê torevan, xebatek e ji xebatên welatparêziyê ye. Û kesê dûrî vê xebatê tirsonek e. Lê ewê ku xwe di quncikên tarî de vedîşêre û dibêje ezê ji xwe re li ser evî û binivîsim, ez wê nivîsê ji berhemên torevaniyê nabînim. Xwediyê wê ne merov e.

Ez wilo lê dinêrim. Çima emê xwe veşêrin? Şoreşa ku em lê digeriyan, li bakura Kurdistanê arê wê gurr bûye. Divê em xwe vekin û xwe bêhtir jê re nêzik bikin. Ma em li benda çî ne?

TOREVAN: Para Kurdistanê di helbestên te de bi çiqasî bilind in? Anku Seydayê Tîrêj û bûka welatan Kurdistan çawa bi ser hev de dikelin?

TIRÊJ: Kesê hozan bêhtirî her mirovî bi welatê xwe têtê girêdan û gelekî diêşê. Ez wê di ser dil re dibînim. Pir şîrin e. Pir bûha û wilo ez li ser giranbûha û giranbûna wê dibêjim:

Ey welatê can bi gorî
gazîna te j' min nebe
Tu dizanî bi şev û rojan
ez im xemxwarê te me
Rêz û neqşê xameya min
navê tey şîrîn û xweş
Her wekî bilbil dinalim
ez pesindarê te me
Ger hemû kes aşîqê malê dinê,
çavê reş in
Ez evîndarê deşt û çîya û zinarê te me

TOREVAN: Îroj gelê Kurdistanê ber bi roja serxwebûnê diçe. Te çî li ser şoreşa serxwebûnê û azadiyê nivîsandine?

TIRÊJ: Min nivîsandîye û ezê binivîsim. Ji ber ku ew hêviya me ne. Mebesta me ne, pêşmerge ne û em hêvidar in ku perçakê welat rizgar bikin. Ez nîmûneyekê dermafê gotina xwe didim:



Seydayê Tîrêj

Dayê min berde ezê herim şer
Bavêj milê min tîfing û şeşşer
Wekî Mazlûm û Kemal û Ferhad
Canê xwe bikim bi gorî welat

TOREVAN: Rola nivîsokê di şoreşê de çî ye?

TIRÊJ: Di pêşketinê şoreşê de Xame roleke mezin dilîzê. Ez jî dizanim, tu jî dizanî ku roleke pêwîstê dilîzê. Bi bûyerên welatê xwe re ye. Bi şoreşê re ye. Karê ku ji torevanan têtê xwestin ev e. Ji ber ku dîrok jî wê têtê xwestin.

TOREVAN: Hinde nivîskar hene ku li Ewropa cî girtine û li wir dijîn. Bi fermana sosya şovenîstan û bi nivîsarên xwe êrîşî şoreşa netewî dikin. Tu wan çilo dibîni?

TIRÊJ: Ew dijmin in.

TOREVAN: Tu çî bangê ji wan ra dişîni?

TIRÊJ: Ez dibêjim werin qada rûmetê, werin namûsa xwe ya riswabûyî biparêzin! Min helbestek dermafê vegera wan nivîsiye:

Welat bang dikî va we dixwazî
Kêrî we nayê ger û tolazî
Çîqa bimînin hûn li devera
Di bircên belek, eywan û sera
Welatê xelkê nabê ji me ra
Welat xweştir e ji Çîn û ma çîn
Amed xweştir e ji şehrê Berlîn
Vegerin welat, vegerin welat!

TOREVAN: Di vê koçberêde tu kijan torevanî nêzikî şoreşê dibîni?

TIRÊJ: Ez torevanê wilo aneha nabînim. Dibe ku hin kes di "hava xebatê de hebin, lê mixabin ez wan nas nakim.

TOREVAN: Li dawîya vê hevpeyvînê em gelekî sipasî te dikin.

TIRÊJ: Ez jî **TOREVANê** re sipas dikim û pêşketina we dixwazim. □

HEMREŞ Û XEWNA MIRÎ

Dilbixwîn

Ev çîrok Ji rastiyê hatîye girtin. Ji yana kurdêkî belengaz û perîşan fîne ziman. Ji devê kalekî ku êdî beryî dawîya xwe diçû hatîye girtin. Wî jî Ji bavê xwe bihîştîye. Me tenê forma wê ya çîrokî guhartîye.

Dibêjin, li gundekî girêdayî baja-
rekî Kurdistanê, mirovekî belangaz û
perîşan hebûye. Wî ji 15 saliya xwe
ve dest bi gavantiyê kiribû. Bi rastî,
di çêrandina dewar û ga de kesekî
pispor û jêhatî bû. Ev, bi xwe jî, jê
re wekî keleparekê mabû. Bav û
bavpîrên wî yên panîqelîşî, porê xwe
li pişt keriyên çêlekên pîr, sipî ki-
ribûn. Çermê rûçikên xwe di jiyaneke
mirî de qermiçandibûn.

Bavê Hemo bi xwe, di 45 saliya
xwe de, dema ku gavanê axayê
gund bû, li çolê gayekî mîna xwediyê
xwe har, girgîn bû, hêrs rabû û tîzek
li dawa (nav, nowq) wî xist. Bi
lêdana yekemîn re ew li ser piştê
ramedand û herdû çav belloçî kirin.

Hemreş jî riya bavê xwe berneda.
Demê ew jî gav kir ku (mecbûr kir)
cêniga xwe bi gayên gund re sipî
bike û jiyane bi berdewamî, ji serê
beyanê heyanî rojava li gel wan
gayên ku êdî qels bûne, ji jarbûna
hestî bel bûne, çermê ku wan hes-
tiyan diniximîne û vedîşêre. Bi rastî
mîna çermê pêlaveke kevin û qe-
tiyayî xuya dikir. Ji bilî vê jiyane,
jiyaneke xweş xwe raberî wî nedikir.

Gelek caran Hemo xwezî bi miri-
na bavê xwe dihanî. Bi mebesta
lêdana mirinekê xwe dida ber tîza
çêlek û gayên serxweş û serberdayî.

Lê ji ber bextê reş, tenê carekê jî
wan panî nehavêtin wî. Dema ku
hêrsa wan radibê didane lotikan û
her yek bi aliyekî ve diçû. Hemreşê
bextreş jî, bê çare dima. Çav tijî
hêstir dibûn. Lêdana dilê wî xurt
dibû. Hezaran peyvên pîs û dijûn li
wê jiyana mirî dibarand. Çiqas mirin
pê şêrîn dibû!.. Hêvî dikir ku mirin di
wê kêliyê de were û wî ji vê ji-yana
fetisî rizgar bike.

Hema diran diçirisanandin û bi lez û
bezeke bi hêrs dida şopa wan ser-
xweş. Gelo, wê çilo qoçên wan ên
tûj bi dest xwe ve bîne? Gelekî zor
e bersiva vê pîrsê. Hemo têngahêje

ku bibersivîne. Ziman dirêj dibû, ke-
fik li hawîr dora lêvên peqitdayî ra-
dibû. Xwêdanê ew dixiste tayeke sar.
Temenê wî nivî diçû û dîsa jî, nika-
ribû hema gerdenê gayekî gidî di
nava zendên xwe de çember bike û
dilê xwe pê vehesîne. Ev yeka jê
re bû hesreteke giran. Bi piranî
rojên Hemo bi vê nolê derbas dibûn.

Ci rojan rojekê, weke her carê,
serê beyanê bi dengê dîkan re şiyar
bû. Ji nav nivîna xwe derket. Qutîka
titûnê ji bêrika xwe derxist, çixareke
stûr ji titûna Mûşê li gora daxwaza
dilê xwe pêça. Erişê kir û bi sê
kutên bi hêrs dawîya wê anî. Piştî
nimêja sibehê, li nava gund geriya.
Ga û çêlek li hev civandin û berê
keriyê wan da çêrê.

Kuxika Apê Hemo û bore-bora
wan gayên çavlixew, deşt û newalên
wê deverê dadigirtin. Bi rê ve,
Hemo xwîngerm dibû, kel radibû. Ge-
riya xwe zelal dikir û berdida vê
stranê:

*Dilê min liyan e
Dilê min liyan e
Serê vê sibê dîsa
Qîqê - qîqê dîkan e
Dîsa têtê,
bora - bora gan e*

*Pîştî min xûz bû
Barê min giran bû
Devê min makox û
bê diran e*

*Dilê min liyan e
Dilê min liyan e
Dunya çî sar e,
mij û dûman e
Mirin pîr xweş e
ev ne jiyane*

*Kesî rojekê
qîmet neda min
Her dem digotin
Hemo gavan e
Lê hema ezê
Ji îro pê ve*

*vî karî berdîm
Bkirime çar miyên
du can e
Dilê min liyan e
Dilê min liyan e
Sibe çî sar e
Çendî bi jan e*

Belê, şeva buhurî, Hemo û jina
xwe Zelîxe ya xwîngerm û zi-
manşêrîn, bi hev re pîlanek danibûn.

Divê Hemreş mehanetîya xwe ji
gundiyan bistîne û pê çar serî
miyên du can bikire. "Êdî bes e ev
gavantiya ku mirov bêrûmet dike" bi
xwe re digot. Hêviya wî bi vê yekê
pir bilind bû. Bi kirîna miyan re,
didît ku ew rûpeleke nûh ji bo jiya-
neke xweş vedike. Ji ber vê se-
demê, serê vê beyanê bi dilekî geş
ga û çêlek dabûn ber xwe û bi ser
wan de berdabû stranekê. Her
weha wan jî guhdar dikirin û hêdî-
hêdî bi gavên giran dimeşîyan.
Gîhane çêregehê. Birçibûnê ew
bêhêz kiribûn. Ji lewre bi hêrs
diçêriyan.

Berî ku roj biçe ava û dema veg-
era mal bibe, Hemo Kêliyêkê xilmaş
bû, bêyî ku haya wî ji rewşa ku ew
tê de hebe, ket xeweke giran.

Bi rastî wê rojê gelekî westiyabû.
Şeva buhurî razan neketibû çavan. Ji
ber ku ew û jina xwe ta nîveka şevê
hişyar mabûn. Li ser kirîna miyên du
can mijûl dibûn. Qapaxên çavên
xwe dan ser hev û ew bi ber pêla
xewn û xeyalên bê bîngêh û binyad
xistin.

"Di çarîka şeveke tarî de bû. Ba-
zirganekî mezin, di kirîna û firotina
pez û sewalan de nav û deng da.
Bû bajarî. Kirasê perispan kirî avêt û
taximekî bi neqîş bi ser xwe de ber-
da. Zarokên wî çêbûn. Nav li yekî
kir Misto, li yê din Temo. Misto bû
doktor. Temo jî bû avûkat. Wî bi
xwe jî bû padîshahekî bê tac û text.
Ji ber ku hîna nebûbû bav, Misto û
Temo gelekî li ber dilê wî şêrîn bûn.

Her yekî bûkeke mîna heyvê jê re
xwest û ew di şev û rojekê de, bi
şadîmanîyeke mezin zewucandin. Di
xewneke wilo şêrîn de bû. Pê xweş
hatibû, nedixwest dev jê berde. Heya

ku jê hat xwe pê ve girêda. Wê xewna vala heya serê beyanê ajot.

Di wê domanê de, komeke rêgiran (çete, eşqiyên) lê rast hatin. Bi rastî ev kes di diziyê de gelekî, pispör bû. Li der dorê wan gundan de bûn. Dema ku çav li wî keriyê ga çêlekên ketin, wekî ku tete gotin ji şabûna re hiş ji serê wan firiya. Çar kesan, hawîrdora ga û çêlekên mexelbûyî girtin û çember kirin. Mezinê wan jî, fermanarê wê girûba dizek, ber bi Hemreşê razayî hat. Devê tîfinga xwe ya reş ajot ser textê eniya wî, xwest bi dengêkî sivik hişyar bike:

- Gavan... gavan... xewar!

Lê mixabin, Apê Hemreş bi ser pêla xewneke şêrîn û xeweke giran ketibû. Mîna kevirekî hişk û biring, bê hîs û bê deng mabû. Dema ku serekê dizan dît, Hemo dil nîne ku hişyar bibe, wî jî nexwest ji xewê rake. Dest avête kurkê xwe yê hewramî, ji bedena xwe şeland û bi ser Hemo yê belengaz re zuşend. Berê xwe da her çar hevalên xwe, bêyî ku bêhna tirs û newêrîne were dilê wan, ew keriya dane ber xwe, birin û Hemreş di bin wî kurkê reş û di xewa giran de hiştin.

Heya nivê şevê, xew nehat ser çavên Zelîxê. Kelfî bi kelfî di ser kabûsekê de dijîya. Çav li ser rîya ku Hemo tere diçe û tere westiyân. Êdî dilê wê kire tipe-tip. Tirsîya ku tiştê hatibe serê Hemreşê perîşan. Rabû xeftanê xwe yê kurmancî, bi ser bejn û bala xwe ve berda, berwanek girêda, dilopên hêstiran li ser herdu dêman damalandin û berê xwe da mala Cimo, birayê Hemreş.

Cimo, mirovekî xewar û xew giran bû. Heya ku zelîxe ew hişyar kir derî bi kutan şikand, gundî tev pê hesiyân. Bi gurme-gurma derî re ezman vediciniqî. Ewte-ewta segan û zûre-zûra guran, zirava dile Zelîxe diqetan-din.

Gundî, bi hûr û girsan, wê şevê li dora zelîxê kom bûn. Her yekî ji aliyê xwe dipirsî "Gelo çi bûye?" we jî tenê dizanî bersifekê bide Hemo wenda bûye".

Kom bi kom xwe ji hev cuda kirin û bi wê çola bê kes û hes ketin. Her ku bang kin "Hemo... Hemo... Apê Hemo!..." Deng bi keviran ket, bi Hemreşê bê çare neket.. Pir geriyân, doş bûn, gêj bûn, ti der û dever nehîştin ku neçûne wir. Çawa kirin û nekirin, nedîtin. Hemo bû xwê û he-

liya. Bi stûxarî, bi bê çaretî û bi hêviyeke şikestî vegeriyân gund. Lê hema Zalîxê hêstir ji çavan mîna çemê Ferat diherikandin. Jinên gund jî, di pê dişewûtî, xwe li dora wê dicivandin û hêrsa wê dadixistin.

Gihîştin gund, li mala Hemo rûniştin, êdî her yekî pîrsek avête holê. Yekî got "Pîrhevokan ew birin". Yê din got "Na, guran ew xwarin". Lê hema porsîpiyê gund, peyva wan li xweşiya wî nehat. Rabû ser piyan, serê xwe xurand û gote civatê:

- Hûn bi tiştêkî nizanin. We têdernexist. Cinan ew bi xwe re birin. Zelfîxe lê vedigerîne û dibêje:

- Na, Apê Tahir, niviştî şêx Mehmûd di gerdana wî de bû. Quran xistibû berîka xwe. Ayeta El-kursî ji serî heya binî jiber kiribû. Gelo, cin bi cinan ketine ku nêzikî wî bibin? Her weha heya serê beyanê mijûl bûn û negihane çî encamekê.

Dema ku şefaqê lîxist û xwe ji xew çeng kir. Tirêja xwe ya sor ji nav zikê ezmanan kişand û zora xwe da ser tarîka şevê. Hingê Hemo çavên xwe vekirin. Li der dora xwe meyizand. Li kurkê reş nihêrî. Li roja nuh ji xewrabûyî temaşe kir. Bi rastî weke dibêjin "çû dunyayeke din." "Ka çêlekên ez li ber?" Rabû ser piyan û kur bi ser xwe ve mijûl bû "Ev çi ye? Kurk! Kê li min kir?" Êdî li xwe kete gumanan "Ez kî me? Hemreş kî ye? Hey mala te bişewite. Tu li ku Hemreş li ku? Hemo gavan bû, li ber gan bû. Nexwe ez çermo me. Hi... na, ez ne çermo me. Lê ez kî me? Kî me? Kî me? Ha! Min dît, ez Hemo me. Hemoyê bazirgan! Wey zexel, tu ji ku ve bûyî bazirgan? Tu Hemo yî. Lê hema hemo jî çû rehmetê, mir... El-Fatîha... Rehma xwedê li wî be, bila canê te sax be... Wey... Wey... çi kurk e! Te ji ku derê anî? Mîrê Mîsrê dîyarî min kir. Pîroz be.." (Bi xwe re weha diaxifî)

Nîvdînî bû. Bi ser xwe ve çû û êdî nedizanî çî dibêje. Du-sê gav avêtin û ji nişkê ve, mîna ku tiştêk were bîra wî, di cih de sekinî. Destên xwe avêtin berîka xwe, pîvazeke ku êdî bêhn dabû tê de dît. Dibir haya xwe ku ew Hemo ye, ji ber ku duh, Zelîxe ev pîvaza xistibû berîka wî. Lê dîsa jî wekî ba-werîya xwe bi pîvazê neke, serê xwe hejand. Cênîga xwe xurand. Sivik kenîya û bi xwe re got "Kê pîvaz xiste berîka min? Na... na, ez guman nakim. Yê ku ev kurk lê be pîvaz di berîka wî de hebe. Nexwe ez ne Hemo me. Ne çermo me

jî. Ji ber ku çermo berî wê bi du salan, bi ber lehiyek ku gund da ber xwe ket û fetîsî. Kesereke kûr kişand. Rehma xwedê lê be. Ey însan! Tu ne tu yî. Xwedê zanê tu kî yî (Ji xwe re got).

Bi rastî êdî ji xwe tirsîya. Li ezmanan meyizand, Rojê nuh çavên xwe vedikirin. Sermayeke tenik û sivik dihat. Çi kes ji wî bêhtir li wê holê tunebû. Li lingê xwe yê rastê temaşe kir. Tiliya girikê xwe di pozê solê re derxistibû. Kenê wî bi tiliya tazî hat. Di dilê xwe de got "Hebe, tunebe ev tiliya Hemreş e. Lê hema tu ji navê û bi jor ve me Hemreş î ne çermo yî. Ne jî serqot î. Ji ber ku serqot hîn ji diya xwe nebûye..."

Bergirî bû, çav tijî hêstir bûn, kurk ji xwe şeland û pîvaza genî di sînga kevirekê de lîxist. Bi dengêkî bilînd qêriya û kevîran bi ser rewşa wî de berdan girî. "Ez He... He... Hemo me! Ev ti... ti... tiliya Hemo ye. Ti... tiliya mi... min e..."

Weha qerîya û şîneke germ û giran gerand.

Bêyî ke bizanibe bi ku ve diçe, mîna kesekî wenda û gêjbûyî berê xwe da aliyekî. Hin caran bi bez û hin caran jî bi meş bi re vê çû.

Du sal derbas bûn, Hemo nehate malê. Lê kelfî bi kelfî, roj bi roj, şev bi şev, ew di bîr û bala Zelîxê de bû. Li ber çavên wê bû. Ji bîr nedibû. Di van du salan de Zelîxe pîr bû. Çav kor bûn. Rûçik qermiçî. Nexweşiyeke giran dev avête jiyana wê. Bi jana nexweşiye, bi derd û kuleke giran çû dilovaniya xwe û mir.

Hemreşê bextereş jî li wê çolê şivanek lê rast tê. Wî dinase, dibe malê. Ser û laşê wî dişon û dibin gundê ku ew ji wê derê ye. Lê mixabin, êdî di serê wî de nemabû mejî. Li hev ketibû. Dema gundiyan ew dîtî, berve beziyan li hawîrdora wî civiyan û bi kezebeke şewitî hêstir bi ser de barandin. Zelîxa xweşinedî dihanîna bîra xwe. Êşa ku kişandî û mirina wê ji ber çavan re derbas dikirin. Rewşa ku niha Hemo tê de dijî, hîn bêhtir cîgera wan dişewitand.

Bi destan girtin, derbasî hundir mala wî kirin. Li ser nivîna ku bi dirêjiya 40 salan ciyê wî bû dirêj kirin û bi ser de lolorîk û şînok gotin. Piştî sê rojan, wî jî xatîrê xwe jiyana mirî xwest û bê vegeer koça xwe bar kir. Bi mirina xwe, Hemo da şanîkirin, ku mirina li ser xaka xwe, ji jiyana fetîsî û mirî şêrîntir e. ■

GORAN

(1903 - 1962)

Mehabad Kurdî

Jiyana Goran'ê nemir

Navê Goran yê rastî Ebdulla Silêman e. Bavê wî, Silêman Beg, kalê wî Ebdulla Beg herdû jî şair û nivisevan bûn û bi zimanê kurdî û farsî nivîsîne. Goran, sala 1904 li bajarê Helepçe ya şehîd, di nav malbatekê de, ku di bineret da mîr û begzade bûne, ji Rojhilata Kurdistanê ne, ji dayika xwe bûye. Di zarokatiya xwe de, li cem bavê xwe Quran xwendiyê. Her weha demekê jî di mizgeftê de li Helepçe xwendiyê.

Di salên cenga cîhanê ya yekemîn de Goran li xwendengeha resmî ji heta pola (sınıf) çaran ders xwendiyê.

Sala 1919, cara mala Goran talan kirine û her di wê salê da bavê Goran miriyê. Sala 1921'ê de çû bajarê Kerkûkê û li medresa Ilmî ya Kerkûkê xwend. Bîrayê wî yê mezin hat kuştin û Goran neçar bû ku dest ji xwendinê ber bide û kar bike bo jiyandin û bi rêve birina malê. Di navbera salên 1925 heta 1937 Goran li Helepçe û Hewramanê mamostayetî dikir. Li sala 1937'ê bi yarmetî Tewfîq Wehbî Goran li yane (klub) regawban dadimezre. Di salên cenga cîhanê ya duwemîn de, di Radyoya Kurdî de, li Yafa (Filistîn) kar dikir. Radyoya Yafa jî, ji bo weşandin, dijî faşîzmê hatibû damezrandin.

Sala 1951'ê ji aliyê desteka kevneperestiya Iraqê hate zindan kirin, hate şikence û azardan. Paşan, di meha mijdarê, sala 1952'yê de hate berdan. Sala 1952'yê, bû sernivîsevanê rojnemeyê Jîn li Silêmanî. Roja 17'yê meha çiriya yekemê, sala 1954'ê carekê di gel komek ji aştîxwazan hate girtin. Yek sal li Silêmanî, Kerkûk, Kût, Bakûbe



Goran li kombûna Newroza sala 1954'ê helbestan dixwîne

û Negreselman zindanî bû. Yek sal jî li bajarê Bedre di bin çavderiya polîs de bû. Roja 12'yê îlonê sala 1956 hate berdan. Dîsan ji bo cara sêyemîn roja 17'yê mijdarê 1956 hate girtin û li Kerkûk û Baqûbe di binê zindana tarîk de ma. Perbabûna şoreşa 14'yê Hezîrana sala 1958'ê, li Iraqê. Roja 10'ê tebaxa sala 1958, ji zindanê azad bû.

Piştî ku ji zindanê derket gel û hikûmetê gelek rêz û hurmeta soran digirtin. Bû endamê delagasyoneke millî ku, çû serdana Yekîtiya Sovyetê, Çîn, Koreya Bakur. Payiza sala 1960'î, Goran bû mamosteyê şîir û edeba kurdî ya zanistgeha Bexdayê.


Di destpêka sala 1959'ê de, Goran bû sernivîsevanê kovara Şefeq û navê wê guhert, kir Beyan. Her weha endamê desteya nivîskarên rojnemeyê Azadî bû. Di destpêka sala 1962'yê de nexoşket û nexoşiya wî ji şêrpencê (Cancer) bû. Li Baxdayê operasyonê ji wî ra kirin lê dereng

bû. Meha nîsana sala 1962'yê çû Moskoyê li nexoşxaneyê Kremlîn û senetoriya Bervichê ma. Piştî sê mehan vegeriya Kurdistanê. Saet 9.30, roja 18'yê mijdarê sala 1962'yê, li bajarê Silêmaniyê giyana xwe bi xaka Kurdistanê şêrîn sipart.

Du kurên wî (Hogir û Ejî) û keçeka wî (Hero) hene. Ejî û Hero hinek çaran şîir û çîrok ji, li Kurdistanê belav kirine.

Hunrawe û şîrekanî mamoste

Her çendî li ser mamoste Goran bête nivîsandin, her kêma e. Çimku ew gupitka [ewç, lotke] bilindahiya helbesta kurdî ye. Gerek e bi dehan vekolîn li ser berhemên wî bêne kirin û encam dan. Ziman û ferhenga şîirên wî, ew mîna rexnegir, wergêr, rojnamevîs, têkoşerê ramiyarî û hwd hatiye meydanê. Di derheqê Goranê mirov û şair de kêmasî hatiye kirin. Belku hinek car xwestine an jî bi qest navê wî bişk-



ênin. Dixwestin rola wî di dîroka edeba kurdî ya ev ro de, Goranê hunermend, bê hewil û serkêşê şîira nû ya kurdî ji Goranê xebatger û kommunist cuda bikin. Bi henceta hindê, ku wî rîyeke siyasî daye ber xwe, lewma tamêk xweş ji şîirên wî nayêt, an hunera wan ne rind e (!) Wan dê bêjin lê bêyî ku bizanibin taybetiyên şîira ramyarî cuda ne yek ya du, têkel kirina bira niştimanî û netewî di gel bîra Marksîzm. Naveroka civakî di şîirên Goran de bilintir, kûr û tagiriya çîna bîndest di berhemên wî de bi hêztir kir.

Dîroka edeba kurdî ji kevin ve navên zor şair û hunerên mezin tîpên bi zêrîn di rûpelên xwe de nivisandine, ku her yek ji wan di dema xwe de îşkên mukum li danana dîroka edeba kurdî de dane û derbirê bîra civakî çendîya hunerê serdema xwe bû. Di sedsala 14-18 de, di nav bi sedan şair, navê çend şîiran di pêşxistina edeba kurdî de her dê dûbarê bibe. Mîna Feqê Teyran, Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanê, Xanê Qubad û hwd.

Goran weke gelek şairên kurd û rojhilata navîn, bi xezel ya evîndarî û dildarî dihête meydana

nivisandina şîir û honrawê ji çarçîwa aruz dernakeve. Wek ew bi xwe jî dibêje: "Şêx Nûrî û Reşîd Necîp, berika wî şîira klasîkî derdikevin." Helbet e Goran gelek agahdarê edeba tirkî, farsî, erebî û îngilîzî bûye. Niha em xezelaka Goran binivîsin û navê wê xezelê *Jin* e:

Jin e ke cilwey husnî
be eşiq eka perwaz

Jin e ke qut exate
xeyalî eqis engiz

Jin e mewlid eşiq û jin
iş e eşiq newaz

Jin e ke tarî rubabî
heyat eka tehrîz

Sîmay wasîleyî dil ger
jin bikey xalî

Teceliyatî bedaiyê
xirûb eka, dîcûr

Be ser simay tehî daguşad
eka balî

Le kewkebî emelit win ebê
tebessumî nûr

Jin e ke gewherî ser tacî
îhtiram e jin e

Be nukî neşterî elmasî
tîjî eşiq û xeram

Xitûtî qutsiyetî hek î
kirawî qelbî min e

Bi sihrî xariqî jîn pir qerîhem e
îlham

Le kuncî xatirama
jinekî şox nexa

Perîsîfat, be pelûpoy
cemalewe cilwe

Le kîwê le sethî zemina
le sîneyî feleka

Ebête menbeî şîirim
bedaiyeyî eşiya

Weke em dizanin berê gelek peyvên erebî, tirkî û farsî di nav şîirên kurdî de hebûne, bê guman şîirên Goran jî li vê tiştê bêder nîn e. Goran di salên 30-40'î de bi temamî dest ji aruz a Erebi û rengê kevin berdidet, bi vê çendê ew şorişekê di nava edebiyata kurdî de berpa diket. Bê guman rêbaza *romansîzm* rolêke mezin di pêşdebirina edeba kurdî de dibîne. Goran di vê meydanê da şahsiwarê mezin bûye, li nav edeba teze ya kurdî. Bo numûne, le honrawey *Eroy*

Oxir de dibêjit:

Kilawtar gurcî kewreftar
nezar nakey eroy oxir

Le tiri ahî natwamin
hezer nakey orî oxir

Be dûta eşkî hesret
xwên ebarênî beser desta

Temaşay lalezarî ra
guzer nakey eroy oxir

Le lay xelkî gedaye
gerdî jêr pêy .mulkî dildarî

Be sayet wek *Huma* tacim
leser nakey eroy oxir

Goran gelek rind lasayî berhemên berî xwe kiriye û peyvên şêrîn ên jorîn kurdî xebitandîye, mîna şîira. Destpêka helwesta Goran û xwe girêdana bi alê gel ve, ji sala 1930'yê ve têt, ku ew bi xwe di şîira *Helo beg* de dinivîse:

Bilê bew bûkî tazey yekşewem
ger hate ser neşîm

Nelê xoy bo weten kuşt û le
rêy eşiqî mina nejîya

Wezîfem bû lê pênavî Wîlatêka
serim bexşîm

Ke toy perwerde kird bo min le dawênî çiya û kejiya

Eger xuway gewre bexşî pêt hatiwê pêy bilê rol e

Le min firmêskî wîst bawkit le toş dawa eka tole

Goran mîna her mirovekî kurd pir hêz li Kurdistan û dîmenên rengînî yên wê kirine, weke bi xwe dibêjît:

Kurdistan cêgamî cêy hezar sal em

Perwerdey em dol û ser lûtke û yal em

Henasem têr bonî bay kiwêstan e

Du lêwim parawî befrawant e

Her weha dibêjêt::

Komele şaxêk sext û gerdin keş Asmanî şînî girtote baweş Serpoşî lûtkey befrî zor sipî Be daristan reş naw dolî kîpî Cêgey awekan tiyaya qetis maw Her eron naken pêçî şax tewaw

Goranê nemir xudan gelek honrawe û şîrî nasik e. Gelek car basî xeyalî nav derûn dikat, lê mixabin ziman û peyv hikarin wê xeyalê nerm û coş û bi soz derbibirin:

Herçend ekem ew xeyaley, pêy mest im Bom naxrête naw çiwarcê wey helbest im Lêkdanewey derûn, qisey ziman im: Bo çî weha dûr in le yek, nazanim!

Şîrekanî Goranî bi îmet her west mîna awêne bûne ji bo nas- kirina zulm û zorên dagîrkeran û nexoşiyên komel:

Fermanê ey komel fermanê fermanê Bo derdî bêkarî çareyek

dermanê Zor şerm e le çerxî bistema insanê Bê îş bê û zikî xoy helûsê bo nanê

Nivîsîna li ser Goran bi witarêk an du witaran temam nabit. Belku dibe mirov bi dehan lêkolîn li ser wî honerê payebilind encam bide. Piştî mirina Goran gelek şair şîna wî kirin. Em li vir şînî Goran ya şairê mezin Hêminî rehmetî pêşkeş xwendavanên REWŞENê bikin:

Her le Botanewey heta Soran Hemû Soranînişîn e bo Goran

Her le Kiwêstanewey heta Germên

Yeman dadirawey ta damên

Le Cizîrewey heta kû Behrî Reş

Niye kije serî nenabê le heş

Le Diyarbekirewey heta Wirmê

Ser be qur, mil bekiwêne nêr û mê


Her le Kerkûkewey heta kû Sine

Şîn û roro û fixanî piyaw û jin e

Hacı, Goran û Pîremêrd mird in "Daxekem kurdî ême her kurd in" Kurd in û tûşî rojî tengan en. Merd in û dilî destî bêgan en.

Hendêk berhemên Goran

- 1 - Geştî Hewraman, 1933
2 - Beheşt û Yadgar, 1950
3 - Firmêsk û Huner, 1950
4 - Tarar och Konst (Firmêsk û huner) Swêdî û Kurdî (wergêrdiraw), Swêd 1986



Nameya Goran ku di sala 1951'ê de ji Gîwî Mukriyanî re şandiye

ÇAVKANIYA VEKOLÎNÊ

1 - Goran, Beheşt û Yadgar - Firmêsk û Huner, çapa 2, Silêmanî 1971
2 - Rojnama Serdemî Niwê, hejmar 22, Swêd II - 1987
3 - Goran, Tarar och Konst (Firmêsk û Huner), Swêd 1988
4 - Feryad Fazil Umer, Edebî Kurdî, Berlîn 1986
5 - Şepol, Jinawerî Zanayanî Kurd le cihanî Îslamêlî ya Gencîney Ferheng û Zanist, Taran 1364 h
6 - Kowara Rêgay Aştî û Sosyalîzm, hejmar 14 / 9 - 1988
7 - Kowara PEYV, hejmar 8, London 7 / 1988
8 - Kowara Rengîn, hejmar 15, Hewlêr 1 / 1989

Şeveka reş bû, peşkên baranê hêdî - hêdî, bi delalî dihatine xwarê. Bae-
ekî sar lédixist. Mirovên li gund tev di
malên xwe de bûn û li ber aqirî xwe germ diki-
rin. Ji vê malê dengê kenî û ji wê malê dengê
qirûwîzê dihat. Jiyaneke welê di gund de ser-
dest bû.

Li pêşiya gund maleka piçûk hebû. Ji
pecerên malê ronehiyeka tenik dîda der. Xor-
tekî bîstûpênçsalî berê xwe dabû wê malê. Bi
rê ve diçû, bi çek û rext bû. Li ber deriyê malê
rawestiya û destê xwe avête derî. Derî ji piştê
ve girtî bû. Di hundirê xênî de pîrekeka pênç-
isafî rûniştî bû. Ji xwe re, hiri dirêsa. Gava ku
dengê derî hate wê, di cihê xwe de hişk bû û ji
nişkê ve got:

- Ki ye?

Dengek ji paş derî hat :

- Ez im ... Ez im yadê, derî veke!

Dayikê bi lez xwe avêt derî û vekir. Got:

- Fêro!..

Xortî, xwe avête hembêza dayika xwe û
derbasî hundir bûn. Dayika wî, ew maç kir, li
bejn û bala kurê xwe nêrî. Hêdîka rordîkên
hêstiran ji çavên wê hatine xwarê. Xortî, care-
ka din dayika xwe maç kir û ji wê pirsî:

- Yadê, ji bo çi tu digiri?

Dayikê li wî veğerand:

- Ez nagirîm dilê min! Hêstir ji kêfan ji çav-
vên min dibarin. Dîna te, rehmîtiyê bavê te ti-
ne bîra min. Ka ji min re bibêje, tu çawa diji?
Hevalên te çawan in? Karê we çawa diçe? Çi-
ma ji zû ve, te rîya xwe bi mal nedixist? De ka
bêja, ka bîaxîfe kurê min? Tu birçî yî? Ez ji te
re çay çebikim?

Dayikê pîrsên ve nolê li pey hev rêz kirin.
Lê kurî, li dayika xwe dinêrî û bi kêf dikenî.

Dayik, dayikeka ji dayikên kurdan bû. Na-
vê wê Xanim bû. Xanimê, di ciwanîya xwe de
keçeka pîr xweşik bû. Berî bîst û pînc salan,
xortekî pismamê wê, wê ji bavê wê westibû.
Navê wî xortî, Mihemed bû. Mihemed û Xa-
nim, tenê salek bi hev re mabûn. Kurekî wan
çebûbû. Navê wî kiribûn Fêro. Lê di wê salê
de Mihemed, li şerê li dijî dijaminên welat, şehîd
ketibû. Xanimê kurê xwe xwedî kir, bi kul û ke-
seran ew mezin kir. Sond xwaribû, ku piştî
kuştina Mihemed. Dîsan mîr (şû) neke. Kurik
mezin bû, bû mîr û niha rahîtiyê tîfinga bavê
xwe û li dijî dijaminên xwe, li dijî ew dijaminên ku
bavê wî ji kuştibûn, şer dike ...

Piştî ku Fêro bersivên dayika xwe da, runişt
xwarinê. Gote dayika xwe:

- Yadê ez gelekî li malê mam, divêt ez he-
rîm.

Dayika wî rabû hinek tiştên xwarinê ji wî re
pêça hev, ji bo ku ew bi xwe re bibe. Paşê
çend şîret li kurê xwe kirin:

- Hay ji xwe û hevalên xwe hebî. Divêt hûn
hişyar bin. Dijmin gelek xedar e.

Fêro dest û eniya dayika xwe maçî kir, xatir
ji wê xwest û ji mal derket. Gava ku giha nê-
zîkî goristana gund, di dilê xwe de got: " Ezê
herim silavekê li bavê xwe kim."

Baran nema dihat û bayê jî nema lédixist. Fê-
ro, derbasî nava tirban bû. Berê xwe da tirba
bavê xwe û li ber serê tirbê rûnişt. Ji xwe re fi-
kirî. Fikrên wî li ser kuştina bavê wî bûn. Li ser
welêt û şehîdbûna ji bo welêt... Ji nişkê ve
weke ku dengê ji goşerê rabe, ew axiftina jêr ji
mejiyê wî derbas bû:

- Ev tu yî berxê min? Ev tu yî Fêro?

Fêro di cihê xwe de bê axiftin ma û tevizî.
Lê dîsan hinde gotin, bi dengê xurtir, weke
ku ji gorê bihên, di serê wî de çîngînî dan:

- Berxê min Fêro! Ez bavê te me, çima tu
ne axivî?

Fêro çeka xwe danî ber xwe. Xweydana

GORISTAN

Mano / 1989

sar ji eniya wî diherikî xwarê. Xweydana eniya
xwe paqij kir. Nema zanibû, çî bike û çî bêje. Ji
ber ku, Fêro xweş dizani miriyên di gorê de
naaxifin. Hema bê hemdî û jî nişkê ve, bi den-
gekî " qut - qutî " dest bi axaftinê kir û ket nava
mij û dûmana xeyalan:

- Yabo tu sax î?

Weke ku dengê bavê wî yê şehîd ji gorê
bêtin, di xeyalên xwe de, Fêro hinde bersiv bi
kêfê pâyda kirin:

"Belê berxê min ez sax im! Laşê min mirî ye,
lê canê min sax e. Canê min ew tîfinga ber te
ye. Gava ku tîfinga te nema bikar bêtin, wê de-
mê xweş zanibe, ku ez bi yekcarê dimirim ..."

Fêro li bavê xwe yê veğerand:

- Yabo bila tu xweş zanibî soza ...

Di vir de bavê wî axiftina wî birî: " Lê bila
hûn xweş zanibin, gava we tîfinga xwe danî erdî
û we xwe ji dijaminê xwe re danî, wê demê canê
min jî, bi tevayî dimire ... Dema niha, ne weke
dema min e. Di dema min de rewşek din hebû.
Hûn roj bi roj ji dijaminan xurtir dibin. Pêş-
mergêyên Kurdistanê roj bi roj pirtir dibin. Şerê ku
hûn dikin, ne weke şerê me ye, ku me dikir..."

Fêro pîrsê ji bavê xwe yê şehîd kir:

- Yabo ma şerê, ku we dikir çawa bû?

Bi awayekê kin û tal, bavê wî li wî veğerand:
- Erê, erê ... Şerê ku me dikir, bê pêşeng û
serî bû, şerekî tevlihev bû ...

Fêro, carek din ji bavê xwe pirsî:

- Yabo tu dikarî piçekî li ser xwe û xebata
xwe, biaxîfî?

Bavê wî careka din bersiva wî da. Dest bi
çiroka xwe û xebata xwe kir:

- Erê kurê min ... Tu dikî, biçûkatîya min
bihênî bîra min. Berî gelek salan bû, hingê ez
çar-pênçsalî bûm. Min bi çavên xwe dit, çawa
peyayên axê, bavê min avêtibûn binê lingên
xwe û lédixistin. Ji ber ku, di wan rojan de, li dijî
axê rabûbû. Ji ber ku, zîlm û sitem nepejirand-
ibû. "Çir - cira " min bû. Lê du sal, sê sal jî wê
bûyêr derbas nebûn, bavê min wî axê kuşt û
berê xwe da çiyê. Li wir gelek xortên weke
bavê min hebûn. Bi hev re, li dijî axan û pey-
ayên wan, li dijî leşkerên dewletê şer dikirin.
Piştî demeka nedûr, bavê min şehîd ket. Ji wê
rojê ve, min soz da xwe, ku ez li ser rêka bavê
xwe şer bikim û ez tola wî hilînim...

Fêro axiftina bavê xwe birî :

- Yabo, ev çiroka kalîkê (bavpîrê) min bû.

Ez dixwazim, tu çiroka xwe ji min re bêjî .

Bavê Fêro dest bi çiroka xwe kir:

- Erê wilo bû... Gava bavê min axê kuşt û
piştî hingê ew jî hat kuştin, kurê axê yê mezin
bû axayê gund. Ji gund berda me. Me berê
xwe da bajêr. Li bajêr, em gelek şevan, bê
xwarin radizan. Li ser wî halê me dayika me,
em şiyandin dibistanê. Di dibistanê de, me ge-
lek kul û dert ditîn. Em kurd bûn, lê me newêrî
bû, em bi kurdî biaxifin, ji ber ku qedexê bû. Me
nedikarî bi zimanê dayika xwe û bavê xwe, em
biaxifin. Sal li dûv salan derbas dibûn. Em jî
mezin dibûn. Min jî dev ji zivistanê berda. Min
dest bi kar kir. Lê min sund jî xwaribû, ku ez
vegerime gundê xwe. Ez bi tenê vegeyiriyam
gund. Min keçmama xwe, ji xwe re anî. Dayika
te... Min xaniyek li pêşiya gund ava kir. Mala

axê nedixwestin, ku ez li gund bimînim. Di wê
demê de şerekî şorşgerî dest pê kiribû. Lew-
ma mala axê nediwêribûn bihêne ser min. Ge-
lek xort rabibûn, li dijî axan û leşkerên tirkan
şer dikirin. Min tola bavê xwe ji leşkerên tirk û
tola mala axê hiland. Şevakê min û hevlekî
xwe, me êriş bire ser mala axê. Heft - heşt
eskerên tirkan, di mala axê de hebûn. Me tev
kuştin û em revîyan. Me berê xwe da çiyê. Lê
ji ber ku em nezan bûn, em zû ketin destên
leşkeran. Ji ber ku, me tişteq dikir, lê paşê
me nedizani emê sibê çî bikin... Lê weke ku tu
niha şer dikî û dengê xwe bilind dikî, ez jî ne-
mirî me. Ji ber ku, tu çêbûyî û te jî li pey min,
te rîya min girt û te tîfinga min hilgirt. Lê ez bi
xwe dizanim, ku niha çî kes nikare zora we
bibe, ji ber ku hûn li duriyan dinêrin, hûn diza-
nin hûnê çî bikin ... Dengê min tête te?

Fêro li bavê xwe veğerand:

- Belê, belê yabo ... dengê te tête min.

Bavê Fêro axiftina xwe domand:

- Ji bo azadîya wî miletî û serxwebûna wî
welatî, ez bi xwe bawer im, ku kurê te jî
wê li ser vê rêça azadîyê û serfirazîyê bi-
çe. Çî gava peqîna fişekêkê tête guhê min,
bawerîya min bi we xurtir dibe. Ez dizanim,
hûnê di demeke nêzik de welatê xwe, welatê
bav û kalan rizgar bikin...

Fêro, bi guhên vekirî guhdariya dengê bavê
xwe dikir. Piştî ku bavê wî axiftina xwe dawî
anî, Fêro li wî veğerand:

- Yabo!. Min sond xwariye, ku tîfinga min li
erdê nemîne. Heya ku ez di vê cihanê de he-
me, ez dev ji şerê li hevberî dijaminan bernadim.
Kengê ez mirim pê ve, wê lawê min rahîje tîfin-
ga min. Hevalên min ên pêşmerge, bi hezaran
car wê tola gelê kurd jî wan xwînxwaran
bistinin. Ez bi xwe jî dibinim, dijamin di vê demê
de, roj bi roj pîstir dibe. Ji ber ku gelek tişt jî
destê dijamin derketine û dijamin nema dikare
leyistokên xwe bibe serî. Çî kes nema dikare
roj sor veşêre!

Bavê Fêro dîsan got :

- Berxê bavê xwe... Ka hebeke guh bide
şîretên min jî. Ez dixwazim çend tiştan bêjim.
Ez baş dizanim, ku tu ji min zanetir î, lê dîsan jî
ez dibêjim, hay ji xwe hebe, hay ji hevalên xwe
hebe û berî hemû tiştan jî hay ji tîfinga min
hebe... Ji ber ku, bi vê tîfingê tu heyî. Heya ji
te tê, bi hogirî li dijî dijaminan şer bike... Bê şer
tu caran tu welatê xwe rizgar nabînî... Eve
hêdî-hêdî roj derdikeve... Divê tu herî cem he-
valên xwe. Hevalên te li hêviya te ne... De
here kurê min... Bavê te dê her sax bimîne...
Silavên şorşvanî li hemû hevalên xwe bike...

Ji nişkê ve Fêro, jî xeyalên xwe hişyar bû.
Tirêjen rojê, ji aliye rohelê ve hin bi hin geş
dibûn. Fêro rahîste tîfinga xwe û nane ku dayi-
ka wî dabûyê. Li ber gora bavê xwe, li silavê
rawestî. Xatira xwe jî gora bavê xwe yê şehîd
stand. Berê xwe da çiyê. Çû cem hevalên
xwe, pêşmergêyên Kurdistanê. Ji ser çiyê li
aliyê goristanê zivirî, ji dûr ve temaşeyê aliye
goristanê kir Tirêjen rojê hawirdor geştir ki-
ribûn. Rojê, tirêjen xwe berda bû ser gund û
çiyayên Kurdistanê ... □

Ferhengoka Nivîsaran

Aheng: şadimanî
Aramgeh: îmtîhan
Aman: eman, hewar
Afirandin: derhanîn
Aştîxoş: silav (ibrî)
Aheste: hêdî
Ajel: sewal, lawir
Awa: şêwe
Anku: yanê

Berdemî: muwaqet
Beş: qism, fer'
Bandûr: desthilatî
Bînretn: binyad
Bîrewerî:
 bibliyografya
Bineclh: niştêcê
Bberûblr: mirovê diz
Bîjî: pîc
Bêna: bêdawî
Bêdad: bêdalet
Binoşin: meyê
 vexwin

Cemîn: zemîn
Can: giyan
Celeb: kwalîte
Çîgir: reserv
Çîguhezî: neqliyat
Cebanî: xiyaneî
Cil: kinc

Çavmest: çavserxoş
Çiv: kûj (açi)
Çûk: teyr
Çêj: tehm
Çêlîkirin: behskirin

Çûr: zerî
Çavdêr: observator

Dêmanî: ê ku tim li
 ciheke
Dîtra rojê: roja dî
Dever: cih
Dudilî: şik
Daring: cism
Dîmen: menzere
Dexso: zikreş
Dilgirtin: evîndarî
Ddijûn: gemar, necis
Dilsotî: dilşewitî
Damezrîn: tesisbûn

Eywez: amade
Endam: aza

Findan: şeme'dan
Felek: dunya

Gêr: vîtes (frensî)
Gîremêr: hût
Gap: hinarik
Guldank: vazoy
Girover: glor
Gewz: kêf
Gulav: parfum
Gone: jêhatî
Gengazî: îmkan

Hevber: hember (farsî)
Helbestvan: şaîr
Hûrkolan: lêgerîn
Hilberin: produktion,
 întac
Hevbendî: yekbûn

Hîmdar: damezrenêr
Hulî: alûc
Hemwelatî: miwatin
Hoy: sedem
Hevîn: evîn
Hewr: ewr
Henî: enî
Hîkarî: tesîr
Koçik: xaniyê sê
 tebaye
kadiz: navê stêrek e
Kesname: huviyet
Kawî: negihiştî
Kuhêstan: şûnewarê
 çiyayî
Leheng: qehreman
Lêker: verb, fiil
Lêkolan: vekolan
Lidarxistin: amadekirin

Lewerîn: çêre

Melevanî: ajnê
Mûçe: meaş
Mêjû: tarîx
Malxwê: xwedîmal

Nivistin: razan, raketin
Noqbûn: çikîn
Noqav: xewwase
Nivêj: selat
Niza: dua
Namzed: kandidate
Navber: mabeyn
Nivîsende: nivîsevan
Ne şîya: ne karî
Navko: xaniyê yekt
 tebaqe

Naverok: muhtewa

Pirmezin: ezîm
Pûte: ihtîmam
Piling: tiger, kaplan
Pênûs: qelem
 (yûnanî)

Poşe: cengene
Pan: behr
Pixale: qedeh
Pile: kert, derece
Pey: dû
Pîvan: endaze
Peşmurde: perîşan
Rawestin: sekn
Reşeba: bayê reş
Rewş: weziyet
Rêl: daristana biçûk
Raz: dizî
Rawîşt: cir, exlaq
Rastdil: kesê durust
Rakişandin: rakirin

Sînî: tepsika fireh û
 mezin
Sêlav: firtone
Serbaz: esker
Sînor: tixûb
Sext: dijwar, zehmet
Serinc: bal
Şanazî: îftîxar

Telar: salon
Tomarkirin: tijîkirin

Zewnc: nêçîr, seyd
Zerenc: kew

BANG

Rewşenbîrên Kurdistanê yên welatparêz! Kurdên niştimanperwer û rûmetdar!

Di dîroka mirovahiya hevdemî de, ev e yekemîn car e, ku mirovên bêyî guneh û bêyî sûc, rastî koçkirineke gelemper û komqirkirineke wilo dirinde û hov hatine. Ev hovîti û dirindetiya ku li ser girsên gelê me yê li Başûr, bi destê rejîma Seddamê faşîst hatî kirin, weke diyar e, bêyî menend û nimûne ye. Mirovahî, vê bêbextiyê çî caran nikare bipejirîne. Ji dergûşên şîrmij heya kalên heftêsalî, berê xwe dane ew sînorên ku dagîrkeran li ser xaka me danîne. Leşkerên dijminan li ser sînoran li pêşiya wan rawestane û nahêlin karwanê koçerên me li ser axa xwe serbest bilive, derbasî beşê din ji xaka Kurdistanê xwe bibe. Ji dergûşên ber şîr heya pîrên heftêsalî, ji ber mirinê direvin! Lê belê kêlî bi kêlî di nav jiyaneke mirî de hiştî û dîl mane. Ji ber nexweşiyê, ji ber nebûna nan û avê, rojê bi hejmarên bilind diçine gorê. Goristanên girseyî ji wan re tene kolandin. Sed heyf û hewar e, sed heyf û mixabin e ku kes nîn e ku xwedî li wan derkeve û wan ji wê rewşê rizgarke.

Dîsan ji xêynî me kes dengê me nabihîse û xwedî li me dernakeve. Ev bi sedan car dubare bûye. Gotina "kurd dostê xwe bi xwe ye" di rojên wilo de baş tete bîra mirovî. Hemû dagîrker û hevxebatkarên wan, çavên xwe yên kirêt û necis berdane hêjayiyên Kurdistanê rengîn û heya em ew bi biryardarî ji ser vê xakê neqewirînin, ew ji me nagerin. Ewê hezar pîlan û projeyan derxînin ku em pê bihêne xapandin. Hejmara netewa me bi ser sih milyonan ketiye, hîna jî me mîna penaberan dijimêrin û li ser xaka me, ji me re dibêjin penaber. Lê belê bila her kes bizanibe ku em çî car penaberiyê li xwe napejirînin. Eger mirineke me hebe jî, dê ji bo serxwebûn û azadiya Kurdistanê be. Heya ku em hene, emê xwedî li gelê xwe derkevin. Li kîjan koşeyî dibe, bila bibe, emê başûr jî, bakur jî, rohilat jî biparêzin. Em hebûna xwe di dest ti kesî de nahêlin. Emê wê bi xwîna xwe biparêzin. Ne împeryalîzm û ne jî ew çar dolîwgeriyên hov û negbet dê bikaribin bi çarenivîsa gelê me bileyîzin. Emê bi her hîm û hêza xwe, hebûna xwe derînin holê. Biryardariya bergirî û berxwedanê peyama û mizgîniya serkeftin û rizgariyê ye.

Di vê rewşa teng de, girî û gazinc ne çare ne. Divêt heya ku ji dest me were, em bi her derfet û îmkânên xwe, dakevine meydana alîkarî û piştgirtina gelê me yê Başûr. Di vê domanê de ku yekîti û hevbendiya gel, xwedî divêti û giringiyê herî girîng e. Rewşenbîrên Kurdistanê yên welatparêz dikarin ji her kesî bêhtir rola xwe ya dîrokî bileyîzin. Zane û zaniyarên civata kurdan hûn çî rawestî ne? Bes e. Her rojekê gelê me tete qirkirin û mişext û perîşankirin.

Ey mirovên kurd ên bi rûmet, heger hûn bixwazin bibin xwedîwelat û weke her milletekî din, bi şerefa xwe bijîn, tenê û tenê serî hildin! Serî ji bo rizgarî, serxwebûn û azadiya welat hildin. Bi her derfetên di dest xwe de têtikoşin. Rizgariya me hemûyan di têtikoşin û berxwedanê de ye. Tenê welê em dikarin xwe ji vê rewşa şermezariya salan rizgar bikin. Bila em xwe bi xwe birînen xwe derman bikin û li ber çî kesî negerin. Welatparêzî di rojên wilo de diyar dibe, ne di rojên fireh û bêdeng de. Welatparêzî ji me tevan valanehiştina qada rûmetê dixwaze. Divê em meydane vala nehêlin!

Rewşenbîrên Kurdistanê yên niştimanperwer!

Dem dema berxwedan û xebatê ye. Dem dema xwedî lêderketina azadiya gel û serxwebûna Kurdistanê ye. Xwe pepûk, belengaz û perîşan nişandan ne çare ye.

- Bijî yekbûna Kurdistanê!
- Bijî serxwebûn û azadiya Kurdistanê!
- Bimre Seddamê xwînrij û faşîst!
- Yan Kurdistanê azad an neman!

Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê-YRWK
KOMÎTEYA NAVENDÎ
20 Nisan 1991



Nivîskarê Kurd Sadîq Behaddîn Amîdî (... 1982)
Li Bexdayê çûyê ser dilovaniya xwe û li Amêdiyê hatiye veşartin

YRWK
Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan
Maxstr. 50
5300 Bonn 1